



Îman,  
Emel û  
Qurban



Şopa  
Pak û  
Pîroz

# peyam

Li pey roniya wehyê...

Kovara çandî hunerî û ramanî ya mehane

Jimar **2**

Cotmeh 2012

Buha 5 ₺

## Sehabiyên Diyarbakirê



Îmana Tehqîqî  
û ya Teqlîdî






Hedîsê Mewzûyî  
û Sebebê Ci



Çend Meseleyên  
Fîqhî

# Ji bo lixwevegereke esasî çar eser:

## Weşanên Özedönüş



**Özedönüş Yayınevi**

İslambey mah. Hoca Ahmet Yesevi cad. No: 2/a

Arnavutköy/İstanbul


Tel: 0212 597 21 64 | ozedonusyayinlari@hotmail.com

## JIMAR 2

## NAVEROK

Sehabeyên li Diyarbekirê <b>Ehmed Rênas</b> .....	3
Îmana tehqîqî û ya teqlîdî <b>Yakup Aslan</b> .....	6
Çend meseleyên fiqhî <b>Haşim Özdaş</b> .....	11
Ey dil were weqtê mecal <b>Melayê Cizîrî</b> .....	14
Mifteya Cennetê: Kelîma Tewhîdê <b>Murad Celalî</b> .....	15
Dubeytî <b>Baba Tahirê Uryan</b> .....	20
Hedîs—Hedîsê Mewzûyî û sebebê ci <b>Ehmed Kırkan</b> .....	21
Raman û Bingehe Sekularîzmê -II- <b>Dr. Ebdulkerîmê Surûş</b> <b>Werger: Dr. Lezgîne Çalî</b> <b>Tîpguhêzî: Umîd Demîrhan</b> .....	24
Çend gotinên Seîdê Kurdî <b>Xêz û werger: Sevim Uluç</b> .....	28
Tiştên qenc û tiştên xerab <b>Îbnul Hecerê Esqelanî</b> <b>Ji Erebî: M. Emînê Botikî</b> .....	28
Hilo Rabe Ebulqasim <b>Melayê Bateyî</b> .....	31
Îman, emel û qurban <b>Mihemed Jiyan</b> .....	32
Yara kê yî tu <b>Macin</b> .....	36

Umdetul Ehkam—II <b>Îmamê Meqdisî</b> <b>Werger û şîrovevên pêwîst: Umîd Demîrhan</b> .....	37
Zilm-Zalim <b>Amedekar: Fîkrî Amedî</b> .....	40
Şopa pak û pîroz <b>Osman Îzol</b> .....	46
Peyva bîst û şeşemîn: Rîsaleya qederê-I- <b>Remzî Pêşeng</b> <b>Werger: Kenanê Nado</b> .....	48
Haqîqeta şerm û heyayê <b>M. Reşîdê Hiritî</b> .....	50
Dayê rebenê <b>Bîlal Zîlan</b> .....	51
Bangewaziyên di Quranê de: "Hey evdên min!" <b>Werger: Mela Suleyman Kurşun</b> .....	52
Dîn û exlaq <b>Tahir Sîdar</b> .....	54
Bavê li dû qîzên xwe <b>M. Xalid Sadînî</b> .....	56
Ji folklorê Kurdî gurg û hêstir.....	59
Çend letîfeyên letîf <b>Haşim Özdaş</b> .....	60
Fiêleke baş bedelê şêstûşêş fendên belaş e <b>M. Xalid Sadînî</b> .....	61
Ewan bi navê Xwedê <b>Seîd Miksî</b> .....	64



KOVARA ÇANDÎ HUNERÎ  
Û RAMANÎ YA MEHANE

**Weşanên Diwan, Xwedî (Sahibi)**  
Muhammet Kurşun  
**Berpîrsê Nivîsaran (Yazışleri Müdürü)**  
İsmet Aydemir  
**Editor**  
Mihemed Jiyan  
**Rûpelsazî**  
Şemal Medya  
semalmedya@gmail.com  
**Navnîşan**  
Zeyrek Mah. İtfaiye Cad. No: 17/3  
Fatih İSTANBUL  
Tel: 0212 534 48 30  
Gsm: 0532 205 68 40  
E-mail: kovarapeyam@gmail.com

**Hesabê Bankeyê**  
Muhammet Kurşun  
Türkiye İş Bankası Fatih Şubesi:  
Hesap no: 1020-1732847  
İban: Tr4543140242426120  
Posta Çeki: 05884091  
Yerel Süreli Yayın  
**Çap/Baskı**  
Berdan Matbaası/Sadık Daşdoğan  
Davutpaşa Cd. Güven San. Sit. C  
Blok No: 239 Topkapı/İSTANBUL  
Tel: 0212 613 12 11

Her nivîskar ji naveroka nivîsa xwe  
mesûl e. Nivîsên ji kovarê re hatine,  
bi şûn de nayên veşerandin.

# Ji Edîtor

## BI NAVÊ XWEDAYÊ MIHRÎBAN Û DILOVAN

### Xwendevanên hêja,

Bi hêviya ku saxî û selametî her demê bi we re li kar be û bereket û înayeta Xwedê ji we kêm nebe, em bi jimara xwe ya nû ya duyem dibêjin merheba.

Ev meşa me ber bi razîbûna û rehmeta Xwedê teala ve ye. Va ye em di vê meşa xwe ya bixêr de gihîştin qonaxa duyem.

Jiyana dinyayê û barê temînkirina meîşeta wê, însanan têra xwe diwestîne û piraniya wextê wan digire. Însan ji sibehê heta êvarî, belkî carinan ji êvarî heta sibehê dixebite û xwîdanê dirijîne ku debara xwe ya li vê dinyayê pêk bîne û muhtacî kesî nebe.

Sîstema kedxwer a li ser keda însanan û xwîdana wan hatiye avakirin, insan mecbûr hiştine ku tenê bi rizqê xwe re mijûl bibin û hay ji meseleyên din ên dinyewî û uxrewî nemînin. Lewra dema ku insan heqê keda xwe bistîne û rizqê xwe bi xebateke adetî temîn bike, dê sîstema wan a li ser kedxweriyê ava bûye, hilweşe.

Xwedê teala emir li însanan kiriye ku ji bo rizqê xwe bixebitin û di gel wê jî wezîfeya xwe ya evdîtiyê jibîr nekin. Xwedê ji evdên xwe nexwestiye ku 24 seetan îbadeta wî bikin û ji bo axretê bixebitin. Xwedê tenê 5 wext nimêj wekî îbadet li ser însanan ferz kiriye û dengeyeke wisa çêkiriye ku insan bi tu awayî di evdîtiya wî de zorî û zehmetiyê nekişîne. Mesela di sûreyê Cûmê de Xwedê dibêje: "Dema wextê nimêjê hat bi lezê herin mizgeftê û piştî wê jî ji bo temîna rizqê xwe li ser erdê belav bibin û ji kerema Xwedê bixwazin." (Cûmê 9-10)

Xwedê negotiye wekî miskînan li cihê xwe rûnên, îbadetê bikin û bila Xwedê rizqê we bişîne. Lê gotiye, bixebitin, xîret bikin û piştê ji kerema wî bixwazin...

Wekî me got, meşa me bixêr û ji bo razîbûn û rehmeta Xwedê ye.

Di jimara me ya din de gelek nivîsên hêja û têrtîjî li ser van meseleyan hebûn. Ew nivîsên ku ji hêla alim, seyda û zanayên me ve hatibûn nivîsandin bala me hinekî din kişandibûn ser ehemmiyeta ehemmiyeta Quranê û sunneta Resûlê Ekrem. Herwiha nivîsên di gel warên din de jî, her yekê bala me dikişande ser mijareke muhîm a girêdayî dinya û axreta me.

Di vê jimarê de jî nivîsên ji hev baştir û hêjatir ên ku rêya me ronîtir û hişê me firehtir bikin cih digirin.

Em hêvidar in ku hûn ji van nivîsan fêdedar bibin û me jî di nav duayên xwe de bibîr binin.

Em hêviya jiyaneke dilşad û bextewer eyda we ya Qurbanê/Heciyan jî pîroz dikin. Xwedê eyd û erefatên we mubarek bike û hecên we qebûl bike.

Heta jimareke din, bibin emanetê Rehman

Edîtoriya Peyamê



# Sehabeyên li Diyarbekirê

EHMED RÊNAS

Ji Îmamê Elî hatiye rîwayetkirin. Pêxember gote ku; Hurmet û rêzê ji eshab û xizmên min re bigirin da ku hurmeta we ya ku hûn ji min re digirin bê mihafezekirin. Kesên ku bi vî awayî hurmetê ji min re bigirin, Xwedê jî dê wan di dinya û axretê de muhazeze bike. (11)

Pêxemberê Xwedê û sehabiyên xwe dînekî wisa anîne ku li ser rûyê dinê û li cihên ku Ereb lê dijiyan yekîtiyê pêk anîne û xerabiyên ku di nav wan de hukim dikirin ji holê rakirine. Ew dînekî wisa bû ku têkiliyên Xwedê û însên û însên û civakê ji nû ve ava kirine. Bi vî rengî jî mirov ji her cure xerabî, îfsad, fitne û fucûrê û baweriyên bêbingeh parastine. Civakeke di her warî de pêşketî çêkirine. Dîne Îslamê dînekî wisa ye ku ji Adem (e) bigire heya Pêxember eleyhisselam yanê pêxember hemî ji bo vî dîne yekta hatine û yekîtiya Xwedê teblîx kirine. Heta Pêxember û sehabiyên wî li tevekî dinê belav bûne. Ji bo wê ye ku îro bi qasî 10.000 gorên

eshabê kîram li Mekkeyê û Medîneyê hene. Gorên din jî ji Çînê bigire heya Spanyayê di cihanê de li cihên cuda cuda belav bûne. Armanc û daxwaza sehabiyên ew bû ku di rêya xwedê de xizmeta teblîxa dîne wî dikirin.

Fermandarê Bizansê Heraqliyûs ku di şerê Ecnadeynê de fermandarî kiribû di şewrekê de ji xizmên xwe yên di mahiyeta Misilmanan de dipirse. Xizmên wî jî jê re gotine ku: "Wî qewmê hanê qewmekî wisa ye ku ji spêdeyê heta êvarê rojî digirin û ji bişev heta şeveqê jî limêj dikin. Wan kesan ew qasî ji mirin û axretê hez dikirin ku ji hezkirina we ya dinyayê zêdetir bû." Li hemberî vê bersivê Heraqliyûs bi vî awayî bersiv dide: "Heke ew qewma hanê qewmekî wisa be, nêzik e ku axa ku vêga di bin piyê min de ye ji bi dest bixin. Paşê çend sal û şûnve artêşa Îslamê dikeve Sûriyê û Sûriyê distîne. Heraqliyûs jî bi xatirxwestinê ji Sûriyê yanê xaka xwe ya berê derdiqewte."

## **Rewşa Amedê berî Îslamê**

Berî Misilmanan du birayan li Amedê hukim dikir. Birayê ku navê wî Pitris bû li nav sûran rûdinişt û yê din jî li qaleya hundirîn rûdinişt.

Di sînoren ku ewê hukim li deveran bikin di nava xwe de qerar girtibûn û li gorî wê hereket dikirin. Keçikeye Pitrisê ku bi navê Sûfara û keçikeye yê Yûhana bi navê Bûxara hebû. Her du jî di aliyê xwe de bi kar û barên xwe ve mijûl bûn.

Rojekî Yûhanayê ku li qaleya hundirîn dijîya qerarek girt û bi hukimdara Darayê Meryemê re ku girêdayî Sûriyê bû zewicî. Meryem pir jîr û bîaqil bû. Wextê ku hate Amedê û dîmenên ku der û dorên Amedê xemilandibûn dîtin, heyrani vî bajarê pîroz û qedîm bû.

Çendekî şunde Pitris keça Yûhana bo kurê xwe xwest, lê Yûhana li hemberî vê yekê keça Pitris wekî berdêlî bo kurê xwe xwest û bi vî awayî berê xwe dan hev. Çendekî şunde jî deriyên ku danûstendinên xwe dikirin ji hev re girtin.

Piştî zewaca Meryemê û Yûhana, bavê Meryemê ji bo serdana keça xwe û zavayê xwe hate Amedê. Hal û rewşa Amedê pir bala wî kişand. Ji ber vê yekê jî dil kire ku Amedê bi dest bixe. Hin tektîk dan keça xwe da ku hakimiyeta Amedê bixe destê xwe. Piştî çûyîna bavê xwe Meryem kete navbera birayan û ji bo ku nava wan çêbike rolekî weke navbeynkariyê lîst. Gava ku nava wan çêdikir, hin fermanên artêşê jî bûne alîgirên wê û bi vî awayî ji bo aşîtiya her dû birayan şîvek da. Di şîvê de xwarinên cure cure raxist ber mêvanan û mêvan pir pê xweş bûn. Piştî xwarinê meya ku tê de jehr hebû pêşkeşî mêvanan kir û bi vî awayî ew tev kuştin. Ji her du aliyan de jî tu kes nemaye ku hukim li bajêr bike. Loma Meryemê bi xwe hukimdariya xwe îlan kir. Xelkê bajêr û rêvebiriya wî di destê xwe de di destê xwe de girt.

Meryema Dara dora 12 sal hikim li bajêr kir û ji ber ku bi nermî û xweşî ve nêzikî xelkê dibû xelk pê xweş bû. Dêra Meryem Ana ya ku îro nêzikî Deriyê Rihayê ye bi xwe da çêkirin û bo perwerdehiya dîni jî ji aliyê Bîzansîyan keşe û metropolitan anîn.

*“meriv dikare bibêje ku li Amedê 541 gorên sehabe û tabiînan û 6 gorên pêxemberan û meqamên 3 pêxemberan hene. Amed piştî Mekke û Medînê di cîhanê de pirtirîn gorên sehabeyan dihewîne û li gorî baweriya Misilmanan Harema Şerîf a Pêncemîn e*

## **Hatina Misilmanan ber bi Diyarbekirê ve**

Hz. Umer di xelîfetiya xwe de ji bo fethên nû berê Şîrah Bin Îbnî Hesene daye Urdinê û yê Îyaz bîn Xenem jî daye Mezopotamyayê. Artêşa Îslamê heta ku hatiya ber derê Amedê çend kelehên mezin fetih kirine û di sala 638an de gihîştine ber dergehê Xerpêtê. Li dora bajarê Amedê bi sûrên ku dirêjahiya wan digihîşt 5km hebûn û îdareya bajêr di destê melikeya Meryema Darayê de bû. Artêşa Îslamê qasid hinartin û şert û mercên xwe bi wî awayî ji îdareya bajêr re gotin ku yan hûnê Misilman bibin yan cîzyeyê bidin û yan jî emê şer bikin. Lê îdareya bajêr xwe li van şert û mercan negirt. Ji ber vê çendê artêşa Îslamê konên xwe yên baregehan li derveyî bajêr vedan.

Bajêr ji çar aliyan ve hate dorpêçkirin. Îyaz bîn Xenem li deriyê Mêrdînê, Seîd bîn Zeyd li Deriyê Rihayê û Muaz bîn Cebel Deriyê Xarpêtê û Silêman bî Xalid jî deriyê Dîjleyê girtin.

Bajêr bi qasî 5 mehan hate dorpêçkirin. Ji bona ku sûrên Amedê pir zexim bûn artêşa Îslamê nedişiya bikeve bajêr. Lê dîsa bi saya bîr û baweri yên xwe fedaiyên Îslamê dev ji stendina Amedê bernedan.

Ji Seîd bîn Hezim hatiye rîwayetkirin ku herçiqas erzaqên artêşa Îslamê kêmbûne jî leşkeran xwarinên xwe kêmbûn û di girtina bajêr de biserketin. Heta li gor rîwayetan hinekan ji bo ku erzaq têrî wan bike rojî digirt.

Bi vî halî û ruhî dikevin bajêr û dergehên bajêr ji artêşa Îslamê re vedikin. Piştî Misilman dikevin bajêr û bajêr ji destê wan distinin, dixin bin hukmê xwe.

Di serî de leşkerên ku ketibûn bajêr bi notirvanên bajêr re ketine pevçûneke dijwar. Piştî vê pevçûnê digel Hz. Silêman dora 40 mirî û bi sedan zêdetir birîndarên Misilmanan çêdibin. Îro 27 heb ji wan li kêleka mizgefta ku îro bi navê Hz. Sileman hatiye binavkirin hatine veşartin. Yên mayîn jî di nava bajêr li cihên curbicur hatine veşartin.

- Leqebê Ebûl Mucîn Xencera Bedew e. Ji ber ku xweyê xençereke xweşik bû ev leqebê hanê lê kirine. Gora wî li taxa Lalebey e.

- Li gor hin agahiyan Malikê Ejder sehabe ye. Li gor riwayetekê laşê wî li gorî riwayetekê jî pêçîkekî wî li Amedê hatiye veşartin.

- Sultan Se'sa waliyê sehabe yê yekem li Amedê ye. Gora wî li kêleka Mizgefta Mezin (Ûlû Camî) e.

- Mirisyab ji sehabeyan e. Di wextê şer de ji artêşa Îslamê re bi meteran av belav kiriye. Ji bo wê ye ku jê re Şêx Meter hatiye gotin. Tirba wî hatiye hilweşandin û gora wî di navbera Minareya Çar Pi û mizgeftê de ye.

- Sed Bîn Weqqes ji sehabeyan e. Tirba wî li teniştê Dergehê Xerpêtê ye. Tê zanîn ku Se'd bîn Ebû Weqqes ê tirkariya Hz pêxember kiriye ye. Lê der barê vê yekê de agahiyên binecihtunin.

Gava ku artêşa Misilmanan dikeve bajêr di serî de Dêra Saint Thomayê (Ûlû Camiya îroyîn) dike mizgeft û çekên ku di destê leşkeran û xelqê de ne bi tevekî dicivîne. Fermandarê artêşê ji xelqê re dibêje ku: "Bila her kes bi kar û barê xwe ve mijûl bibe. Hûnê di bin banê Îslamê de ewle bibin. Can û malên we emanetî me ne û bi vî awayî hûnê miameleyê bibînin."

Se'satul Evdî ji hêla Îyaz bîn Xenem ve wekî walî tê tayînkirin. Bi vî awayî hukmê bajêr di dest xwe de digire. Limêja îne ya ewilîn li Mizgefta Hz. Umer ya ku îro li kêleka Deriyê Mêrdînê ye pêk tînin. Îyaz bîn Xenem di bin emrê walî de 500 leşkeran dihêle û berê xwe dide welatên din.

Di zemanê xelîfeyên Îslamê de hin waliyên ku ji sehabeyan kîram pêk tên ji teref xalîfeyê Misilmanan ji bo walîtiyê tên tayînkirin. Wekî Se'satul Evdî, Îyaz bîn Xenem, Seid bîn Hezm, Amir bîn

Sadûllahî Ensarî, Emer bîn Sureqa, Zeyd bîn Henzele Welîdiye û hwd. Van sehabeyan gewre ji piştî mirina xwe li Amedê hatine veşartin.

Li gorî agahiyekê Meryema Dara ya ku melîkeya bajêr bû, hemû ziyetên xwe didin ser hev û di rêyeke bin erdê ku di Qaleya Hundirîn de ye berê xwe dide welatê Rûman. Li gorî agahiyekê din jî li ser rêya Erxaniyê ya ku navçeyeka Amedê ya îroyîn e hatiye qefaltin û ew şandine rex Hz. Umerê xelîfeyê Misilmanan. Meryema Dara heya heyama Îmamê Elî jiyaye. Lê di zemanê Îmamê Elî û Miawiye de ji ber fitnekariya xwe hatiye kuştin.

Îro 27 gorên sehabeyan di nava Mizgefta Hz. Silêman de hene ku ew mizgeft di navbera salên 1155-1169 de ji alî Ebûl Qasim hatiye çêkirin. Gorên sehabeyan ên wekî Hz. Silêman, Ridwan, Mesûd, Beşîr, Hemza, Emr, Sabe, Sabît, Zeyd (2), Nûman, Mihemed (2), Xalid (2), Evdila (3), Hesen (2), Ke'b Zîşan, Fûdayî, Malik, Fexr, Ebûl Hemd û Mûxîre li kêleka mizgeftê ne.

**Wekî encam meriv dikare bibêje ku li Amedê 541 gorên sehabe û tabîinan û 6 gorên pêxemberan û meqamên 3 pêxemberan hene. Amed piştî Mekte û Medîne di cihanê de pirtirîn gorên sehabeyan dihewîne û li gorî baweriya Misilmanan Harema Şerîf a Pêncemîn e. Me'neya vê ew e ku bajarekî pîroz e û giraniya wî di nav xelqê de heye.**

Xelqê Amedê û xelqên hawirdor di roja pêncsemê de berê xwe didin tîrbeyên sehabeyan û bi wî awayî xwestek û hêviyên xwe didin ber xatirê sehabeyan. Bi lavan û dua destê xwe li ber Xwedayê dilovan vedikin û kerba dilê xwe bi vî awayî sar dikin. Hêviyên xwe erzî Xwedayê xwe dikin da ku tu minnetê ji kesî re nekin. Heqîqeta xelkê di nav lava û duayên wan de veşartîye. Bi saya serdana eshabên Pêxember xelk moralîze û motive dibe. Bibîranîna sehabeyan Resûlê Ekrem, rîsalet û mucedela wî ya pîroz tîne bîra xelkê Misilman ê Kurd.

#### ÇAVKANÎ

Heyatus Sehabe  
Kutûbus Sitte  
Tarîxul Xulefa

# Îmana tehqîqî û ya teqlîdî

YAKUP ASLAN





**X**wedê di jîyanê de hemî rêkên rast û ronahî nîşanî mirovan daye. Ji van kêlikên rêk û waran, heqê terciha jîyana birûmet yan zelîl bo wan hêlaye. Mirov bi hizr, îrade, bawerî û bi vê rêberiyê jîyana xwo rengîn diket. Ger em bi Qurana pîroz nêrineke baş biken, dê serhatîya pêxemberan tecrûbeyên girîng bidene me. Serhatîya pêxemberên wekî Îbrahîm (e) û Mûsa (e) tijî pend û nesîhet in. Quran gelek caran behsa wan bo me diket û ji jîyana wan bo me hinde deman vediket. Di serhatîya wan de gava mirov baş bifikirî, meriv dibîne ku fikr û ramanên wan her demê jîyanê dikişînin hesabê. Bawerîya wan li ser xîmê pirsîyaran e. Ev rengê muşterek ê her du pêxemberan e. Bawerîya wan, her demê ji bêjînga hizr û eqlê ve derbaz dibe: *“Û tu, wê gava ku Îbrahîm ji Xwedayê xwe lava kirîye, di bîra xwe bine. Îbrahîm gotibû: Xwedêye min! Tu bi min bide xuyakirinê ka tu çawan mirîyan vedijîni? Xwedê ji Îbrahîm re gotibû: Ma qey tu bawer nakî? Îbrahîm ji Xwedê re got: Çima, ez bawer dikim lê ji bo dilê min bi temami tetmîn bibe. Xwedê ji Îbrahîm re got: Tu ji çûçikan çar liban bigire, paşê wan çûçikan li bal xwe parî parî bike, paşê wan çûçikan, her yekê dayne serê çiyayekî û paşê tu gazî wan bike; ew çûçik dê bi lez werine bal te. Û tu bizane ku bi rastî Xwedê li ser hemû tiştan ezîz û*

*hekîm e.”* Di ayetan da em vê rewşê zehf dibînin. Ev rewşa diyar ya baweriyê Îbrahîm pêxember e. Berpirsiyarkirina pût û senemên ku li Kabê bûn, bi vî awayî bû. Paşê şikandina pûtan... Gava baltê xwe bi stûyê senemekê hilawîst û got: **“Vî pûtî senemên we şikandin...”** dixwest ku ew bikevîne lêpirsîna hizr û fikrên xwe. Li hêviyê bû ku ew bifikirin û bizanin ku pût û senem nikarin tiştêkî bikin. Pirsîn, vekolîn, li ser hizirkirin wesfê wan her du pêxemberan e. Pûtşikên Îbrahîm pêxember, pût û senemên wan dişkand û bivirê xwe bi stûyê pûtekî dihilawêse û dixwaze ku mirov di vê meselê de bifikirin. Bizanin ku xwedayên wan ên ku îbadeta wan dikirin bê qudret û bê ruh in. Di muqabilê wan de Xwedayê ku Îbrahîm bawerî pê îbabû, bi qudret û hêz e. Rê û rêbaza nîşandan û pêhesandina Xwedayê bi hêz û qudret bi vî rengî hatîye sazîkirin. Îbrahîm vê rêça bibandor û muhîm nîşanî me didet. Ewî baş dizanî, yê ew hal dîtî, bawerîya wan nedihat ku pûtekî bê ruh û hêz pûtên din şikandibin. Başê, yê neşêt mudafa canê xwe biket, dê çawan parastina hindêkî di biket? Dixwast vê belengazî, bêrûmetî û bêqedrîya pût û seneman bide fêmkirin. Putperestan pirs kir: *“Ma qudreta pûtan heye ku yên di bişkênin? Berên bê ruh û can, ne xêra wan heye ne ji zerara wan...”* Îbrahîm digot: *“Gelo heke ne xêra wa û ne*

*Bawerî û emilandina serkanîya bawerîya Mûsa gencekî jîyanê dîyarî me diket. Mûsa pêxember jî li pêşiya zaliman, zordaran disekinit. Bêtirs, bêxof neheqîya wan û sêhredarîya wan faşil diket û milletê xwe pê dihesînit ku ew jiyana bêrûmet qedera wan nîne.*

*ji şerrê wa hebe hingê bi kêrî çi karî têtin?”* Oldariya bêbingeh, *bêxîm pûç dikir û ew gazî Xwedê dikirin. Îbrahîm bi babê xwe Azer wiha digot: “Hûn hinde pût û seneman bo xwe Reb dihesibînin? Bi rastî ez te û qewmê te li ser delaletê dibînim.”*

Bawerî û emilandina serkanîya bawerîya Mûsa gencekî jîyanê dîyarî me diket. Mûsa pêxember jî li pêşiya zaliman, zordaran disekinit. Bêtirs, bêxof neheqîya wan û sêhredarîya wan faşil diket û milletê xwe pê dihesînit ku ew jiyana bêrûmet qedera wan nîne. Li hemberê Firewn û Firewniyê rasterast bawerîya xwe dibêjit. Ew xîmê bawerî û rastfikirîna durist tînite holê. Her du pêxember mîna nebiyên di, di dewrana xwe de li ser bawerîya bab û bapîran, li ser dîndariyeke bêbingeh bawerîya xwe pêk

naînin. Di nav xeletî, bêbingehî û sêhredarîya pûç de naherikin. Gava bi bawerîya xelet dihesin, li hemberî wê bawerîyê û xeletîye bêtirs disekin. Aşîkar e ku temamê serhatî û çîrokên ku di Quranê de hatine gotin, peyamên gerdûnî û cihanî ne. Di her dem û wextan da mirov bi van şîretan dikarit rêka xwe bi sanahî bibînît û xwe ji astengîyan xelas biket.

**Di sitavka peyama îlahî de baş xuya ye ku pêxemberên mîna Îbrahîm wexta bawerîya xwe binecih diken, eqlê xwe bi kar tînin û bawerîyên kevin berpirsiyar diken.** Hizr û kûrfikirîn, ronahîya rêça wan e. Ji ber vê çendê, em baş dizanin ger em di bawerîya xwe hizr û eqlê xwe betal biken ew bawerîya em pêkve binin, binecih û zelal nabe. Bawerîyeke şîlo, bi kêrî çu karî naêt...

Quran ji ber vê çendê fikirîn û hizra lêkolînî peşniyar diketin. Di çîroka Îbrahîm de em vê bingeha eslî dibînin. Îbrahîm ji wan re weha digot: **“Êdî hûn qet difikirin, ka hûn ji çi re îbadetê dikin?”** Quran li gelek cihan, yê eqlê xwe bi kar nayînin rexne diket. Bi rastî insan ji ber eqlê xwe tete hesabê. Mirovê Misilman bawerîya xwe bê pirsîyar û bê fikirîn sehîh nabînît. Herçend di adetan de bawerîya mirov li ser teqlîdî hatibite qebûlîkirin ji gele aliman îmana teqlîd rexne kirine û gotine ji bo bawerîya zelal û rûşen divêt li ser tehqîq

bê kirin û kûr bêne vekolandin. Gele alimên mîna Matûrîdî îmana teqlîdî sehîh nedîtine. Îmana eslî ew e ku xîmgeha wê baş bête vekolîn. *Rebilalemin ji bo yê hez biket zanîna îrfanî û hikmetê dide. Û zanîna hikmetê ji kê re hatibe dayîne, êdî bi sond! Ji wî re qencyên pir hatine dayîn. Tenê yê bieqil difikirin û bibizir ji bûyeran dersê digirin.*

Disan ger mirov bi firehî berê xwe bidete meselê, dê bibîne ku mirov behra pirtir bi teqlîdî bawermend in û ji halê



xwe razî ne. Di kevneşopîya Îslamê de, du cur hîdayet, bawermendî hene. Ya ewil hîdayeta amme ye. Ev tevahî ye, Xwedê bi her mirovan daye. Ev ji beşek eqlê, bingeha hîdayetê ye. Her mirov dikare bi emilandina eqlê xwe bigihê hîdayetê. Di serhatîya Îbrahîm pêxember de em vê rastîyê bi sanahî dibînin. Bi fikr û ramanê xwe ewil dibêje *stêr Xwedayê min e. Paşê dibêje, yê diyar be û berze bibe nabe Xwedê...*

Hîdeyata din ji hîdayeta xas e, yanî peyama ku ji Xwedê ji benîadem hatîye. Ew ji kitêbên

îlahî ne. Wek Qurana pîroz. Quran, qîmetê didete eql, hizir, ilm û vekolînê û cehaletê rexne diket. Der esas, Quran bi ezmanekî tund dibêje: *“Pîştî ta xwe bide cabilan”, “qet yê zana û nezan dibîne yek...”* Ev û ayetên mîna van bi eşkereyî heqîqeta bawerîyê beyan diken. Li vê derê çî bûniya bawerîyê girîng e. Bawerî bi mirov ve girêdayî ye. Bi çî rengê tete holê û çî cur li derûniya mirovî tete bikaranîn, esasê mesela me ev e. Ilm, zanyarî wiha nîne. Ji eqlê hevbeşîya gel ilm saz dibin. Ji ber vê çendê li ser vê zanyarîye hevdîtin, hevrenî û qebûlîkirin heye. Îman û hizr çu caran ji hev cuda nabin. Di serhatîya Îbrahîm de em yekbûna îman û eqlî dibînin. Di vê qisseyê Îbrahîm de yek diyalektîka îlahî ji insanan ra hatîye nîşandin. Di esasê xwe de mirovên biaqil, yê eqlê xwe bikar tînin di Quranê de muxateb in. Gotin bo wan tete kirinê. Îman û aqil, berpirsiyarîyeke mezin derdixîne holê. Mûsa pêxember ji mîna Îbrahîm rêka îmanê li ser eqlî bilind diket. Rastîyê, sipehîyê, heqqîyê, edeletê li ser xîmê eqlî durist diket. Ev jî îmanê bi rêka eqlî pêk diînit. Îman bi vî rengî pek têtin û paşê jî divet qelb qebûl biket. Qonaxa qelbî navenda fitretê ye. Ev navend bi xeletîyê, xapandinê, şaşîyê, ji rêk derketinê, xiryanê ava nabe. Tecrube biken, heke tişteki li dijê fitretê bit hûn bi eql bidîne qebûlîkirinê dil dê adiz bit. Qebûlîkirina dilî bêderfet e.

Ji vê derê em dikarin bin-geha ceribandina bawerîya xwe pêk binin. Hizra xwe û bawerîya xwe binirxînin. Tenê bi vî şiklî em dikarin rastiyê û xeletiyê ji hev cuda bikin. **Bawerîya bab û bapîran heke ji bêjînga fikr û eqli derbaz nebit, dîndariya rojane ya me ji tesîra teqlîdê azade nabin.** Em dê di nav wan xeletîyan de berze bibin. Dînê Xwedê û dînê hatiye sazîkirin divêt ji hev cuda bin, êxsîr kevin. Ger em bi hişmendîyeke kûr bifikirin, em dê bibînin ku tiştên bi deste însanan, serdestiya hatiye sazîkirin ketiye pêşîya meseleyên eslî. Li hemî qadan mesele paşê bûye mesela pêşî û esasî. Sed mixabin, gelek meseleyên ku ji teref Xwedê hatine beyankirin ji teref însanan ve hatine paşguhkirin û însanan şîrîk ji Xwedê re çekirine. Ev jî ji dîn hesabandine. Bo mînak, di Îslamê de zewîcîna çend salî bi zewîcîna Pêxember li gel dayika me Eysê tete sazîkirin. Şevên qendîlê, fêmkirina hedîsan, bêguneh hesabandina hinde mirovan, jinberdan, xeyb, bi şiklekî libas lixwekirina jinan bi awayekî adet û rusûman dorpêç dibin û tene holê. Li her welatekî ev sazkarîya rusûmî mîna emrê Xwedê tete holê. Li dor rexên wan hind xurafe tene sazîkirin û bi navê dîn tene nav jîyanê, mirov di nav da şaş dimînit. Heqîqeta dînî jî hemî aliyan ve tete xerakirin... Rastîya dînî berevajî dibe û hukmên îlahî bi vî şiklî tene veguhastin. Bi wan bawerîyan

hind rêzdarî û siyanetê bi kar tînin ku ew dibite parçeyek dînî. Êdî jî vir wêvetir mirov nikarî van bawerîyên bêbinî şîrove yan rexne biket. Ew sazkarî wisa bi qedr û siyanet dikevin ku li nav mirovan dibine heqîqeta dînî. **Mixabin, heq û heqîqeta dînî xedarane jî rêka eslî tete veguhastin û peyama îlahî tete mehandin.** Bi rastî gelek caran bi bistehî (wêrekî) meriv nikarin der heqê vê neheqiyê xeber biden. Li dumahiyê, pêwîst e em hemî mîna Îbrahîm bawerî û ramanên xwe tehqîq bikin û xwe jî teqlîdan dûr bigrin. Lê divê ev ne bi meqamekî bêrûmetî, yan jî bi bêsiyanetkirina mela û seydayên me bête karanîn. Bêguman em dê ji ilm û tecrubeyên wan bê kêmasî istifade bikin. Em dê qedr û siyaneta wan bigirin. Lê bawerîya ku girêdayî me ye, em dê tehqîq bikin. Ev barê me ye, divêt em bigehînin qonaxê. Gava me mîna Îbrahîm, ew bawerîyên ku ji me re jî bab û kalan mîrat mayî tehlîl kir û me jî bo gihîştina bawerîyeke rast û zelal xîret kêşa دنیا û axreta me dê birûmet bit. Ew pûtxaneyî me di derunîya xwe de jî mal, genc, cih, adet û rusûman sazîkirî xirab kir em dê jî teqlîdîya efsûnî azade bin. Mîna Mûsa û nebîyên di em dê li hemberî zulm û zordariyê û neheqiyê bisekinin û em dê me'na ayetan jî nû fêm bikin.

**Bê şek û guman Quran jî bo mirovan hatiye û muxatabê wê jî insan in.** Çu cudahiye

naêxite nav însanan. Ne rengê wan, ne xwemaliya wan û ne jî bawerîya wan a berê vê heqîqetê naguhêrit. Quran, bi ziman, reng û çibûyîna însanan mijûl nabit. Lê bi hizirkirinê, emelkirina bi hizrê, nêrîna li tiştan, fêmkirinê, şîrovekirinê û bi mexsedê emilandinê ve mijûl dibit. Pîrsa wan hemî xîman diket, lê rêka rast û zelal jî nîşanî mirov didet. Quran gava vê bangê diket, li kar, bawerî, karbend, alimî, cahilî û jîyana li kîjan bajêrî yan wetenî nanêre. Însanbûna wan û hebûna wan jî bo bihîstîna bangê îlahî kafi ye. Em jî, divê mirovan gazî Xwedê û dînê Xwedê bikin. Gazîkirina mirovan jî divêt bi Quranê bête kirinê. Qewet û qudreta Xwedê tenê bi Quranê tete naskirin. Ew binişekî zelal û ronahî ye. Heke em bi baweriyê bi hizrên ku bingeha wan ne Quran e şîlo nekin, esasê dînî dê bi rehetî bête fêmkirin. Cudahîya oldarîya kevn, oldarîya li ser xîmê adet û rusûmên qedîm û dînê heqîqî dê bi sanahî rûşen bit. Ji bilî rêka Quranê çu çareserîya hizr û baweriyê nîne. Vê rêkê Xwedê nîşanî me didet. **Gelo ma em dikarin jî dervayî vê rêkê, gelaleyekî (model), rêkeke nû pêk binin.** Divê em mirovan gazî bi bal Xwedê bikin û vê gaziya xwe bi awayê ku Xwedê nîşanî me daye pek binin. Çu kes vî karî jî Xweda çetir nikarî bi kar bînit. Ji ber vê çendê lazîm e em dînê Xwedê şîlo nekin... Dîn hindî zelal bit, fêmkirina wê jî dê sanahîr bit...



# Çend meseleyên fiqhî

HAŞİM ÖZDAŞ

# 1.

## Îstixare çawa tê kirin? Gelo nimêj û duayê îstixarê heye? Û xewna piştî îstixarê tê dîtin 'emel pê tê kirin an na?

Me'neya îstixarê ew e ku; dema mirov serî li tiştêkî dide meriv başiyê û xêrê ji Xwedê bixwaze. Ango îstixare di encamê de dua û xwestinek e. Xwedê teala di Qurana pîroz de hînî me kiriye ka emê çawa dua bikin. Pêxember (s) jî di jiyana xwe de di vî warî de jî me re bûye nimûne û mînak. Xwedê wiha ferman dike: *"Hey gelî yên ku bawerî anîne! Bi sebr û nimêjê arikariyê bixwazin. Bi rastî Xwedê teala her demê bi sebirêşan re ye."* (Beqere, 2/153)

Ji Cabir Xwedê (jê qayil be) wiha tê ragihandin:

"Qasidê Xwedê (s) wek ayetek ji Qur'anê be, di hemû karên xwe de, îstixare hînî me dikir û wiha digot: *"Dema yekî ji we niyeta kirîna tiştêkî kir, bila ji xeyrî nimêja ferz du rekê sunnet bike û wiha dua bike: "Ya Rebbî! Ez bi zanebûna te xêrê dixwazim. Ji bêz û qeweta te qewetê dixwazim. Ez ji lutf û kerema te daxwaz dikim. Bêguman qeweta te digihêje her tiştî, qeweta min tune ye. Tu dizanî lê belê ez nizanîm. Tu hemû karê veşartî û nepenî dizanî. Xwedayê min! Eger ev kar ji bo dîne min, jiyana min, dawîya karê min, ji roja min yan jî ji bo pêşeroja min bixêr be, tu ji min re teqdir û muvesser bikî û piştê jî min re pîroz bikî. Eger ku ev kar ji bo dîne min, jiyana min, dawîya karê min, roja min yan jî ji bo pêşeroja min nebaş û ne bixêr be, min ji wî karî û wî karî jî ji min dûr bixe. Li ku dibe bila bibe her dem ya bi xêr ji min re teqdir bike*

*û min bi wê xêrê qayil bike"* (Buxarî, Teheccud, 25, Deawat, 49, Tewhîd, 10; Îbn Mace, Îqame, 188; Ehmed b. Henbel, 3/344)

*Ji fuqehayê Malikiyan Îbn'-Hac el-Ebderî dibêje: Îstixare jî vê pêk tê. Û wiha berdevam dike, bi armanca nîşangirtinê û elamet ditinekê, ew bi xwe yan jî kesekî din ji bo wî têkeve xewê, ji navê kesan an jî rojan oxirê bêvi bike, helwestên bi vî şeklî û serî lêdan li van bid'etê.* (Salim Ögüt, "Îstixare", **Ansiklopediya Îslamê ya Diyanetê**, Stenbol, 2001, c: 23, r: 334.)

Tu tîkiliya xewnê û îstixarê bi hev re tune ye. Lewra îstixare wek ku me li jor jî got: Xwestin û daxwaziya baş û bi xêr ji Xweda teala ye.

Îstixare bûyereke ferdî ye û îbaret e ji: Piştî ku mirov hemû hewldan, lêgerîn û şêwrên xwe temam bike, dua ji Xwedayê xwe bike ku ya baş û bixêr teqdir bike. Piştê mirov rizgar û serbest e. Ku bivê wê bike û nevê jî wê neke. Ango îstixare, tu girêdana wê ya pêwîst û teqez tune ye.

# 2.

## Berendamê zewacê, piştî xwestin û nîşanê dikarin dev ji hev berdin?

Nîşanî îbaret e ji hin merasîm, peyman û soza zewacê ya di pêşerojê de ye. Xwestin jî biryardayîna ji bo zewaca di demeke pêş de ye. Ji ber wê yekê ne xwestin û ne jî nîşan, di navbera her du aliyan de tu tîkilî û pêwendiyên dînî û fermî çênake. Lewra nîkah di hizura şahidan de, bi îcab û qebûl û hin şertên din dibe zewac. Ji

ber ku nîşan ne nîkah e mirov nikare bi dergîstî an jî bi nîşaniya xwe re bi tenê bimîne. Bi mirina yekî ji herduyan kes nabe mîratxwarê yê din. Di dawiyê de her du alî jî dikarin dev ji hev berdin.

### 3. Kesê/a ku jina wî/mêrê wê bimire, kengî dikare bizewice?

Kesê ku jina wî bimire ne hewce ye ku demek xuyakirî di ser de derbas bibe. Li aliye din, jin piştî ku mêrê wê mir, divê çar meh û deh rojan bisekine ango iddetê xwe bikişîne (li sûretê Beqere 2/234 binihêrin) û dûvre bi şert û mercên ku ji bo zewacê pêwîst in dikare bizewice.

### 4. Nîkaha kesêkî/e Şafî bi yekî/e Henefî re çawa tê birîn?

Nîkah ne li gora mezheban belbî wek ku Pêxember (s) kiriye tê birîn. Wî çawa birîbe Misilmanan jî divê nikahên xwe bi wî hawî bibirin. Cudahîtiya mezheban nabe sedemê cudabûnê di birîna nîkahê de. Ji bo nîkahê, bi şertê du şahidên pêbawer, destûra weliyê keçîkê, li gorî me'rûfê û bi şertê mehrdayinê nîkah tê birîn.

### 5. Hukmê zewaca bi ehlêkitab an jî bi jinebiyan re?

Eger pîrek bi rêyek helal bûbe jinebî ango bi rêya berdanê an jî bi rêya mirina mêrê wê bûbe jinebî, piştî derbasbûna iddetê wê meriv dikare pê re bizewice. Lê belê ger jinebîtiya wê bi sedemê zînayê be, li gorî hukmê ayeta sêyemîn ji sûreyê Nûr "Zilamê zînaker, tenê bi jineke zînaker re yan jî, bi jineke muşrik re dikare bizewice: Jina zînaker jî, tenê bi mêrekî zînaker yan jî, mêrekî muşrik dikare wê mehr bike. Ew li ser ên xwedan barwer hatiye heramkirin." zewaca pê re hatiye qedexekirin.

Lê belê di ayeta pêncem ji heman sûreyê de, tobe bike, hal û hereketê xwe rast bike hukmekî awarte ji wan re heye. Ango destûra zewaca bi wan re hatiye dayin. Ayet wiha ye: "Lê belê ewên ku piştî wê, tobe bikin û xwe rast bikin ew cuda ne. Vêca bi rastî Xwedê teala gunehjêbir û dilovan e."

Zewaca bi ehlêkitab (ji Xaçparêz û Cihuyan) re caiz e. Xwedê teala di sûreyê Maîde ayeta pêncem de wiha ferman dike: "... Ji Misilmanan jinên pak, paqij û azad, ji xwedankitêbên beriya we jî jinên dawpaqij û azad, dema hûn mehra wan bidin, bi namûs, ne bi zînayê û ne jî ku hûn wan ji xwe re bi dostanî bigirin, ji bo we helal in."

### 6. Nîkaha zirbira û zirxwişkan bi hev re caiz e yan na?

Bira û xweşkîti bi sê awayan pêk tê.

- Xwişk û biratiya bi rêya dê.
- Xwişk û biratiya bi rêya bav.
- Xwişk û biratiya bi rêya dê û bav.
- Xwişk û biratiya bi rêya şîr.

Ji van her çar cureyên xwişk û biratiyê tu kes nikare bi yê din re bizewice. Ji bilî van mirov dikare bi hev re bizewice. Mîna bavê mirov bi jinekê re bizewice û keçekê wê jinekê ji mêrekî din hebe, kurê bav dikare bi keça jinbava xwe re bizewice.

### 7. Ji aliyê Îslamî ve, hukmê ewladgirtina zarokê hêj nû hatibe dinyayê çi ye? Ew zarok dibe wek zarokê mirov ê rastî û ew jî jê re dibin dê û bav?

Di dema cahiliyê de li ba ereban ewladgirtina zarokan edetek belavbûyî bû û pir dihat dîtin. Û zarok, mîna zarokê heman dê û bavî dihat hesibandin. Dema ku bavê vî bimira jî dibû xwediya mîrata mayî. Îslam ew rewşa han ji holê rakir. Xwedê teala di Qurana pîroz de wiha perman

dike: "...û zirkurên we jî, ji we re nekirine wek kurên we yên rastîn! Ev gotinî we yên ji devên we ne. Xwedê teala jî, rastiye dibêje û ew e ye ku mirovan tîne rêya rast. Naxwe (zirkurên xwe) bi bavên wan gazî wan bikin, ev li cem Xwedê teala dadmendtir û rasttir e. Vêca ku hûn nizanibin bavên wan kî ye, ew di din de bira û merwayên we ne." (Ehzab 33/4-5)

Di dinê Îslamê de ewladgirtin hatiye qedexekirin. Lê belê mezinkirina zarokên bêkes pir bixêr e. Lêbelê divê mirov pir bala xwe bide van tiştên li jêr:

1 – Divê zarok bizanibe ku ew kesên wî xwedî dikin û lê xwedî derdikevin ne dê û bavê wî yî rastî in.

2 – Piştî mirina wan, zarok nabe xwediyê tu mîratê, encax bi rêya wesiyetê zarok dikare parekê xuyakirî ji mîratê bigire. Ew jî eger mîratxwerê mirî hebin divê wesiyet ji sêyeka mal ne pirtir be.

3 – Divê ji bîr neke ku, ew yekî xerîb e û van kesana lênerîna wî dane ser xwe. Kur dibe an jî keç dibe tu cudatiya wan ji mirovên xerîb ên din tuneye.

Eger zarokê hê nû hatibe dinyayê were ewladgirtin û ji aliyê pîrekê we bê şîrdayîn, wê gavê pîrek dibe diya wî ya şîr. Û xerîbtîya di navbera wan de herçiqas ne ji aliyê mîrasê ve be jî, lêbelê ji aliyê zewacê êdî tu xerîbtî di navbera wan de namîne û li hev du heram dibin.

Xwedîderketina li zarokên bê dê û bav û mezin kirina wan bi rîayeta rê û rêbaza rast wek ku me got karekî pir mezin û bixêr e. Di wî warî de Pêxember (s) wiha ferman dike: "Kesê li yetimekî binihêre û wî biparêze, di cennetê de wek tiliya şehadetê û ya navîn emê nêzî hev bin." (Buxarî, Edeb, 24; Mislim, Zuhd, 42)

## 8. La hewle wela qûwwete îlla billahîl eliyîl ezîm tê çî me'neyê?

**Me'na vî zikrê hanê wiha ye:** "Tevdê hêz û gewetan bi arikariya Xwedayê mezin tê bidestxistin."

Gava însan wî duayî dixwîne zeîfîya xwe îtiraf dike. Wek bibêje ji te pê ve tu piştgirê min tunene û bêyî arikariya te ez nikarim di tu karî de serkeftî û serfiraz bibim.

## 9. Em dikarin di duayên xwe de wiha bêjin: "Ya Rebbî! Tu bi xatirê filankesê hanê duayê me qebûl bikî."

Duayên bi vî hawî, di Mewlida Suleyman Çelebî û ye mîna wê mirov bi rehetî dikare bibîne. Encax dua bi vî awayî nayê kirin. Ji ulemayê Henefîyan Îbn Ebu'l-Îzz wiha dibêje: "Ne caiz e mirov tişteki ji Xwedê teala pê ve ji bo qebûlbûna dua bike wasite û sedem... Kesê ku wasiteyan dixwe duayên xwe dixwaze wiha bibêje: "Ji bo ku filankes ebdê te yî baş û salih e tu ye duayê min qebûl bikî." Lê ka çî elaqe di nava wê xwestinê û salihtiya ye din de heye? Ev, di dua û xwestina ji Xwedê teala de nasnekirina sînoran e.

Xwedê teala di ayetekê de wiha ferman dike: "Bi dizî, bi zarezar û lakelak, li ber Xwedayê xwe bigerin, bi rastî Xwedê, ji sînornenasan hez nake." (E'raf 7/55)

Ev dua û ye mîna wê, piştî Pêxember (s) shehabî, tabîîn û îmaman derketiye, tişteki wê û rastiye ji ber hev tuneye. Encax li ba hin kesên cahil an jî menfeetperes tê dîtîn. Ji bilî wan kesan li cem tu kesê din nayê dîtîn.

**Ey dil  
were weqtê  
mecal**

**Melayê Cizîrî**

Ey dil were weqtê mecal da kin senaya Hindiyan  
Ebdal bibin hem laûbal dîsan ji dest wan xemriyan

Dîsan ji dest wan sorgulan pir can ji xala filfilan  
Perde ji taye sunbûlan bend bûm bi dava bendiyan

Bend bûm bi dava enberîn şaha ji bin perda berê  
Rengên siyah jê ku birîn da bête çengê cindiyan

Da bête ceng û herb û şer zulfa ji qewsê be weter  
Tek da xûrîn Tirk û Teter deng tete nêva sitîyan

Sotem medîm ez bûm mudam çûne ji dest eql û wefam  
Mecnûn ez sehra meqam dil kefte zarê ef'îyan

Ef'eya li ser wa silsilên reşmar ji dur can kemilîn  
Di ber da binêr baxê gulîn daîm xeyala hebsiyan

Mehbûs im ez zîndan qefes şaha ji min girtin hewes  
Zaxa ji dêm rengê weres mexlûq ji miskê cismiyan

Mexlûq ji misk rengê cesed dindan û lêv le'l û bered  
Bêwa niye ew reng çu qed di mexrib û di şerqiyan

Nîne di şerq ew reng zerî însaneke mîslê perî  
Mewla ji nûrê aferî nayêt ji wê din wesfiyan

Ehmed mebe cewr û cefa tu terk meke emrê îlah  
Lew aqîbet wê bên fena bigre terîqa şer'îyan





# Mifteya cennetê: Kelîma tewhîdê

MURAD CELALÎ

[muradcelali@gmail.com](mailto:muradcelali@gmail.com)

**H**emû kar û xebat ji bo armançekê tên kirin. Li vê dinyayê armanca Misilmanan a bingehîn bidestxistina rizaya Xwedê ye. Lewra gava meriv riza û qayîlbûna Xwedê teala bi dest xist, êdî dergehê nîmet û xêran li ber vedibe. Di hereket û biryarên xwe de bi xwe bawer e. Ew dizane û hêvî dike ku dê di encama bizav û tekoşîna xwe de merama dilê xwe hasil bike, dê gelek ber û fêkiyan bi dest xwe ve bîne. Bi rastî ji van fêkiyan yê herî mezin jî bêguman cennet û jiyana wê ya heta hetayê ye. Lê ji bo ku mirov bikaribe here bihiştê û ji wê jiyana bextewar hîssedar be, divê mifteya wî warî di destê mirov de hebe. Bi baweriyeke yeqîn ew mifte jî, laîlaheîlallah e.

Di Buxarî û Mislim de ev hedîsa ji Enes (r) hatiye ragihandin:

Carekê dema Qasidê Xwedê (s) û Muaz bîn Cebel (r) tev li heywanekê sîwar bibûn Qasidê Xwedê gazi Muaz (r) dike:

“Ey Muaz!”


Muaz dibêje: “Ey Qasidê Xwedê! Ez ji bo îcabet û îtaetê amade me!”

Qasidê Xwedê (s) dîsa got: “Ey Muaz!”

Dîsa Muaz gotina xwe ya berê dubare kir:

“Ez ji bo îcabet û îtaetê dîsa amade me!”

Piştî ku ev xeberdan di



navbera wan de sê caran dubare dibe, Qasidê Xwedê (s) jê re dibêje:

“Gava ku yek şehdê bîne û bêje ji bilî Xwedê tu îlahê ku hêja ye îbadet jê re bê kirin tune ye û Mûhemmed jî Qasidê Xwedê ye, êdî Xwedê êgir li wî kesî heram dike.”

Li ser vê Muaz got:

“Ey Qasidê Xwedê! Ez vê ji mirovan re bibêjim, mizgîniyê bidime gel?” Qasidê Xwedê wiha kerem kir: “Wê

hingê dê piştî xwe bi vê girêbidin.”<sup>1</sup>

Dema Muaz (r) li ber sekreta mirinê bû nedixwest ku tişteki wiha ji mirovan veşêre. Lewma ev hedîs ragihand.<sup>2</sup>

Di Buxarî û Mislim de ji Utban Îbn Malik (r) hatiye ragihandin ku Qasidê Xwedê wiha gotiye:

1 Buxarî 2756; Mislim 30/49.

2 Buxarî, Ilm, 49; Mislim, Îman, 53 (32); Malik, Taharet, 85.

“Roja qiyametê kesê ku rizaya Xwedê dixwaze û dibêje laîlaheîlallah Xwedê êgir lê heram dike.”<sup>3</sup>

Di Mislim de hedîseke ji Ebû Seîd û yan jî Ebû Hureyre hatiye rîwayetkirin. Çaxê li Tebûkê sehabî li gel Qasidê Xwedê (s) ne, xela li wan radi-be. Ji ber vê Qasidê Xwedê (s) ji wan dixwaze ku pirtikek pîne binin. Qasidê Xwedê ew pîneyê ku wan anî li erdê raxist. Vê carê ji her kesî xwest ku ji cîriya wan çi mabe hildin binin. Merivekî kulmek garis, yekî din kulmek xurme û yekî jî pirtikek nanê hûrbûyî anî. Di axiriyê de li ser wî pîneyê li erdê raxistî hinek zad/cirî kom bû. Qasidê Xwedê (s) li ser wê duayê bereketê xwend û ji eshabê xwe re got ku derdanên xwe ji vir dagirin. Hemûyan derdanê xwe dagirtin, wisa bû ku di artêşê de derdana tijînebûyî/vala nema. Her kesî heya bi têrxwarin jê xwar û paşê jî ji wî zadê bibereket hinek ma. Piştî van hemûyan Qasidê Xwedê wiha ferman kir:

“Kî şehadetê bîne ku ji xêncî Xwedê tu îlah tune ye û ez jî Qasidê Xwedê me, ez şehadetê dikim ku bêyî şek û guman bi van her du şehadetan bigihêje bal Xwedê, Xwedê wî bendeyê xwe ji cennetê meni' nake.”<sup>4</sup>

Di Buxarî û Mislim de hedîseke ji Ebû Zer (r) tê

3 Buxarî, Rîkak, 6; Mislim, Mesacîd, 263 (33).

4 İbn Receb el-Henbelî, *Kelîmetu'l-İklas*.

Qasidê Xwedê (s) wiha ferman dike:

“Bendeyekî ku bêje ji xêncî Xwedê tu îlah tune ye, paşê li ser wî halî bimre dikeve bihiştê.”

Çaxê Ebû Zerr (r) pirsî: “Gelo zina bike û diziyê bike jî?” Qasidê Xwedê got: “Zîna bike û diziyê bike jî.” Û ev gotin sê caran dubare kir. Cara çaran jî got: “Pozê Ebû Zerr (r) li erdê bigere jî!”<sup>5</sup>

### Ji Pêşî û Aliman Çend Şirove

Dema jina Fîruzdak dimire û wê defin dikin Hesên (r) wiha ji Fîruzdak pirsî:

“Te ji bo vê roja xwe çi amade kir? Fîruzdak jî wiha bersiv dayê:

“Ew laîlaheîlallah ku ji heftê salan mêj ve ye dibêjim.” Li ser vê Hesên got: “Ev amadekariyeke çi qasî rind e! Lê hinek şertên laîlaheîlallahê hene ku divê bîne zanîn û li pey bê çûyîn. Herwiha xwe ji avêtina jinên bi îffet/daw pak dîr bigire.”

Ji Hesên (r) hatiye rîwayetkirin ku:

“Meriv dibêjin ku kesê laîlaheîlallahê dibêje dê bikeve bihiştê. Tu ji vê re çi dibêji? Hesên jî dibêje:

“Kê bêje la îlaheîlallah û heqê wê bidê (ango hewcehiyên wê pêk

5 Buxarî, 5827; Mislim, 94.

bîne û xwe ji wan tiştên betal dike dîr bigre, şertên wê wekî hewce dike bi cî bîne) diçe bihiştê.”

Wehb İbn Munebbih wiha bersiv daye wî kesê ku jê pirsîye, gelo laîlaheîlallah mifta bihiştê nîne?

“Erê, rast e, hemû mifte diranên wan hene. Heke tu mifta bi diran bîni, gelo derî li te vedibe? Heke mifte bê diran be venabe.”<sup>6</sup>

Ji bo sihet/rastiya vê gotina Wehb bîne Munebbih delîl ew e ku Qasidê Xwedê di gelek hedîsên xwe de ji bo çûna bihiştê emelê salih kiriye şert.

Ev hedîsa di Buxarî û Mislim de derbas dibe û Ebû Eyyûb (r) ragihandîye: Merivek hate cem Qasidê Xwedê û jê re got:

“Ji min re emelekî wisa bibêje ku gava ez wê bikim min daxilî bihiştê bike.”

Qasidê Xwedê (s) ji wî re got: “Divê tu tenê ji Xwedê re îbadetê bikî û tu tiştî ji wî re nekî şirik. Nimêj bikî, zekatê bidî, xwedî li merivên xwe derkevî û herî dîtina wan.”

### Şert û Mercên Pêwist

Wekî tê zanîn îro li ser rûyê cîhanê bi milyaran kes la

6 Di *Feth-ul Bariyê* de di şiroveya hedîsekê de ev hatiye zikirkirin. Herwiha Buxarî di *Tarîxa* xwe de jî rîwayet kir. Ebû Naîm di pirtûka xwe *El-Hilyeyê* de ev zikir kir.

îlahe îllallah dibêjin, lê pira-  
niya wan mane û mercên wê  
nizanin. Mixabin di civaka  
me Kurdan de jî rewş wisa ye.  
Seba ku em rastiya vê mifteya  
ku dê dergehê cennetê li me  
veke hîn bin emê bi kurtasî li  
vir şert û mercên wê bidin.

**Ya yekemîn:** Divê ku kesê  
vê peyvê, ango laîlaheîlallah  
dibêje me'neya wê jî baş zani-  
be. Lewra heke meriv me'neya  
wê nizanibe, meqsed hasil  
nabe, ew şer û doza Pêxember  
û alimên Îslamê yên di rêya wê  
de nayê fêmkirin. Mûhemmed  
eleyhîsselam di hedîseke xwe  
de wiha dibêje:

“Ji min re hatiye ferman-  
kirin ku ez bi mirovan re şer  
bikim ku heya bi laîlaheîlallah  
Mûhemmed Resûlullah  
şhadetê binin, nimêjê bikin  
û zekatê bidin. Heke vê bikin,  
ji bilî heqê Xwedê, malê xwe  
û xwîna xwe ji min parastine.  
Hesabê wan jî li ser Xwedê ye.”<sup>7</sup>

Xwedê di Qur'ana pîroz de  
wiha ferman dika: *“Bizanibe ku  
bêguman ji xencî Xwedê tu îlah  
tuneye.”* (Mûhemmed: 19)

*“Ewê ku ew ji bilî Xwedê  
jê re dua dikin, malikê şefaetê  
nînin. Lê ewê şahidiya heqiyê  
dikin û dizanin ne tê de.”*

(Zuxrûf: 86)

*“Xwedê, şahidî kir ku bilî  
wî îlah(ê layiqê îbadetê) tuneye.  
Milyaket û aliman jî bi edalet*

*şahidiya vê kir. Ji bilî wî îlah(ê  
layiqê îbadetê) tuneye. Ew ezîz  
e, hekîm e.”* (Alî Îmran: 18)

Resulê Xwedê (s) wiha fer-  
man dika:

“Kî me'neya laîlaheîlallah  
bizanibe û li ser wê bimre cihê  
wî bihişt e.”<sup>8</sup>

**Ya duyemîn:** Bêşik û  
guman qebûlkirina me'neya  
laîlaheîlallahê.

Xwedê teala wiha fer-  
man dika: *“Mumin her ew  
in ku bi Xwedê û Qasidê  
wî barwer dikin, paşê bêyî  
ku têkevîne şikê di rêya  
Xwedê de bi malên xwe ve  
û bi canên xwe ve cîhadê  
dikin. Aha ew yên sadîq in.”*  
(Hucûrat: 15)

Di *Sebiha Mislîm*  
de hatiye ragihandin ku  
Qasidê Xwedê (s) wiha  
ferman dika:

“Kî bêşik şahidiya  
laîlaheîlallah Mûhemmedun  
resûlullahê bike û li ser vê  
rewşê bimire ji bihiştê meni'  
nabe.”

“Ya Eba Hureyre! Heke  
tu di piştî vî bostanî de rasti  
kesên bêyî guman şahidiya  
laîlaheîlallahê dikin bêyî,  
mizgîniya bihiştê bide wan.”

**Ya sêyemîn:** Bi dil û can  
gotin û qebûlkirina me'neya la  
îlahe îllallahê.

Xwedê teala wiha ferman  
dika: *“Bêguman gava ji wan re  
tê gotin; ji xencî Xwedê tu îlah*



*tuneye” xwe mezin dikuştin  
û digotin: Ma qey emê ji ber  
şairekî dîn/şet dev ji îlahên xwe  
berdin?”* (Saffat: 35-36)

**Ya çaremîn:** Li gor  
me'neya laîlaheîlallahê guher-  
tina tevger û jiyana xwe.

Xwedê wiha ferman dika:  
*“Beriya ku ezab bigihê we berê  
xwe bidine rebbê xwe û teslîmî  
wî bibin. Paşê arikariya we jî  
nayê kirin.”* (Zumer: 54)

*“Ma kî ji ewê bi qencikarî  
xwe teslîmî Xwedê kiriye û bûye  
peyrewe dînê/milletê Îbrahîmê  
henîf ji hêla dîn ve rindtir e?  
Xwedê Îbrahîm ji xwe re kiriye  
dost.”* (Nisa: 125)

*“Yên bi qencikarî berê xwe  
bidine Xwedê bêşik dest avêtine*

7 Buxarî, Kîtabu'l-Îman, 25;  
Muslîm, Kîtabu'l-Îman, 21.

8 Mislîm, Behsa Îmanê.



*qulpeke wisa ku qetbûn jê re tune-  
neye. Aqûbeta hemû karan vedi-  
gere bal bi Xwedê.*” (Loqman: 22)

Di ayetê de îbareya *“qulpe-  
ke wisa ku qetbûn jê re tune-  
neye”* derbas dibe û ji vê meqsed jî  
laîlaheîlallah e.

Xwedê (c) wiha ferman  
dike: *“Nexêr! Bi rebbê te sond be  
heta ew di problemên di navbera  
xwe de te hekem negirin û dema  
te der heqê wan de hukim da jî di  
xwe de bêacizî teslîm nebin ew  
nabine mumîn.”* (Nîsa 65)

Mufessîrê mezin Îbn  
Kesîr der barê tefsîra vê ayetê  
de wiha dibêje:

“Xwedê teala li ser zatê  
xwe yê muqeddes sond dixwe  
û ferman dike ku hetanê di

hemû karên xwe de Xwedê û  
qasidê wî hakem negirin tu kes  
nabe Misilman. Û çaxê biryar  
hate dayîn çî veşartî çî jî eşkere  
be qebûlkin ferz e.”

Xwedê (c) wiha ferman  
dike: *“Û dema te der heqê wan  
de hukim/biryar da jî di xwe de  
bêacizî teslîm nebin ew nabine  
mumîn.”*

Ango çaxê ku wan tu jî  
xwe re hekem girtin, bi dil û  
can teslîmê biryara te dibin û jî  
vê biryarê aciz nabin. Lewra bi  
her awayî peyrewê biryarê ne.  
Bê nîqaş û bê hember derke-  
tin, bi temamî teslîmê biryarê  
bûne. Ev rewşa di hedisekê de  
wiha tê beyankirin:

“Bi Xwedayê xwe sond

dixwim ku heta daxwaza nefsa  
we li gor tiştê ku min aniye  
nebe we bawerî neaniye.”<sup>9</sup>

**Ya pêncemîn:** Bi dil (qelb)  
û gotina xwe ve tesdîqkirina vê  
peyvê.

Xwedê (c) wiha ferman  
dike: *“Ji mirovan hinek jî  
hene her çendî bawer nekirine  
jî dibêjin; em bi Xwedê û roja  
dawiyê bawer dikin. Lêbelê,  
bawer nekirine. Qaşo Xwedê û  
bawermendan dixapînin. Lê ew  
hema xwe dixapînin û tê derna-  
xin. Di dilê wan de nexweşiyek  
heye. Xwedê jî nexweşiya wan  
zêde kiriye. Ji ber derewên dikin  
ezabekî dilsoj heye.”* (Beqere: 8, 10)

Qasidê Xwedê (s) wiha  
ferman kir:

“Her kî bi dil û can şahî-  
diya laîlaheîlallah Mûhem-  
medun resûlullahê bike cehe-  
nem ji wî re heram e.”<sup>10</sup>

“Şefaeta min ji bo wan  
kesan e ku laîlaheîlallahê bi  
îxlas tesdîq dikin û gotina wan  
ya dilê wan û dilê wan jî gotina  
wan tesdîq dike.”<sup>11</sup>

**Ya şeşemîn:** Bi îxlasbûyîn,  
ango tenê ji bo Xwedê emelki-  
rin û xwe ji şirkê paqijkirin.

Xwedê wiha ferman dike:

*“Baş bizane ku dinê xalis her  
yê Xwedê ye. Ewên ku ji xêncî  
Xwedê dostan digrin: (Dibêjin)  
ku em ji wan re îbadetê dikin da  
ku me hê nêzîkî Xwedê bikin.”*

9 Mislim, *Tefsîra Îbn Kesîr*.

10 Buxarî û Mislim.

11 Hakim.

*Bêşik tiştê ew tê de dikevîne  
ixtilafê, Xwedê wê di navbeyna  
wan de hukim bide. Bêguman  
Xwedê hidayetê nade kesê de-  
rewker (û) kafir.*" (Zumer: 3)

*"Bi rasti ji wan re hatibû  
fermankirin ku bi awayê ji şîrkê  
paqijbûyî ji Xwedê re îbadetê bi-  
kin, nimêj bikin û zekatê bidin.  
Dînê rast jî ew e."* (Beyyîne: 5)

Îmam el-Fadl Îbn Îyad (r)  
wiha dibêje:

"Xwedê (c) emelê ji bo  
rizaya wî têne kirin gava awayê  
wan li gor rizaya wî nebin  
qebûl nake. Herwiha emel  
Xwedê çawa xwestiye wisa  
be lê ji bo rizaya wî nebe dîsa  
qebûl nake. Ji ber ku Xwedê

tenê emelên ji bo rizaya wî û  
di awayê sunneta qasidê wî de  
têne kirin qebûl dike."

**Ya heftemîn:** Hezkirina  
kesên dibêjin laîlaheillellah  
û di rêya wê de diçin. Ew, ji  
kesên vê rêyê qebûl nakin û ji  
xwe re hin rêyên din digrin hez  
nakin û ji wan ji bo xwe dost  
nagirin.

Xwedê (c) wiha ferman  
dike: *"Ji mirovan hinek ji xêncî  
Xwedê hinekan hemta digrin,  
mîna ku ji Xwedê hez dikin ji  
wan hez dikin."* (Beqere: 165)

*Gelî yên bawerî anîne! Ji we  
kî ji dînê xwe vegere, Xwedê dê  
komeke wisa bîne ku ew ji wan  
hez dike û ew jî ji wî hez dikin.*

*Ew li hember bawermendan  
nefspiçûk, li hember kafiran jî bi  
hêz û rûmet in. Di rêya Xwedê  
de cîbadê dikin û ji şermezarkî-  
rina şermezarkeran natirsin. Ew  
kerema Xwedê ye. Wê ji bo kê  
bixwaze didiyê. Xwedê wesi' e,  
'elîm e."* (Maîde: 54)

Qasidê Xweda (s) wiha  
ferman kir:

"Ew her sê tişt li bal kê  
hebin wî tehma îmanê hildaye.  
Xwedê û qasidê wî jî her tiştî  
zêdetir hez kirin û ji bo rizaya  
Xwedê jî ji mirovan hez kirin.  
Piştî ku ji kufrê rizgar bûne,  
mirov çawa ji êgir ditirse wisa  
ji kufrê ditirsin."<sup>12</sup>

12 Buxarî û Mislim.

# Dubeytî

**Baba  
Tahirê Uryan**

Ji Lorî: Feqî Bilal  
Çolig

Xweşî bi wan ku Xwedê yarê wan be  
Hemd û qulhuwella karê wan be

Xweşî bi wan ku daîm bi nimêjan e.  
Bihiştta Cawîdan her bazara wan e

Dilem meyla Gula Baxê te dike  
Derdê te nava sîna min dax dike

Bedenekî mîhnetkêşa min heye Xwedaya!  
Dilekî xemxweşa min heye Xwedaya!

Ji şewqa meskenê û feryada xerîbiya  
Di sîna min da agirek heye Xwedaya!

Bê te ya Rebb, nav bostan, gul nebe şîn.  
Eger şîn bibe jî kesek neke bîn

Te ku nexwendîye ilmê semawat.  
Tu ku neçûyî rê di nav xerabat.

Tu ku nizanî ji xwe re sûd û ziraran.  
Heyhat, tu yê çawa bigehî hevalan?

Eger dil dilber e, dilber çi awa ye?  
Weger dilber dil e, navê dil çi ye?

Tevlihev bûne dil û dilber.  
Nizanim kîjan dil û kîjan dilber



# Hedîs-Hedîsê Mewzûyî û sebebê ci

EHMED KIRKAN

## Hedîs

Rîwayetêke bi rêzilêka pête pêxamberê ma ra yenê, ci ra hedîs vajîyêno. Her hedîs de di beşî estê. Nê beşan ra yewe sened, yew zî metîn o. Sened, rîwayetkerdoxo peynî ra dest pêkeno û heya pêxamberî dewam keno. Ganî, sened mîyan de kemaneyî çin bo û cayêke de sened nêqurfîyo.

## Hedîsa Mewzû

Hedîsa mewzû, qîseya ke bi nameyê pêxamberîya vajîyaya, îfade kena. Ewtîya de badê pêxamberî, sewbîna merdimî, bi nameyê pêxamberîya qîseyî rîwayet kenê. Kitabanê Hedîsan de zafane “mewduun ‘ela filan” cû îfadeyana ravêrenê. Sebebê hedîs panayene zaf

ê. Labelê armanco sereke kerameyê xo dest vînayîş o. Hedîsê mewzûyî kitabânê hedîsan mîyan de zaf ravêrenê. Heya kes eşkeno vajo ke, eke merdim nê hedîsan lîteraturî mîyan ra wedarno, peynî de zaf tayn hedîsî manenê.

Bi nameyê resûlê Homayîya hedîs panayene çi wext dest pêkerdo, ney sero xeylê şîroveyi estê. Labelê no gurwe zelal nîyo. Tayn merdiman vato ke “Demê pêxamberî de dest pêkerdo.” Labelê no mimkun nîyo. Çunke senedê hedîsan de rîwayetkarê sifteyênî embazê pêxamberî yê. Eke hedîsa mewzû no dem de destpêkero, hewceyo ke embazê resûlî, bi nameyê resûliya hedîsê mewzûyî vajê. No hal zî hem resûlî rê hem zî embazanê resulî rê heqaretêk o.

Şîroveyo ke qebûl beno hedîsa mewzû demê Xelîfe Usmanî de destpêkerdo. Dima no gurwe sey wevrêsîya dewam bîyo. Çunke demanê dimayênan de bi hezarana hedîsî îhdas biyê.

Her çi wext û kotî de beno va bibo pêxamberî (selat û selamê Homayî ey sero bê) no tahluke ferq kerdo û semedê ney bawermendî îqaz kerdê. Bi no wateya zaf hedîsî estê ke nînan radi hebê ci nê yê:

- Kam bi qesdêna, çîyo ke mi nêvato, bi nameyê mina vajo, êdî va cayê xo cehenem de hadre kero.
- Demo ameyox de tayn zûrkerî do bivij-yê. Êdo şîma rê tayn rîwayetê ke ne şîma û ne zî bawkalanê şîma aşnawitê, bîyarê. Înan ra xo bipawê. Wa şîma rayîr ser ra nêvînê.

Ewtîya ra vijêno meydan ke pêxamberî no tahluke ferqkerdbi. Çunke quran binê hîmayeyê Homayî de bi. Labelê qiseyê pêxamberî yanê hedîsî bêsitari bî. Qandê cû pêxamberî no mijar de balê bawermendan ante û bawermendî îqaz kerdî.

## Sebebê Hedîsanê Mewzûyan

Hedîsê mewzûyî bi çend sebebana ameyê rîwayet kerdene. Çaxo ke ma çim çekenê nê mijarî se vijêno meydan de tena kafîran nê bawermendan zî bi fekê pêxamberîya hedîsî panayê.

Ge-ge taasûbê mezhebî, ge-ge taasûbê qewmîyetî ra, ge-ge zî goreyê fikrê xo rindeyî kerdênî ra hedîsî îhdas kerdê.

Eke ma sebebânê nê gurwî rêzkerê se:

### I. Duşmeneya

#### Îslamîyetîye: Duşmeneya


Îslamîyetîye bi koçkerdena pêxamberîya destpêkerdo. Dima zî no gurwe rayîr ra vijyayo. Munafiqê ke mîyanê bawermendan demendê bêters û bêxewf êrişê bawermendan kerdo. Nika ma vînenê ke lîteraturê Îslamî de zaf hedîsê mewzûyî estê. Sebebo sereke duşmeneya Îslamîyetî ya.

### II. Kom, mezheb û qewma xo

**parêzkerdene:** Cîya cîya grubî,seba ke fikranê xo mudafa kerê cû dînî xo rê maske kenê. Ser mijarê ci eke hedîsî çînê, bi nameyê pêxamberîya nînan vanê. Semedê Tirkan, Ereban, Farisan û sewbîna mîletan xeylê hedîsî ameyê vatene.

### III. Xeyretê Grubanê Sîyasîyan:

Lejo ke demê Xelîfe Usmanî dest pêkerd zaf grubî vetê meydan. Demê Usmanî de bawermendî kewtî pê û nînan pê ra merdimî kıştî. Hem qatîl hem zî meqtûl bawermendî bî. Nê gruban semedê menfaatê xo hedîsî vatî. Hedîsê ke derheqê şîyan vajîyayê û hedîsê ke derheqê sunîyan vajîyayê no babet ra hesibênê. Hedîsê ke xelîfetiya Alî ra behs kenê; hedîsê ke berzeyê Ebubekr, Umer û Usmanî ra behs kenê no babet ra hesibênê. No mijar de zaf zaf hedîsî estê ke nê hedîsî kitabânê meşhûran mîyan zî kewtê.





**IV. Xeyretê Mezheban:** Mezhebê fiqihî û mezhebê bawerî semedê mezhebê xo zaf hedîsî îhdas kerdê. Nînan ra taynê ci mezhebê xo medh kenê û sewbîna mezheban zem kenê. Qederîya (mutezîle), Murciê, Cebriye, Heneftî, Şafiî, Malikî, Henbelî û sewbîna mezheban sero hedîsê mewzûyî vajîyayê. Eke merdim bi çimanê quranîya biewno nînan ro se mijar hema xo dest dano. Çünke nê hedîsî zûriyeya xo dûrî ra eşkera kenê.

Sey numuneya kes eşkeno vajo ke:

“Mabênê umeta mi ra bi nameyê lajê Îdrîsî Muhemed cû merdimêk do bivijyo. No merdim umeta mi rê şeytanî xirabêrî yo. Mabênê umeta mi ra bi nameyê lajê Sabitî Numan cû merdimêk do bivijyo. Êdî o roşneyeya umeta min o.”

**V. Tesîrê hestê milî:** her qewm qayila ke berzeya xo îspat kero. O semed ra Ereban, Tirkan, Farisan û sewbîna miletan berzeya xo hurdiyeya sewbîna miletan bi hedîsa îspatkerê cû hedîsê mewzûyî vatê. Labelê no mijar de qistas Homa tealayî kitabê xo de ronayo: “Qatê Homayî de tewr rûmetinê şima, oyo ke xo tewr baş parêznenno o yo.” Îslamî çî wext ke welatê neweyî fethkerdê, hedîsê panayeyî zî zeydiyayê. Çünke her qewm, şar û eşîr qayilbîya ke pêxamber heqê ci de çiyêk baş vajo. Hedîsê qewmêk, sukêk û mintiqayêk medh kenê ya zem kenê zafanê zûriyê. Meke û Medîne ney ra teber o. Çünke nê herdi sukî Homayî bimbarek kerdê.

**VI. Dînî rê xizmet:** Sebeban mîyan ra tewr balkêşê ci no yo. Çünke nê zûrkerî, zûriyanê xo ra sewab pawenê. Hem binameyê pêxamberîya zûrî kenê hem zî qayilê ke Homa seba nê zûriyanê ci, înan dekeron cenet. Kar û gurweyanê rindan rê teşwîq, xirabey ra dûrî vînayene cû hedîs îhdas kenê. Goreyê nê zûrkeran, êyê karêke baş kenê, Homa zî na keda nînan betal nêvejeno.

Nê merdiman goreyê xeyalana xo hedîs vato. Winî ke ge-ge karêko zaf taynî rê cenet, ge-ge zî xirabeya zaf hurdi rê cehenem mizgîn kerdo. Nê hedîsan ra tewr numunuyê meşhûrî, hedîsê

ke “Kam filanca sûre biwano, filanca wext de biwano, hendayê heb biwano...” kes eşkeno bihûmarno

**VII. Menfaato Şexsî:** Tayn muhedîsan yan mal, mulk, nam xo dest finê yan tesîrê siyasîyan ra hedîsê mewzûyî îhdas kerdê. Nê merdiman goreyê waştene merdimanê dewlemendan, şahan, mîran hedîsî vatê. Bado zî bahayê keda xo girewtê.

Nînan ra tayn numeney:

- Balcan her derdî rê darû ya.
- Beye qelbî pakkena.
- Lajê yew muhedîsî mamosteyê xo ra

kotek weno. Muhedîs heyfa xo bigîro cû hedîsêk vano: “Tewr xirabê umeta mi mamoste yê.”

No mijar de numuneyo tewr balkêş no yo:

“Lajê Henbelî Ehmed vano ke:

- Ez rojêk şîya sukêk. Mi dî ke însanî vanê ‘Lajê Henbelî Ehmed ameyo û oyo mescîd de hedîs vajo.’ Labelê ameyena mi ra xebera kesî çinê bî. Mi zî zaf meraq kerd. Ez zî şîya mescîd ke Lajê Henbelî goştareyî bikera.

Mi dî ke yew merdim werişt û şî mînber de ronîşt. Bi zurana zaf hedîsî rîwayet kerdî. Ver bi nê hedîsanê xo zaf mal girewt.

Çaxo ke mînber ra ame war, ez şîya hete ci û mi va:

- Ez Lajê Henbelî şinasnena. O, ti nîyê.


Ê merdimî va:

- Ma qey Lajê Henbelî yew tena yo?”

Ewtîya ra fehm beno ke însanan seba menfaati zaf hedîsî îhdas kerdê. Xususen semedê mal, mulk û namdareyî çimê însanan kor kerdê.

Warê hedîsî zaf warêke zor û zehmet o. Çünke no war de raşt û zûrî kewto têmîyan. Qandê cû çaxo ke hedîs sey delîliya girewyêna se hewceyo ke tetkîkê ci zaf baş virajîyo. Alimanê hedîsan zaf cayan de mijarê ke qet eleqa ci çino sey şertê bawerîya qebûl kerdê. Demê ma de newe ra usûlê hedîse saz bibo.

*Mijar do derwam kero*



# RAMAN Û BINGEHÊN SEKULARÎZMÊ-II

DR. EBDULKERÎMÊ SURÛŞ

WERGER: DR. LEZGÎNÊ ÇALÎ

TÎPGUHÊZÎ: UMÎD DEMÎRHAN

Destjêberdana wê nihêrîna felsefî mahiyetger (anku ya li dû mahiyetan digeriya) ji bo cîhana xweriskî û wergirtina nihêrîneka zanistî ya nû û razîbûna bi vedîtina qanûnên wesa ku bêne rast-vekirin, pêngaveka bilind bû ku pêyên mirovî ge-handin çaxê nû. Dema ku ev guhartina nihêrîne di warê xwerisknasyê da peyda bû, hêdî hêdî serbarek û dûvelangên wê di warê siyasetê û civakî jî da diyar bûn. Bîrastî jî mahiyetnasiya mirovên berê di gel siyasetweriya wan digunciya û li hev dihatin. Ev du babet hevseng û girêdayî hevdu û kamilandkerên hev du bûn; lewma çenedibû

ku zanistê xweriskî û çawayiya nihêrîna li cîhana xweriskî hatiba guhartin û zanistê civakî û çawayiya nihêrîna li cîhana mirovî nehatiba guhartin. Her çende ku ev guhartina duyê derengtir hat, lê bi her halê hebit, ew jî belav bû û mirovan her bi wê bînahî û wêrekiya ku dest di xweriskê wêrdida, dest bi destêwêrdana di siyasetê da kir û her bi wê nihêrîna zanistî û awazmend û aqilmendanî û objebîn (objektîv) li civakê nihêrî. Çawa ku di zanistê da êdî li pey vedîtina qanûnên hemî cîhanên beraqil yê mumkin nebû (berovajî metafizyayê) di siyasetê da jî li reelpolîtîk anku

siyaseta heyî geriyane siyaseta hemî civakên beraqil yê nû mumkin. Mijûlî vedîtina exlaq û qanûnên siyaseta heyî bû (Makyavellî û yê nû piştî wî) û ev destpêka sekularîzmê bû. Bi nihêrîneke zanînzaniyê (epîstemolojîk) dibê bihêr gotin ku qonaxa berî sekularîzmê qonaxek e ku hêştaya hizir û zanîna metafîzyayê di cîhana siyasetê, aboriyê û civakê da desthilatdar e û mirovî hêştaya wêrekiya destêwerdana di cîhana siyasetê û civakî di xwe da nedîtîye. Ji bo wî hêştaya civak û siyaset bi duristî nehatine vedîtin û niyasîn. Hêştaya ew xweser nebûne *"mahiyetên"* wan nehatine pênasê û diyarkirin; û ji ber vê nezelaliya di warê niyasînê nikarin li wan nêzîk bibin û dest tê werbidin. Tenê wan bi kar diînin. Û di navbera siwarbûna li tiştê û çêkirina wî tiştî da gelek cudatî heye. Mirovan berê mifa ji paşatiyê didît, da bibêji qey paşatî hespek bû afirandî û zînkirî ji bo lêsuwarbûn û hajojinê. Wan bi xwe bargînek nedafirand ku bihajan. Em ji bir nekî ku mirov mirovê berxwerî û mifagirtinê bû ne mirovê destêwerdanê. Û bi ser vê ra jî, civak hêştaya tiştê *"xweriskî"* û Xwedê-dayî û muqeder bû. Dema tiştê xweriskî ba, êdî nedikarî dest li pêkhata wê daba.

Nitilandin (dîzaynkirin) û endazyariya civakî tiştê dîr ji hişê mirovan bû. Û tenê wêrekiya di warê kelaştina xweriskê û pîşesazî û teknikweriyê da bû, ku di her du warên xwerisk û civakî da, hizra qesrî bi ser tebê exist û bi vî awayî têgehîştina zanistî ya civakî û paşî jî rêvebirina zanistî ya civakî ji dayîk bû. Serkeftina mirovî di hevsarkirina qada xweriskê û hêza wî di vedîtina nihênî yê wê da û şîyanên afirandina destkiriyên nû û guhartina demê cîhana xweriskê wêrekiyek da mirovî, ku di warê siyasetê da jî destêwerdanên tore û exlaqê zanist û hêzê, exlaqê nû va kir (Min ev babet bi berfirehî di gotara *"Me'îşet û Fezîlet"* da inaye. Li kovara Kîyan, hejmar 25, Xurdam û Tîrmeha 1374ê binihêrin). Bi kurtî, civak û exlaq û siyaset, hemî bûn afirandî destkiriyên mirovî û çî tiştê nema ku mirov bi awayekî pêşwext-amadekirî û destlênedayî û bê-lênihêrin bipejirînit. Di cîhana evro da ne tenê radyo û

kompiyûter û firokeyên wê afirandî yê nû destê mirovan, exlaq, siyaset û aydiyolojî jî afirandiyên mirovan in. Êdî tiştê *"xweriskî"* û Xwedê-dayî nemaye. Tenê *"rastî"* anku heqîqet mabû, ku li gorî post-modernan ne pêdivî ye ku em bigehîn rastiyê, em bi xwe rastî û heqîqetê jî diafirînin. Rast e ku hindê aborîzanên nû yê nûna Adam Smith digot ku civak dibê xweriskî bimînit û hukimet dibê kêmtirîn destêwerdanan di aboriyê da biket *"da destên nedîtî"* xwe bi xwe sûkê (bazarê) hevseng bikin. Lê ev ne dijberî rêvebirina zanistî û ne jî dijberî zanistîdîtina aboriyê bû. Ramana vê raznak û pir ji nihênîbûna sûkê nebû; lê (eger weha jî bit) hema durist bi ramana têgehîştina nihênîya sûkê bû.. Anku kesên ku baweriya van bi vê bîrdoz anku teoriyê hebû bizav dikir nişaya bidin ka nîrx û qîmet çawa hevseng dibin û giranî yan xela çêdibin. Hukimetên sosyalistî yê nû ku çerxa sûkê bi awayekê di didît jî, û ji ber wê jî destê hukimetê di destêwerdanan da vegeştîr dixwest, metafîzyayê nedifikirin. Cudatiya di navbera wan her du nihêrinan da, cudatiya di navbera du bîrdozên zanistî derheqa civakê da bû. Ne ew bû ku êk ji wan felsefî-metafîzyayî bit û ya di ne metafîzyayî. Ev du bîrdoz, -cudaya ji wê ka dirust in yan şaş (tewş)- zanistî ne û zanistî bûn. Bi kurtî berhevtirbûna jiyarê û berhevtirbûna destêwerdanên mirovan di cîhanê da li goreyê berhevtirbûna zanîna wan e; û ev tişt e ku bi aşkerayî di dîroka mirovan da qewimiye.

Anku tiştê qewimî zanîna zêdetir û ji ber wê jî şîyan û nihênîbîniyên zêdetir di warê xweriskê, civakê û aboriyê da bûye; û eger em meşa zanistî bi giştî meşeka ber bi kamilaniyê bibînin (ku girîmaneyeka neberaqil nîn e) û eger hemî rastiyên jî hevsî û cîranên hev û di êk rast û sêreyê da bibînin (her hosa ye jî) û eger mirovî di vedîtina rastiyên da serkeftî bibînin (ku dîsa girîmaneyeka neberaqil nîn e) hinkê dibê wesa bihesibînin ku meşa zanîna û têgehîştina mirovî bi giştî ber bi qenciya mirovahiyê û berhevtirkirina biyaya têgehîştineka baştir ya naveroka rastîna û durist ya wehyê bûye. Hizirîna bi awayekê zanistî

û rêvebirina bi şêwazekê zanistî her vê dixwazit.

Dibê em çî tiştêkê derveyê çima û çawan û rexne û çavdêriyan li beranber û bersîngê zanistî danenîn û jî rêveberan û murîdan karekê korkoranî û neaqilanî nexwazîn. Ji ber vê ye ku hukimeta sekular tenê pênaseya neyînî û selbî ya "neyînî" bi xwe ve hilnagirî; lê pênaseya erênî û îcabî ya rexnegirtin û çavdêriyê jî di gel heye. **Lewma mirov dikarit sekularîzmê bi vî rengî jî rave biket, ku di warê siyasetê da êdî çî biha û fermaneka nerexnebar nîne; anku toreyek û pêgehek û menseb û binemayek nîne, ku li serveyî çavdêriya tevane bit. Ji kesê hukimdar bigire heta şêwazê hukimdarî û siyasetdananê. Sekularîzm bi vê ramanê ye û bi awayekê xweriskî, dema siyaset nepîroz û nemuqedes (anku zanistî) dibit û ayîn pîroz dimînit, ew her du jî hev du dihên veqetandin û cudabûna ayîn jî siyasetê di sekularîzmê da bi vê ramanê û jî ber vê sedemê ye.** Hema durist mîna cudatiya zanistî jî ayînî (ne dujminiya zanistî û ayînî). Ayîn ne zanist bi xwe ye, ne afirînerê wî, ne dadwerê wî, ne diyarkerê şêwazê wî ye, û ne jî ber bi armanca wî ve diçit. Lê dîsa jî dijberê wî nîne û her tiştêkê rengê zanistî bi xwe ve bigirît jî (ji wan jî hukimet û rêvebirina welatekî jî) havilêka hosa digel ayînî peyda dikit, û her bi qasî ku mumkin e zanistê ayînî (wekî termoayînamîka ayînî yan endazevaniya ayînî) hebin, bi wî qasî jî mirov dikarit behsa hebûna hukimeta ayînî (anku rêvebirina zanistî yan ayînî) bikit. Di rastiyê da, ayînikirina siyasetê tenê wî çaxî mumkin dibit ku têgehiştineka nepîroz jî ayînî têkelî şêwazê zanistî yê rêvebiriye bikîn. Eger ne wesa bit, têkelkirina ayînê pîroz digel siyaseta nepîroz ya zanistî sereda bin çêlê ye. Di bîrdoza "gîştûn û vebûn"ê da ew zewac û nîkaha pîroz bi awayê herî xweriskî mumkin dibit, eger ne, çênabit.

**Ji bo têgehiştina baştirya sedemên belavbûn û dilxwazbûna sekularîzmê dîroka civakên qonaxa berî sekularîzmê nabit bihêt jibîrkin. Rastî ew e ku girîngtirîn bizavên dijî-ayînî û dijî-dêrî (dijî kelisayê) li dema niha jî ber**

şêwazê karkirina dêrê bûye. Çî kesekî rikeberî û rikmanî digel Xwedê nekiriye. Eger dujminahiye hebû û dujminahiya digel wan kesan bû ku bi navê Xwedê hukim dikir û ew encamên kirêt li rojavayê afirandin. gelekî ku bi rijdî tehliya wan sitemkarî û zordestiyan çêşt bû û dîtîbû; û hema ayîndarên ku tehliya wan durûyî û xerabkariyan dîtîbû, dijberî wan şêwazan ser hilda û bi sekularîzmê razî bûn [Rehmetî Muteherî li ser vî babetî weha dinivîsit: "Ayîne ku dibiya sedem û peyangehinê dilovaniyê ba, li Ewropayê welê hat ku me dît. Ayîn û Xwedê û mezheb di hizra her kesekî da bibû tund û tûjî û tepeserkirin û zordestî, ku ku karvedana xelkê li beranberî şêwazekê weha tenê dê mandelkirina ayînî jî binî ra û mandelkirina binaxeyê destpêkî yê ayînî, anku Xwedê, ba. Her dem û gavêka ku serkêşên ayînî yên xelkê -ku xelk bi her halê hebit wan nîmînde û nûnerên ayînî dibînin- kevîlê pilingî li xwe bikin û didanên pilingan nîsa bidin û dest bidin kafirkirin û fasiqkirinê; nemaze dema ku meremên kesanî bi vî rengî bin, hingî mezintirîn derbe di berjewendiya maddîgeriyê da dê bi laşê ayînî bikevin." (Koma Berheman 1, bergê êkê jî pişka Binaxeyên Baweriyê, weşanxaneya Sedrayê, berperê 491)]. Li qonaxa berî sekularîzmê, ayîn piştewana siyasetê bû; anku meşrû'iyet û rewayî dida û jêder û serûkaniya qanûn û fermanên hukimetê bû. Lê hindêk jî tijbînan nedikarî lihevnehatin û hevkujî û mirovsojî, xwedêyîkirin û nerewayiyên ku bi vê muhaneyê dihatin kirin da biêwirin û bipejîrin. **Wan jî xwe dipirsî ku çawa mirov dikarit bi beşerbûn û mirovbûna xwe hukimeteka xwedêyî (ango serveyî çima û çawan û serveyî pirsiyaran) bikit? Hukimeta mirovan mirovî ye û çî tiştêkê wê nikarit xwedêyî bit. Her tiştê di navbera me mirovan da biqewimit, çî bi navê Xwedê bit yan bi her navekê dî, dibê mirovî û mirovani bit, dibê şiyana wê hebit ku bikevit bin çavdêriya zanistî û li dûvçûnên hûr yên aqilî. Di qada civak û siyasetê da, çî tiştêkê neaqilanî yan serveyî aqilî nîn e ku pişka mirovan di rasta wê da tenê temaşevanî û beremrî**

û guhdarî bit. Her tiştê bihêt nav xweriskê dibit xweriskî, anku toza xweriskê li ser dinihit, û her tiştê bihêt nav civaka mirovî dibit civakî û mirovî. Anku di qada xweriskê û civaka mirovan da tiştêkê jorxweriskî (mawerau tebî'î, berjortir ji xweriskê) û jorcivakî (der ji civakê) nîn e. Xwe ruha jorxweriskê jî, dema dikevit nav mala xweriskê, kincên laşî û cismiyetê li xwe dikit. Xweriskî dîtina xweriskê û mirovî dîtina tiştên civakî û mirovanî alavên arîkar ji bo rastvekirina wan şaşiyên mirovsoj bûn. Bi her hal, eger nihêrîna zanistî di qada xweriskê da dijberî hizrên ayînî îlahî bit, nihêrîna zanistî di qada siyasetê da jî digel xwedêxwaziyê nahêt. Lê rastî ew e ku mirov dikarit xwe ayînniyas û ayîndar bit û her di wê demê da xudanê rêveberiyeka zanistî jî bit. Kesên ku zanistê nû îlhadi û bêxwedê dibînin, yan bi hizar muhaneyan hurmet û heybeta wî dişkinin û hema di binî re tiştêkî ji wan rastiyên ku zanistî vedîtine nizanin, mirovên xavhizir û nezan in. Dema dihêt gotin, ku li cîhana nû hêdî hêdî bêayîni zêde dibit, ramana vê gotinê bi rengekî rast e û bi rengekî çewt. Bi vê ramanê rast e ku di cîhana nû da ayîndariya reş û rûtan û 'amê di bin gefan da ye û hêdî hêdî ber bi nemanê diçit. Lê beranberî wî, cureyekî ayîndariya zanayanî û lêkolînavanî, li astekê bilindtir, peyda dibit û cih digirît. Di qada siyaset û civakê da jî, dema behsa destêwerdanên zanayanî û rêvebirina zanistî dihêt kirin, hindê kes kevtin vê xeyalê, ku di civakê da bêayîniyê ser hildaye. Ev guman û xeyal rengekî durist e. Ji ber ku bi hatina rêvebirina zanistî û hema bi pejirandina nihêrîna aqilmend û mirovanî bo civakê û siyasetê, ew desthilathebîniya ku binaxeyê wê li ser ayîndariyên 'amê û xelkê reş û rût û hukimetgerên xwedêyanî bû êdî namînit. Lê mirovên jîr û hişmend dizanin ku raznehêlana zanistî di qada siyaset û aboriyê da çî dijîtiyek digel wê nîn e, ku ji bo Xwedê û ayîne jî di qada siyaset û civak û xweriskê da cihek hebit. Rohnkirina vî cihî û vê haviliyê, kar û erkê lêkolînavanên vê serdemê ye. Û tiştê ji hemiyar biçûktir ku mirov dikarit di

vî warî da bibêjit ew e ku hukimetê pênaseyeka diyarkirî heye û di vê pênaseyê da ayînbûn yan sekularbûn nehatiye. Lê li derve û di ketwarê da, hukimet dûvelanga civakê û êk ji kar û barên wê ye. Eger civak ayîni bit, hukimet jî dê rengê ayîni bi xwe ve bigirît, û eger ne, ne. Ev raman paşî dê zêdetir bihêt rohnkirin.

4. Diyarok û diyardeya duyê ku arîkariya peydabûn û belavbûna sekularîzmê kir guhartinek bû, ku di haviliya di navbera maf û erkan (heq û teklîfan) da di cîhana nû da çêbû. Li cîhana nû axiftina li ser "mafên mirovî" xweş û dilxwaz e, ji ber ku em li zemanekî dijîn ku mirov zêdetir ji wê ku dixwazin di erk û teklîfên xwe bigehin û wan vebiniyasîn, di xema wî da ne ku mafên xwe bibînin û biniyasîn. Babetê mafên mirovî li dema me gelek zêde bi rûmet û jêhatî bûye, û ji bil mifayên nerewa yê ku di siyasetê da li cîhanê jî wê dihên dîtin, babet bi xwe jî aliyê ramanê û exlaqî ve hejî pûtepêkirin û meyizandinê ye. Di polandineka giştî da, mirov dikarit dîroka mirovî bikit du qonaxên kevneşopî (teqlîdî) û nûjen (modern). Berî niha me bi kurtî behsa hindêk ji taybetmendiyên nemazeyî yê van du qonaxan kir. Li vê derê em dikarin taybetmendiyeka di jî li ser wan zêde bikîn ku gelek rohnker e, ew jî babetê "maf" û "erk"î ye. Mirovê berê yan yê berî moderniyê "mirovê erkdar" anku "mukellef" bû û li beranberî wî, mirovê nû "mirovê mafdar" anku muhiqqe. Ji bo wê ku ev pejî û raman rohntir bibit, tenê têra dikit ku li zimanê ayîni temaşe bikîn.

- Merema ji zimanê ayîni ew babet in ku ayîni ji bo muxateb e û mufahem e anku axiftina digel xelkê û têgehîştinê hildibijêrit.
- Ev babete kesatiyekê didin wî zimanî ku ji bo mînak wî ji zimanê zanistî yan felsefî yan edebî cuda dikit.
- Zimanê ayîni (nemaze zimanê Îslamî), her wekî di Quran û rîwayetan de diyar dibit, zêdetir ji wê zimanê mafî bit zimanê erkî ye.
- Anku di van deq û têkstan da ji pêgeh û zardevê Xudanekê bi şîyan ku hemî tişt di

destê wî da ne fermanên kirin û nekirinê (emr û nehyî) li mirovan dihên kirin, û ayînbarer û ayîndar dibê her gav li erkên xwe miqate bin.

- Lîsanê şer'î lîsanê teklîfî ye. Ji ber ku wêneyê mirovî di ayînê da wêneyê bûnewerekê erkar e.
- Di ayînê da ji mirovî hatiye xwestin ku îmanê bînit, nivêjê biket, zikatê bidet û di karê nîkahê, mîratê, yan di haviliyên di yên mirovaniyê da, bi awayekê nemazeyî reftarê biket û piyên xwe ji tixûbekî wêvetir nehavêt.


- Her gav diînî bîra wî ku ji hudûdullah anku tixûbên Xwedê neburit, eger ne, dê lêpîrsîn û sezadan hebit.
- Helbet di deqên ayînî da behsa mafên mirovan jî dihêt kirin, lê gotinên hosa li çav gotinên erkan gelek vawartû û hindik in.

Ji bo mînak, di Quranê de hatiye:

مَنْ قُتِلَ مَظْلُومًا، فَقَدْ جَعَلْنَا لَوْلِيَّهِ سُلْطَانًا؛ فَلَا يُسْرِفُ فِي الْقَتْلِ؛ إِنَّهُ كَانَ مَنصُورًا\* (الإسراء ٣٣)

## Gotinên Seîdê Kurdî

Xêz û werger: Sevim Uluç



1. Ez dikarim bê nan bijim  
lê bê azadî nikarim.
2. Armanca me lawerê û axret e.
3. Bîta her gotina te rast be lê her rastî  
li her derê nayê gotin.
4. Mijâlbaşana bi tiştên nebaş jî ne baş e.
5. Yê ku xweş dinêre, xweş difikire û yê ku  
xweş difikire tehmê ji jiyana xwe distîne.
6. Yên ku dixwazin di maddeyekê de her tiştî  
bibînin, kesên hişê wan di çavê wan de ye.  
Çav jî di manewiyatê de kor e.
7. Hest û hewes kor e, pêşerojê nabîne.
8. Her gava ku dem dibihure,  
Quran jî ciwan dibe.
9. Di her qunehê de rêyeke ku diçe  
kufrê heye.
10. Me'neya nimêjê; tesbîh, tazîm  
û şukra Xwedê ye.

# Tiştên qenc û tiştên xerab

Ji MUNEBBÎHATA: ÎBNUL HECERÊ ESQELANÎ

Ji ÊREBÎ: M. EMÎNÊ BOTIKÎ

**J**i Pêxember (s) hatiye rîwayetkîrin wiha dibêje: “Du tişt hene ji wan çêtir tiştekan tune. Ev jî: Ba-  
meriya bi Xwedê û bikêrhatina ji Misilmanan re ye. Du tişt jî hene ji wan nebaştir tiştekan tune. Ew jî şirikçêkirina ji Xwedê re û zerardana Misilmanan e.” (Sahibu’l- Firdews: Îhyau’l-Ulûmidîn ya Êrebî. Bi peyvên cuda. 6/31)

Dîsa Pêxember (s) wiha dibêje: “Bi zanayan re rûnîn û guh bidin axaftinên hukemayan. Lewra Xwedê teala çawa ku erdê bi baranê sax dike, dilê mirî jî bi ronahiya hikmetê sax dike.” (Taberanî: Mu’cemu’l-Kebîr 7810. Nesîhu’l-îbad: rûpel:22)

Ji Ebûbekirê Siddîq (r) hatiye rîwayetkîrin: “Kesê ku bêqût bikeve qebrê, herwekî wî kesê ku bêgemî dikeve behrê.”

Ji Hz. Umer (r) hatiye rîwayetkîrin: “Ezîzbûna dinyayê bi mal e, ezîzbûna axretê jî bi emelê (karê) qenc e.”

Ji Osman (r) hatiye rîwayetkîrin: “Muhîmdîtina dinyayê dil tarî dike, muhîmdîtina axretê dil ronî dike.”

Ji Îmamê Elî (r) hatiye rîwayetkîrin: “Çi kesê li zanîne (ilmê) bigere, wê bihişt jî lê bigere. Çi kesê li gunehan bigere dê dojeh jî lê bigere.”

Ji Yehyayê kurê Muaz (r) hatiye rîwayetkîrin: “Mirovê qenc bêemriya Xwedê nake.

Mirovê hekîm jî dinyayê jî axretê çêtir nabîne.”

Ji E’meş (r) hatiye rîwayetkîrin: “Çi kesê ku sermiyanê malê wî teqwatiya Xwedê be, wê ziman jî pesindana dîne wî westandî bimîne. Çi kesê ku sermiyanê malê wî dinya be, wê ziman jî gotina zerardîtina dîne wî westandî bimînin.”

Ji Sufyanê Sewrî hatiye rîwayetkîrin: “Çi gunehên ku jî şehwetê çêdibin, beşişandina wan tê hêvîkîrin. Çi gunehên ku jî quretiyê çêdibin beşişandina wan nayê hêvîkîrin. Lewra gunehê Îblîs jî quretiyê çêbûbû, lêbelê şemitîna Adem jî şehwetê çêbûbû.”

Ji hinek kesên zahid hatiye

rîwayetkirin: “Çi kesê ku dema guneh bike bikene, wê Xwedê wî bike dojhê û wê bigirî. Çi kesê ku îtaeta Xwedê bike û bigirî, wê Xwedê wî bike bihiştê û wê bikene.”

Ji hinek hukemayan hatiye rîwayetkirin: “Gunehên biçûk, biçûk nebîne, lewra ji wan gunehên mezin çêdibin.”

Ji Pêxember (s) wiha hatiye rîwayetkirin: “Gunehên biçûk bi domkirina li ser wan, ji biçûkbûnê derdikevin. Gunehên mezin ji bi poşmaniyê ji mezinbûnê derdikevin.” (Deylemî: Musnedu'l-Firdews.7994)

Hatiye gotin ku: “Derdê kesê Xwedênas, pesindana Xwedê ye. Derdê zahidan ji duakirina ji Xwedê ye. Lewra derdê Xwedênasan perwerdegerê (rebbê) wan e. Derdê zahidan ji nefsa wan e.”

Ji hinek hukema hatiye rîwayetkirin: “Çi kesê guman bike ku ji Xwedê çêtir dosteki wî heye, wî Xwedê rind nas nekiriye. Çi kesê ku guman bike ku dijminekî ji nefsa wî dijwartir heye, wî nefsa xwe hindik nas kiriye.”

Ji Ebûbekirê Siddîq (r) hatiye rîwayetkirin ku: “Di şîrovekirina ayeta “Di erd û deryayê de fesadî çêbûye” Hz. Ebûbekir gotiye ku: “Erd ziman e, derya ji dil e. Dema ku ziman xera bibe, tevayê nefsan li ser digirîn. Dema ku dil xera

bibe, firîşte (melayiket) li ser digirîn.”

Hatiye gotin: “Şehwet, pa-dişahan dike evd, sebr ji evdan dike padîşah. Ma tu nanêrî li qisseta Yûsuf û Zuleyxa?”

Hatiye gotin: “Mizgînî ji wî kesî re be ku eqlê wî rêvebirê wî be û nefsa wî esîrê wî be. Weyl (dojeh) ji wî kesî re be ku nefsa wî rêvebirê wî be û eqlê wî esîrê wî be.”

Hatiye gotin: “Kesê ku gunehan neke, wê dilê wî nerm bibe. Kesê ku heramiyê biterikîne û helal bixwe wê fikra wî zelal bibe.”

Xwedê ji hinek pêxemberan re wehiy şandiye: “Di tiştên ku min ji te re ferman kiriye de gotina min bîne cih. Di şîretên ku min li te kirine de bêemriya min neke.”

Hatiye gotin: “Eqil, bi te-bayiya razîbûna Xwedê û xwe-parastina ji xezeba wî tamam dibe.”

Hatiye gotin: “Ji kesê qenc re biyanîti tuneye, ji kesê nezan re ji welat tuneye.”

Hatiye gotin: “Çi kesê ku bi taetên xwe nêzî Xwedê be, wê di nav mirovan de biyanî bimîne”.

Hatiye gotin: “Çawa ku lebitandina laş nîşana jiyane ye, lebitîna taetê ji nîşana naskirina Xwedê ye.”

Pêxember (s) wiha gotiye: “Bingeha gişê gunehan hezki-

rîna dinyayê ye, bingeha gişê fitnan ji, nedayina zekat û dehyeka zadan e.” (Çavkaniya vê hedîsê nehat tesbîtkirin).

Hatiye gotin: “Kesê ku her demê kêmasiyên xwe qebûl bike dê were pesinandin, lewra îqrarkirina kêmasiyan nîşana qebûlkirinê ye.”

Helbestevanek wiha dibêje:

Ya ew kesê ku bi دنیا xwe mijûl dibe

Daxwazên dirêj wî dixapînin

Ma tu yê tim di xefletê de bi?

Heta ku mirin nêz bibe

Mirin ji nişkan ve tê

Gor ji sindoqa kardariyê ye

Li ser nexweşiyên sebir bike

Lewra heta ecelê tamam nebe, mirin nayê.

Ebûbekirê Şiblî (r) ji mezinên Xwedênasan e. Wiha dibêje: “Ey Xwedayê min! Di gel xizani û zeyîbûna min, ez dixwazim ku gişê qenciyên xwe ji te re yadigar bikim. Ey mewlayê min! Digel ku tu dewlemend î, çawa tu hez nakî ku gunehên min bibexşîni?”

Ebûbekirê Şiblî dîsa wiha dibêje: “Dema tu bixwazî ku sebra xwe bi Xwedê bîne, xwe ji nefsa xwe dûr bike. Heger hûn şîrînbûna nêzîkbûna hevûdî tehm bikin, hûn dê tehlbûna jihevdukbûnê nas bikin.”



# Hilo Rabe Ebulqasim

## Melayê Bateyî

Hilo rabe Ebulqasim hilo ey qasidê ekber  
Hilo fexra Benîhaşim hilo rabe tu yî rehber

Hilo ey seyide alem hilo ey mefexerê Adem  
Ji rewdê rabibî xatem ji nav wê merqeda enwer

Ji nav wê merqeda nûrîn hilo "Taha" hilo "Yasîn"  
Ji dûrî sotin em miskîn hilo mehderçiyê mehşer

Hilo carek di hînê da ku da nûr çêt di hînâ da  
Heta kengî d'Medîne da niqab pûşî niqab li ser

Niqab û perdeya bavê li mehcûran dem û gavê  
Ji zehmet lê bikit avê şefa'et kî ji bo mehder

Tu yî xahe şefa'atê siviksazê munacatê  
Hilo nûra hîdayatê îmage mescid û mînber

Îmamê enbiyan î tu li Qur'an xudan î tu  
Yeşîn em xoş şivan î tu şivanê ummetê yekser

Şivanê eshere gulbav hilo ey nêrgiza têr av  
Xedenga îşweê pur tav bike ez kîsewa 'enber

'Enberîn beynê zulfeynî xudanê qab û qewseyn  
Li ser çavên me ne'lên bi te ey da'îyê serwer

Tu yî da'î hebîb Ellah firaqê sotin em wellah  
Terehhem ya nebiyûllah le mehcûran hilo binker

Hilo carek ji wî xakî siyarê heft eflakî  
Belê sultanê lewlaq î tu yî ey saqiyê kewser

Ela ya eyyuhe's-saqî xudanê 'ehd û mîsaq î  
Hilo siwarê Boraq î here pêş Xaliqê Ekber

Here pêşê Xudayê me rehîm û rehnemayê me  
Şefa'et ke xetayê me li dîwanê bike mehder

Bike mehder li dîwanê di roja heşr û mîzanê  
Efû kin me ji îşyanê nebin şermende ey serwer

Di roja heşrê pir hey hey hezaran pê li se yek pey  
Bi koma ra biya Batey xudanê bexş birew bugzer

# Îman, emel û qurban

MIHEMED JIYAN

**S**ebêbê hatina me ya dinyayê û armanca hebûna me tenê yek tişt e: **Evdîtiya Rebbê Alemê.**

“Min însan û cin xuliqandine da ku tenê îbadeta min bikin” (Zariyat, 56)

Ji vê wêdetir û zêdetir tu wezîfeyên me yên esasî tunene ku em bicih bînin. Xwedê em bi vê armancê xuliqandine û tenê xwestiyê ku em wî wekî Rebb bibînin û haya me ji evdîtiya me hebe.

Lewre mezinatî layiqî şanê wî ye û tekebbur tenê li zatê wî yê ezîm tê. Ji ber ku ew subhan e, quddûs e û semed e. Ew dikare bêyî arîkariyê jî hebe û hebûna xwe bidomîne. Ji bo vê, ne muhtacî tu kesî û tu tiştî ye.

Lê em her demê, her gavê û her lehzeyê muhtacê wî û rehmeta wî ne. Eger ne ji rehmet û qenciya wî ba, me nikaribû yek saniyê ji nefes bistenda û hebûna xwe bidomanda.

Lê ew ji lutf, kerem, înayet û qenciya xwe ya bênihayet

me ji xweşiyên vê alemê behremend dike û dihêle ku em lezetên curbecur ên jiyane biçêjin.

Bes eger wî bixwesta, dikaribû nehêle ku em reş û tama yek ji van tiştan jî bibînin.

Ew Xwedayê me yê mezin di muqabilê van nîmetên xwe yên bêdawî û mezin de tenê evdîtiyê jî me dixwaze. Ew evdîtî jî bi îmaneke sehîh û bi emelekî salih mumkin e.

Îman û emel, du peyvên ji hev cuda ne, lê bêyî hev nabin. Yek bêyî yekê kêr û nivîşkan e. Her yek dikare bi ya din temam bibe.

Îman û emel wekî ruh û bedena însan in. Eger yek tunebe, ya din jî tune. Dema ku beden tunebe ruh bême'ne û dema ku ruh tunebe jî beden bême'ne ye. Îman ruhê bedenê û emel jî bedena ruh e.

Îmana rast û emelê salih di Quranê de her demê bi hev re têne zikirkirin û ehemmiyeta yekê bi ya din tê îfadekirin.



Xwedê teala di Qurana kerîm de bala me dikşîne ser baweriyê û bi wê re jî emelkirina bi wê baweriyê tîne ziman.

“Yên ku îmanê bînin û emelên salih bikin, ji bo wan qesrên cennetê yên ku çem di binê wan re dikîşin hatine amadekirin. Ewê heta hetayê di wan de bimînin. Ew xelat, ji bo kesên karên qenc kirine pir xweş e.” (Enkebût 58)

Herwiha, di sûreyê Esir de jî eynî mesele tê nixrandin û Xwedê dîsa bala me dikşîne ser pevrebûna kiryar û baweriyê.



*Di qurbanê de  
hîkmeta herî esasî  
û muhîm ew e ku;  
însan tiştê li cem  
wî hêja, karibe ji bo  
Rebbê xwe feda bike.  
Me'neya qurbanê ew  
e ku, meriv ji tiştê  
xoşewîst û biqîmet  
dest bikîşîne da bigihê  
razîbûna Xwedê.*

“Sond bi esrê! Muheqeq  
însan di zîyanê de ne. Tenê yên  
ku bawerî anîne, emelên salih  
kirine û şîreta sebir û heqiyê li  
hev kirine ji dervayî van in.”  
(Esir 1-3)

Îmamê Şafî ji bo vî sûreyê  
Quranê wiha dibêje: “Eger  
Xwedê ev sûre tenê wekî wehy  
ji însanan re bişanda û di gel  
wî tiştêkî din neşanda jî, têrî  
însanan dikir ku rêya rast  
bibînin.”

Meriv dikare bêje ku di  
temamê Quranê de bi ev îfade  
û ev terkîb hatiye bikaranîn.

Dema ku behsa emelê salih  
bûye, bawerî ji pê re derbas  
bûye û dema ku behsa baweriyê  
bûye jî emelê salih piştî wê  
hatiye. Lewra di dînê Îslamê  
de îmana bê emel û emelê bê  
îman ne meqbûl e. Îmamê Elî  
di xebardaneke xwe de li ser vê  
meselê wiha dibêje:

“Rastî ev e ku alimê bi xêncî  
’ilmê xwe emel bike wek wî  
nezanê şaş ku ji cehl û nezaniya  
xwe xelas nabe. Belkî hucceta li  
ser wî mezintir e û musteheqtir  
e ji kul û xeman re li bal Xwedê  
jî pirtir lome lê tê kirin.”

Dişa di gotineke xwe ya  
din de li ser ehemmiyeta emel  
disekine û wiha dibêje:

“Mirovno! Ji pêta çiraya wî  
şîretkerê ku bi ya dibêje emel  
dike, ronahiyê bigirin. Avê ji  
wê kaniya ku ava wê zelal e û  
şêlû nebûye vexwin.”

(Îmam Elî)

“Bikevin pey hîdayeta  
pêxemberê xwe çiku bi rastî ew  
baştirîn hîdayet e; û bi sunneta  
wî emel bikin -bikevin pey rêka  
wî- çiku Birastî rêçik û sunneta  
wî serasttirîn rêçik û sunnet e”  
(Îmam Elî)

## Qurban û gorîbûn

Qurban, di dîroka Îslamê de gelekî kevn e. Heta meriv dikare bêje ku bi qasî dîroka mirovahiyê kevn e. Di Îslamê de ku ji Adem eleyhîsselam heta Mûhemmed eleyhîsselam dînê hemû pêxemberan e, qurban xwedî cihekî gelekî taybet e. Di qurbanê de hîkmeta herî esasî û muhîm ew e ku; însan tişta li cem wî hêja, karibe ji bo Rebbê xwe feda bike. Me'neya qurbanê ew e ku, meriv ji tişta xoşewîst û biqîmet dest bixşîne da bigihê razîbûna Xwedê.

Semîmîyet, dilsozî û îxlas bi fedakariyê mumkin e. Kesên ku di rêya Xwedê de ji tiştên li ber dilê xwe ezîz derbas nebin, nabin evdên salih ên Xwedê ji wan razî. Lewra di qisseyaya Habîl û Qabîl de ev mesele bi awayekî vekirî û eşkere li ber çavê me rê raxistin.

Dema ku ji wan tê xwestin diyariyekê ji Rebbê xwe re erz bikin, Habîl tişta li cem xwe herî biqîmet û hêja diyarî dike, lê Qabîl tiştêkî bêqîmet û nehêja wekî diyarî dibe. Li ser vê yekê Xwedê teala diyariya Habîl qebûl dike û ya Qabîl qebûl nake. Lewra Habîl diyariya xwe ji dil û can, lê Qabîl bê dilê xwe dabû. Li ser vê yekê, Xwedê teala semîmîyeta Habîl qebûl kir û riyakariya Qabîl jî redd kir.



Em dikarin bêjin ku qisseyaya Habîl û Qabîl, di heman demê de qisseyaya Îxlasê û Riyakariyê ye jî. Xwedê teala jî hikmetê qurbanê û gorîkirinê di Quranê de bi zîmanekî vekirî û bi peyvên besit ji me re rave dike:

“Bi tu awayî ne goştê qurbanan ne jî xwîna wan digihêje Xwedê. Lê belê teqwadariya we digihêje wî. Herwisa Xwedê ew ji we re amade kirine da ku hûn Xwedê teala mezin bidêrin û yê qencîkar mizgîndar bikin.” (Hec, 37)

Di çand û bîr û baweriyên ji dervayî Îslamê de jî qurban hebû û însanan ji bo pûtên xwe qurban serjêdikirin. Ji bo semîmîyet û dilsoziya xwe ya li ser baweriyaya xwe û li hemberî îlahên xwe diyar bikin ev yek

dikirin. Qurbanên xwe dibirin li ber pûtan serjêdikirin û erzî pûtên xwe dikirin ku ji wan bête qebûlkirin. Ew qurban heta êvarî li wir dima, bi şevê jî wezîfedarên mabedê û îmamên civakê ew ji xwe re dibirin. Dema ku dibû roja din, xelkê dihat dinêrî ku qurbana wan ne li cihê xwe ye. Bi vê yekê bawer dikirin ku qurbana wan hatiye qebûlkirin û dilê wan xweş pê xweş dibû.

Lê di Îslamê de ev hal û rewş tê reddkirin. Xwedê di Quranê de emir li însanan dike ku ji riyakariyê dûr bimînin û bi dilekî safî berê xwe bidin rebbê xwe.

Di qisseyaya Îbrahîm eleyhîsselam de jî heman hîkmet bala me dikşîne. Piştî ku demeke dirêj zarok

ji Îbrahîm eleyhisselam re çênabin, bi diya me Hacerê re dizewice û Xwedê kurekî bi navê Îsmâil didiyê. Îbrahîm ji kurê xwe Îsmâil ew qasî hez dike ku ev hezkirin dibe sebeb ku pê re were îmtihankirin.

Îbrahîm eleyhisselam şevekê di xewna xwe de dibîne ku kurê xwe yê ku nazdarê ber dilê wî û ronîya çavên wî bû, dike qurban. Serê sibehê radibe vê xewnê ji kurê xwe Îsmâil re dibêje û cewabeke ku di tarîxa însaniyete de bûye şîra dilsozî û îxlasê jê digire: “Ey bavê min! Tiştê ku Xwedê li te emir kiriye bîne cih. Bila dilê te rehet be, ezê li ber vê sebirdar bim.” (Saffat, 102)

Lê Xwedê nahêle ku Îsmâil bibe qurban û Îbrahîm jî bibe qatîle kur. Lewra daxwaza Xwedê îxlasa wan bû, ne xwîna wan û ne jî goştê wan... Ji bo vê yekê Cebrail bi beranekî dişîne ku Îbrahîm wî di şûna Îsmâil de şerjêbike.

Lewra qurbanbûn û gorîbûna di rêya heqiyê de û di ber edaletê de însanan dibe pakî û bilindbûna evdîtiyê.

Di qisseyaya Meryema pak de jî tişteki gelekî balkêş heye ku Xwedê teala diqqeta me dikşîne ser.

“Bîne bîra xwe, dema ku jîna Îmran gotibû: ‘Ya Rebbî! Ez, zarokê di zikê xwe de bi îradeya xwe ya azad gorî te dikim. Ji min qebûl bike. Bêguman tu min dibihîzî û tu bi min dizanî.’ Dema ku wextê

wê hat û barê xwe danîn, got: ‘Ya Rebbî! Min barê xwe keç danî.’ Lê Xwedê bi vê yekê baştir dizanibû. ‘Kur ne wekî keçê ye, min navê wê Meryem danî. Min ew jî û nesla wê jî siparte te. Tu wan ji Şeytanê qeşitandî biparêze.’ (Alî Îmran, 35-35)

Diya Meryema pak Hane, berî ku zaroka wê were dinyayê, soz dabû rebbê xwe ku wê nezrî rêya wî bike. Bavê Meryemê jî însanekî qenc û evdekî salih bû. Ji ber vê jî Hane dixwest ku zarokê wê wekî bavê xwe di rêya salihan de be. Ji bo vê yekê jî ew gorî rêya Xwedê kiribû. Lê wê nizanibû ku dê zarokê wê keç be. Wê digot qey wê kurek jê re çêbe. Dema ku keça wê Meryem tê dinyayê jî, vê rewşê jî Rebbê xwe re erz dike û dibêje: ‘Ya Rebbî! Min barê xwe keç danî.’ Lê Xwedê baştir dizanibû ka wê barê xwe çi daniye. Lewra Xwedê her tiştî li dor hîkmetekê û li gor pîvanekî çêdike, teqdîr dike.

Îradeya Xwedê li ser wê yekê bû ku Meryem bê dê û bav mezin bibe û pêxemberê ku dê mohra xwe li tarîxê bixe jî bê bav were dinyayê. Yanî wisa teqdîr kiribû ku ji dapîr û babîrekî salih û jî dêyeke pak, pêxemberekî emirberê rebbê xwe were rabe.

Pêxemberê me cenabê Mûhemmed (silavên Xwedê lê bin) jî, ji bavekî ku di encamê pişkekê de bibû qurban çêbûye.

Lewra kalikê wî Ebdulmutilib qewl kiribû ku eger Xwedê deh kuran bidiyê, dê yekî ji wan jî bo Ke’beyê bike qurban.

Dema ku Xwedê deh kuran didiyê, dixwaze ku qewlê xwe bîne cih. Ji bo vê yekê li ser deh kurên xwe pişkê davêje. Pişk li Ebdullah dikeve. Lê piştî xelkê Qureyşê dikeve navê û nahêlin ku Ebdullah bibe qurban. Di şûna wî de deh deveyan şerjêdikin û li xelkê belav dikin.

Ev adeta qurbanê, wekî nîşan û sembola îxlas û semimiyetê di nav hemî qewman de û di hemû bîr û baweriyên de heye. Lê bi şêkl û naveroka herî rast cihê xwe di Îslamê de dîtiye. Lewra di Îslamê de tiştê eses niyet e, ne şêkl û şemal. Xwedê, ji bo bibe rehmet, bereket û xweşî ji wan biherike, ev demên mubarek ji bo însanan tayin kirine. Emelekî wekî qurbanê, li heciyên di vê dema mubarek de li ser girê Erefatê ferz kiriye û xwestiye ku însan xwe bi dilê herî saf berê xwe bidin heqîqeta xulqiyetê. Xwedê dixwaze ku evdên wî bi safî û pakiya Îbrahîm û Îsmâil dua bikin û bêjin:

“رَبَّنَا تَقَبَّلْ مِنَّا إِنَّكَ أَنْتَ السَّمِيعُ الْعَلِيمُ”

“Ya Rebbî! Tu ji me qebûl bike. Muheqeq tu me dibihîzî û tu zana yî.” (Beqere, 129)

# Yara Kê yî Tu?

Macin

Sorgula xonçe dehen nazik nîhala kê yî tu  
Mehweşa gulpîrehen şox û şepala kê yî tu  
Gulruxa sîmen zeqin fikr û xiyala kê yî tu  
Ahûya Deştâ Xeten mişkên xezala kê yî tu  
Nazika sîma semen qenc û delala kê yî tu

Ew çi dêm e ew çi rû ne ew çi zulf e ew çi xal  
Ew çi gulbaxê gulan e ew çi husn e bê mîsal  
Ew çi ebrû ne çi qews in ew çi "nûn" in reng hîlal  
Ew çi mujgan in çi tîr in ew çi elmas in bi qal  
Qatilê xûnrêz û xûnxur pur qîtala kê yî tu

Ew çi badam in siyah in ew çi çav in xemzerîz  
Ew çi rîhanên di şeng in ew çi zulf in mişkebîz  
Ew çi Hindû ne siyah dil ew çi xal in fitne xîz  
Ew çi lêv in ruhî perwer ew çi 'unab in ezîz  
Leb xemûş î badenûş î laûbala kê yî tu

Ew çi bejn e ew çi qamet ew çi qedd e dil ruba  
Ew çi exbar in te can de ew çi durr in pur buha  
Ew çi narînc û turunc in ew çi sêv in sîneca  
Ew çi mehtab in binagûş ew çi subh e nûrfeza  
Rohniya şama firaqe şem' û mala kê yî tu

Hûr û eyn î xemrevîn ê dil teşîn î dil firîb  
Bê qusûr î hem çi hûrî nûra Tûr î pur 'ecîb  
Îşvvesaz î serfiraz î dilnewaz î dilşekîb  
Şahlewend î leb ji qend î çeşmî bend î pur xerîb  
Sînesoj î dilfiroj î meh cemala kê yî tu

Ew çi 'ac e rengzucac e ew çi nûrîn gerden e  
Ew çi durca le'î kûn e can rewan tê mesken e  
Ew çi destên rengxenayî riştina xûna min e  
Şubhê te mehbûb û xûb ma qed di dunyaye hene?  
Cebhe roj î qelbî soj î qed şemala kê yî tu

Ew çi dulbend in muselsel ew çi zincîr in kezî  
Ew çi mehyûş in çi ala kesk û sor û qurmizî  
Netrik û îlan û şitrî tek li deme tewwuzî  
Dê bimeş carek tu serwa min were seyra rezî  
Da bi qurbana te bit Macin xezala kê yî tu



## Umdetul Ehkam-II

ÎMAMÊ MEQDISÎ

WERGER Û ŞÎROVEYÊN PÊWÛST: UMÎD DEMÎRHAN

٩- عن عمرو بن يحيى المازني، عن أبيه، قال: شَهِدْتُ

عَمْرُو بنِ أَبِي الحِسنِ، سَأَلَ عبدَ اللَّهِ بنَ زَيْدٍ عن وُضوءِ رسولِ

اللهِ صَلَّى اللهُ عَلَيْهِ وَسَلَّمَ، فدَعَا بِتَوْرٍ من ماءٍ، فتَوَضَّأَ لَهُم وُضوءَ

رسولِ اللهِ صَلَّى اللهُ عَلَيْهِ وَسَلَّمَ، فَأَكْفَأَ على يَدَيْهِ مِنَ التَّوْرِ،

فغَسَلَ يَدَيْهِ ثَلَاثًا، ثم أدخل يَدَهُ في التَّوْرِ، فمَضَمَضَ واستنشق

واستنثر ثَلَاثًا، بثَلَاثِ عَرَفَاتٍ، ثم أدخل يده في التَّوْرِ فغَسَلَ

وَجْهَهُ ثَلَاثًا، ثم أدخل يَدَيْهِ فغَسَلَهُمَا مرتين إلى المرفقين، ثم

أدخل يَدَيْهِ فمسحَ بهما رأسَهُ، فأقبلَ بهما وأدبرَ مرةً واحدةً، ثم غَسَلَ رِجْلَيْهِ.

وفي رواية: بدأ بِمُقَدِّمِ رأسِهِ، حتى ذهبَ بهما إلى قفاه، ثم رَدَّهُمَا حتى رجعَ إلي المكان الذي بدأ منه.

وفي رواية: أتانا رسولُ اللهِ صَلَّى اللهُ وَسَلَّمَ، فأخرجنا له ماءً في تَوْرٍ من صُفْرِ.

التَّوْر: شِبْهُ الطَّسْتِ.

9. Emr b. Yehyayê Mazeniyyî ji bavê xwe wiha ragihandiye: Ez bûme dîdarê Emr b. Hesenî; wî awayê destnimêja Cn. Pêxember 'eleyhiselamî ji Ebdullah b. Zeydî pirsî. Ebdullahî tasek av xwest û ji wan re wekî Cn. Pêxember 'eleyhiselamî destnimêjek girt: Ji tasê avek li destên xwe kir û sê caran ew şuştin. Paşê destê xwe di avê de kir; sê kulm av li devê xwe werdan; sê kulm av hilkişandin bêvila xwe û ew paqij kir. Paşê destên xwe di avê de kir û sê caran rûyê xwe şuşt. Paşê bi her du destên xwe av hilda û du caran destên xwe hetanî enîşkê şuştin. Paşê her du destên xwe di avê de kirin; carekê tenê destên xwe ji piştê serî bigire hetanî eniyê û cardin ji eniyê bigire hetanî piştê serî li ser serê xwe gerand. Paşê jî her du piyên xwe şuştin.

Di rîwayetekê de: Wî ji eniyê dest pê kir û her du destên xwe hetanî piştê serê xwe birin û cardin her du destên xwe hetanî cihê jê destpêkirî ve gerandin.

Di rîwayetekê de jî: Cn. Pêxember 'eleyhiselam hate cem me û me di taseke misîn de avek dayê.

(Di metnê hedîsê de) peyva *التَّوَر* tê wateya amaneke wekî tasê.

١٠- عن عائشة رضي الله عنها، قالت: كان رسول الله

صلى الله عليه وسلم، يُعَجِبُهُ التَّيْمُنُ فِي تَنَعُلِهِ، وَتَرْجُلِهِ، وَطُهُورِهِ، وَفِي شَأْنِهِ كُلِّهِ.

10. Ji Eyşeyê (r) hatiye ragihandin ku wiha gotiye: Kêfa Cn. Pêxember 'eleyhiselamî di her tiştî de ji destpêkirina rastê re dihat: Di pêkirin û derxistina sola xwe de, di xweşuştinê de.

١١- عن نُعَيْمِ الْمُجَمِّرِ، عن أبي هريرة رضي الله عنه، عن

النبي صلى الله عليه وسلم أنه قال: "إن أمتي يُدْعَوْنَ يومَ القيامةِ غُرّاً محجلين من آثار الوضوء، فمن استطاع منكم أن يطيل غُرَّتَهُ فَلْيُفْعَلْ".

وفي لفظ لمسلم: رأيتُ أبا هريرة يتوضأ، فغسل وجهه

ويديهِ، حتى كاد يبلغ المَنَكَيْنِ، ثم غسل رجلَيْه حتى رَفَعَ إلى

الساقين، ثم قال: سمعتُ رسولَ الله صلى الله عليه وسلم يقول:

"إن أمتي يُدْعَوْنَ يومَ القيامةِ، غُرّاً مُحَجَّلِينَ من آثارِ الوضوءِ فمن استطاع منكم أن يطيل غُرَّتَهُ وَتَحْجِلَهُ فَلْيُفْعَلْ".

وفي لفظ لمسلم: سمعتُ خليلي صلى الله عليه وسلم،

يقول: "تَبْلُغُ الحِلْيَةُ من المؤمنِ حيثُ يَبْلُغُ الوضوءَ".

11. Bi rêya Nueymê Mucmir ji Ebû

Hureyreyî (r) hatiye ragihandin ku Cn.

Pêxember 'eleyhiselamî wiha gotiye: "Umata min di roja qiyametê de ji ber şopên destnimêjê wekî kesên nişanespî tên gazîkirinê. Kî ji we dikare nişaneya xwe berbelavtir bike, bila bike."

Li gorî rîwayeta Mislîmî jî wiha ye: Min dît ku Ebû Hureyre destnimêj digire. Rûyê xwe û destên xwe jî hema hema hetanî ser milan şuştin. Paşê piyên xwe jî hetanî bigihîje çîpan şuştin. Piştê re wiha got: Min bihîst ku Cn. Pêxember 'eleyhiselam wiha dibêje: "Umata min di roja qiyametê de ji ber şopên destnimêjê wekî kesên nişanespî tên gazîkirinê. Kî ji we dikare spîtabiya nişaneya xwe berbelavtir bike, bila bike."

Li gorî rîwayeteke din a Mislîmî jî wiha ye: Min bihîst ku dostê min ê 'eleyhiselam wiha dibêje: "Xemla mirovê bawermend bi qasî şopa destnimêja wî berbelav e"

باب دخول الخلاء والاستطابة

١٢- عن أنس بن مالك رضي الله عنه، أن النبي صلى الله

عليه وسلم كان إذا دخل الخلاء قال: "اللهم أي أعوذ بك من الخُبْثِ والخبائثِ".

Beşa Ketina Destşokê û Awayê Destavê

12. Ji Enes b. Malikî (r) hatiye ragihandin ku dema Cn. Pêxember 'eleyhiselam derdikete ser destavê wiha digot: "Xwedayê min! Ez ji şeytanên jin û mêr xwe diavêjim bextê penaberîya te."

١٣- عن أبي أيوب الأنصاري رضي الله عنه، قال: قال

رسول الله صلى الله عليه وسلم: "إذا أتَيْتُمُ الغائِطَ فلا تستقبلوا

القبلة بغائِطٍ ولا بؤلٍ، ولا تستدبروها، ولكن شَرِّقُوا أو غَرِّبُوا".

قال أبو أيوب: فقدمنا الشام، فوجدنا مراحيضَ قد بُنيت



نحو الكعبة، فنحرف عنها، ونستغفر الله عز وجل.

13. Ji Ebû Eyyûbê Ensariyî (r) hatiye ragi-handin ku Cn. Pêxember 'eleyhiselamî wiha gotiye: "Gava hûn çûne ser destavê, çi ji bo mîza mezîzin û çi ji bo mîza biçûk ne berê xwe bidin qibleyê (rûgehê) ne jî piştî xwe; lêbelê berwarkî berê xwe bidin rojhilat an jî rojavayê."

Ebû Eyyûbî wiha gotiye: Em hatine Şamê û me nihêrî ku destşok berbiqible hatine avakirin. Lewra em jî çeperastî Ke'beyê rûdiniştin û me niyaza beşandinê ji Xwedê dikir.

١٤ - عن عبد الله بن عمر بن الخطاب رضي الله عنه، قال:

رَقِيتُ يوماً على بيتِ حفصةَ، فرأيتُ النبيَّ صلى الله عليه وسلم يقضي حاجتَهُ، مستقبلاً الشامَ، مُستدبراً الكعبةَ.

14. Ji Ebdullahê kurê Umer b. Xetabî (r) hatiye ragihandin ku wiha gotiye: Rojekê ez hilkişiyame ser mala Hafsayê<sup>1</sup> û min nihêrî ku Cn. Pêxember 'eleyhiselamî li ser destavê rûniştiye. Berê wî di aliyê Şamê de û piştî wî di aliyê Ke'beyê de bû.

١٥ - عن أنس بن مالك رضي الله عنه، أنه قال: كان رسولُ

الله صلى الله عليه وسلم، يدخلُ الخلاءَ، فأحملُ أنا وغلَامٌ نحوي إداوةً من ماءٍ، وعَنزَةً، فَيَسْتَنْجِي بالماءِ.

العَنزَةُ: الحَرْبَةُ الصَّغِيرَةُ.

والإداوة: إناء صغير من الجلد.

15. Ji Enes b. Malikî (r) wiha hatiye ragihandin: Dema Cn. Pêxember 'eleyhiselamî diçû ser destavê, -min û zarokê hevtemenê min- me xencerekî biçûk û di amaneke biçûk de jî hinek av jê re dibir.<sup>2</sup>

(Di metnê hedîsê de) peyva العَنزَةُ tê wateya xencera biçûk û peyva الإداوة jî tê wateya amana biçûk a çermîn.

1 Jineke Cn. Pêxember 'eleyhiselamî ye û xwişka Ebdullahî ye. (Wergêr)

2 Dema Cn. Pêxember 'eleyhiselamî çikandina şivik an jî xencereke biçûk berateya qedexebûnê bû. Gava kesekî ev berate biçikanda divê mirov di wir re derbas nebûya. (Wergêr)

١٦ - عن أبي قتادة الحارث بن ربعي الأنصاري رضي الله

عنه، أن النبيَّ صلى الله عليه وسلم، قال: "لا يُمَسِّكَنَّ أحدُكم ذكرَه بيمينه وهو يبول، ولا يَتَمَسَّحُ من الخلاءِ بيمينه، ولا يتنفسُ في الإناءِ."

16. Ji Ebû Qetade Haris b. Rib'iyê Ensariyî hatiye ragihandin ku Cn. Pêxember 'eleyhiselamî wiha gotiye: "Gava ji we kesek mîz dike bila bi destê xwe yê rastê mûziya xwe negire; destê xwe yê rastê li dîwarên destşokê negerîne û hilma xwe jî bernede derdankê."<sup>3</sup>

١٧ - عن عبد الله بن عباس رضي الله عنهما، قال: مرَّ النبيُّ

صلى الله عليه وسلم بقبرين، فقال: "إنهما ليعذبان، وما يعذبان في كبير، أما أحدهما فكان لا يستترُّ من البول، وأما الآخر فكان يمشي بالنميمة" فأخذ جريدة رطبة، فسقَّها نصفين، فغرز في كلِّ قبرٍ واحدةً، فقالوا: يا رسولَ الله لِمَ فعلتَ هذا؟، قال: "لعلَّهُ يُخَفَّفُ عنهما ما لم يَبْسَسَا."

17. Ji Ebdullah b. Ebbasî (r) wiha hatiye ragihandin: Cn. Pêxember 'eleyhiselamî li rex du merzelan re derbas dibû û wiha got: "Ev her du ji tîz ezabkirinê; lêbelê ji ber gunehê mezîzin nayên zecirandinê. Yekê wan dema mîzkirinê xwe nediparast<sup>4</sup> û kesê din jî gilî di navberan de dibir û dianîn." Cn. Pêxember 'eleyhiselamî çiqilekî ter hilda û kire du parçeyan. Di her merzelî çiqilek çikand û kesên li wir wiha gotin: Ya Pêxemberê Xwedê te çima wisa kir? Wî jî wiha got: "De heke bişk nebin, dibe ku zecrê li wan sivik bikin."

3 Di vir de mebest ev e: Divê mirov bi destê rastê xwe neşo û ji bo windakirina bêhna kirêt jî destê xwe li axa dîwarên destşokê nede û avê bi ser de neke. Her wiha divê mirov vexwarinan bêhn bi bêhn vexwe û ber bêhnê derdankê ji devê xwe dûr bixîne. (Wergêr)

4 Di vir de neparastin tê wateya han: 1. birî xelqê û li ber çavan mîz kiriye; 2. dema mîzkirinê xwe ji çilikên mîzê neparastiye û mîz bijiniye devling û kincên wî. (Wergêr)

# Zilm-Zalim

AMEDEKAR: FÎKRÎ AMEDÎ

*“Bibir bînin! Dema me peymanana çil şevî da Mûsa. Lê piştî wî, we bi zilmkari golik ji xwe re (bi îlahî) girtibû.” (2/Beqere, 51)*

## Me’na Zilmê

Li ser rûyê erdê sekna li hemberî her awayê zilmê û her zalimî, emrê dinê Îslamê yê herî muhîm e. Ji bo dinê Îslamê û edaletê serhildana li hemberî zaliman şert e. Ji bo em vê bikin, divê em pêşî van îstilahên baş zanibin.

Mesderê peyva “zilmê,” zulmet e û tê me’neya tunebûna nûrê/ronahîyê, yanî tarîtiyê. Zilm bi îstilahî tê me’neya tarîbûn,

neheqî, nebicikirina heqiyê, biserdeçûn, şiddet, heqxwarin, ezîyet û îşkenceyê. Di nava xelkê de me’neya wê ya pir pêtê zanîn neheqî, biserdeçûn, îşkence û xeddarî ye. Belê zilm van hemî me’neyan di nav xwe de digire lê di Quran û literatura Îslamê de me’neya wê firehtir e.

Dema behsa zilmê tê kirin, bi piranî ezîyet, îşkence û fêlên xerab ên fizîkî tên hişê mirov. Di dinê me û zimanê me de me’neya vê peyvê ya esasî “danîna tiştêkî (heqêkî) ne li ciyê wî.” Yanî nedayîna heqê kesekî heqdar, yanî kesê heqdar ji heqê xwe mehrûm bimîne yê neheq tiştê ku heq

nekiriye bi dest xwe bixîne. Derbaskirina sînorê ku Xwedê danîye û binpêkirina heddê Xweda zilm e. Zilm terikandina heq e. Rakirina tiştêkî ji ciyê meşrû û danîna tiştêkî li ciyê ne meşrû ye. Zilm zivirîna ji heq û derketina ji hed e. Neçûyîna li ser rê/îstîqametê jî zilm e. Di îstilaha Îslamî de; nirxandina eşyayekî yan jî buyerekê, ji xêynî hukmê şer’î bi hukmekî din zilm tê qebûlkirin. Teserrufkirina ji mulkê yekî bê îzna wî jî zilm e.

Xwedê hebûnekî mutleq e. Çavkanîya hebûn û ronahiyê ye. Nûr hebûnê, zulmet (tarîti) jî tunebûnê temsîl dike. Nûr sebaba dîtinê ye, rêyan ronî

dike, heqîqeta eşya bi xêra ronahîyê tê fêmkirin. Tarîti ji li diji ronahîyê ye. Tarîti (zulmet) hem tunebûn e û hem jî tirs e. Zulmet dibe sebebê rêşaşîya mirovan û mirov nizanin ka wê di tarîyê de çi bikin. Di nava tarîyê de wek kerr û gêjan bi vî alî û wî alî de diçin û tîn.

Xwedê, ji bo ku mirovan bîne ser rêya rast ji wî dinê ku şandîye re gotîye “nûr” (9/Tevbe, 32). Dîsa ji kitêba vî dinê re yanî Quranê re jî gotîye “nûr.” (5/Maîde, 44-46) Bi vî awayî nûr bûye sembola Îslamê û zulmet jî bûye sembola bawerîyên ji xeynî Îslamê. Zilm bi hebûna xwe tarîtiyê îfade dike. Ev tarîti tê me’neya înkâr û şîrkê jî û tê me’neya neheqî, îşkence û tecawizê jî.

Dîn û îdeolojîyên xurîfî û yên ku mirovan ji ber xwe ve çêkirine, tarîti û zilm in. Yên ev dîn îcad kirine û yên baweriyê pê tînin, ji bo ku daîm di nava tarîtiyê de ne tim û tim di nav vî tarîtiyê de diperpitin û nikarin van rêyên xwe yên xelet rast bikin.

### **Di Quranê de îstîlaha zilmê**

Di Quranê de peyva zilmê û yên ji ber koka vî peyvê hatine çêkirin sê sed û pazdeh caran derbas dibin. Dîsa hinek peyvên ku tîne me’neya zilmê jî di Quranê de derbas dibin. Em dikarin van bi vî awayî rêz bikin.

**Bî xeyrî heq:** Ev terkîb tê me’neya neheqîyê û bi me’neya peyva zilmê di gelek ayetan de tê bikaranîn. (Binêre: 2/Beqere, 61; 3/Alî -Îmran, 21, 112, 181, 155; 6/En’am, 93; 7/Araf, 33, 146; 28/Qesas, 39; 41/Fussilet, 15; 42/Şûra, 42; 10/Yûnis, 23; 22/hecc, 40; 40/Mu’min, 75.)

**Bexy:** Ev peyv tê me’neya neheqî, harbûn, bi her awayî tecawiz, ji hed derketin, pêşveçûnê û di Quranê de tê me’neya zilmê. (Binêre: 2/Beqere, 173; 6/En’am, 145-146; 16/Nehl, 90, 115; 28/Qesas, 76; 38/Sad, 22, 24; 42/Şûra, 28, 39, 42; 49/Hicûrat, 9)

**Edw, edî, îteda, mu’tedî:** Ev peyv tîne me’neya ji hedderketin, tecawuzkirina heqqê yekê, derbaskirina sînorê Xwedê û di Quranê de di me’neya zilmê de tê bikaranîn. (Binêre: 2/Beqere, 229; 10/Yûnis, 90; 65/Telaq, 1)

**Îsraf û musrîf:** Ev peyv tîne me’neya ji hedderketin, pîrr bi pêş ve çûyîn û harbûnê û di Quranê de di me’neya zilmê de tîne bikaranîn, (Binêre: 39/Zumer, 53; 40/Mu’min, 28)

**Ezab, ezzebe:** Evan peyv tîne me’neya îşkence û îşkencekirinê û di Quranê de di me’neya zilmê de tîne bikaranîn. (Binêre: 7/E’raf, 141; 12/Yûsuf, 25; 20/Taha, 47; 18/Kehf, 87; 14/Îbrahîm, 6; 29/Enkebût, 10; 38/Sad, 41; 27/Neml, 21; 24/Nûr, 2).

### **Di Quranê de me’neyên zilmê**

**Zilm di Quranê de di sê me’neyan de tê bikaranîn.**

**1- Di me’neya tarîyê de, li diji nûrê (ronahîyê) tê bikaranîn:** “Hemd, ji bo wî Xwedayê ku erd û esman xulî-qandîye û ronahî (nûr) û tarîti (zilûmat) çêkirîye. Ewên înkâr kirine dîsa jî, jê re (hinek tiştên din) dikin şîrîk.” (6/En’am, 1). Binêre. 39/Zumer, 6; 6/En’am, 59, 63; 2/Beqere, 19; 13/Re’d, 16; 24/Nûr, 40

**2- Di me’neya kufrê, şîrkê, fisqê û îsyane de tê bikaranîn:** “Loqman li kurê xwe şîret dikir û digot: Kurê min! Tu şîrîkan ji Xwedê re çêneke. Bi rastî şîrk zilmêke mezin e.” (31/Loqman, 13). “Ewên ayetên me înkâr kirine, ew di nava tarîyê (zulmatê) de kerr û lal in. Xwedê, kê bixwaze diçerixîne û kê jî bixwaze digihîne rêya rast” (6/En’am/ 39) “Elîf, Lam, Ra. Ev Quran, kitêbek e ku me ji te re daxistîye. Ji bo ku tu mirovan ji tarîtiyê (zilûmatê) derxîni ronahîyê (nûrê) û tu bi destûra Rebbê xwe wan bigihîni rêya wî Xwedayê hemîd (hemd ji wî tenê re tê kirin) û Ezîz (Xwedî qewet û qudreta mezin).” (14/Îbrahîm, 1-2) Û li van ayetan jî binêrin: 2/Beqere, 59, 165; 3/Alî Îmran, 117, 135; 4/Nîsa, 168; 7/Araf, 103, 162, 165; 11/Hûd, 67, 94; 51/Zariyat, 59 .

**3- Di me'neya neheqî û biserdeçûna kuli mirovan tê kirin de tê bikaranîn.** Bi neheqî kuştina mirovekî (5/ Maide, 27-29), di mijara diziyê de (12/Yûsif, 75), derbaskirina sînoren ku Xwedê danîne û tecewuzkirina li heqê xelkê (65/ Telaq, 1), xesibkirina malê yekê (38/Sad, 24), doza îlahtiyê kirin û li xelkê xwe neheqî û îşkence kirin. (7/E'raf, 103), heqê mirovekî bi rêya faizê ji dest wî girtin. (2/Beqere, 279), zilm li mumînan kirin û ew ji cîyên ku diman derxistin. (22/ Hecc, 39), Bi xwarina heqê mirovên mustezef, zilm li wan kirin (4/Nîsa, 75)

Xwedê teala di Quranê de dewamî me jê haydar dike ku ew li evdên xwe zilmê û neheqiyê nake û wê tu carî zilm û neheqiyê neke. Ceza, mûsîbet, neheqî, tengî û zehmetên li vê dinyayê tê serê mirovan ji ber kirinên destên wan e. Dîsa li axretê xelat û cezayên ku wê mirov bibînin ji ber kar û kirinên wan e. Xweda zilmê li tu kesî nake, lê însan xwe bi xwe zilmê li xwe dikan. Ceza jî xelat jî ji ber emelên mirov ve tê dayîn. (2/Beqere, 57; 7/E'raf, 160; 9/Tewbe, 70; 29/Enkebût, 40; 3/Alî Îmran, 25, 161; 6/En'am, 160; 45/Casiye, 22.)

"Bibîr bînin! Dema me peymanî çil şevî da Mûsa. Lê piştî wî, we bi zilimkarî golik ji xwe re (bi îlahtî) girtibû." (2/Beqere, 51)

"Ma ji wan kesên ku nahêlin di mizgeftên Xwedê de navê wî bê zikirkirin û yên ji bo xerabkirina wan dixebitin zalimtir kî heye? Ew tenê bi tirs û xof dikarin têkevin wir. Ji wan re li dinyayê rezilî (û riswatî) û li axîretê jî, ezabekî mezin heye." (2/Beqere, 114)

"Ma qey hûn dibêjin Îbrahîm, Îsmail, Îshaq, Yaqûb û neviyên wan Cihû, yan ji Fille bûn? Tu ji wan re bibêje: "Ma hûn baş dizanin an jî Xwedê?" Ma ji wî kesê ku delîleke ji bal Xwedê hatibe û li bal wî be, ew wê veşêre zalimtir kî heye? Xwedê ji kar û kiryarên we ne xafil e." (2/Beqere, 140)

"Ji mirovan hin kes, birrek tiştên din ji Xwedê re dikan hevpar (şirik). Bi qasî ji Xwedê hez dikan, ji wan jî hez dikan. Lê ew ên bawerî anîne jî; ji her tiştî bêhtir û ji her kesî bêhtir ji Xwedê hez dikan. Ew ên (li nefsa xwe) zilmê dikan, xwezî di berê de bizanibûna; her wekî dema ezab dibînin fêma dikan ku: hemî hêz/qewet ya Xwedê ye û ezabê Xwedê pîrr zor û asê ye." (2/Beqere, 165)

"Gelî yên bawerî anîne! Beriya wê roja ku tê de, ne ticaret, ne dostanî û ne jî şefayet heye were, ji wî tiştê me bi rizqî daye we înaq bikin. Ew ên kafir jî hene, esil ên zalim ev bi xwe ne." (2/Beqere, 254)

"Ji ber ku tiştên Xwedê der heqê wan de tu delîl nazil

nekirine ji Xwedê re kirine şirik/hevalbend, emê tirsê bikin dilê wanên ku berê xwe dane kufrê. Cihê wan cehenem e. cihê ku zalim tê de bi cî dibin, çi qas xerab e!" (3/Al-î Îmran, 151)

"..Kî bi tiştê ku Xwedê daxistiye hikum neke, ew ên zalim ew bi xwe ne." (5/Maide, 45)

"- Ma ji wî kesê ku derewan li Xwedê dike, yan ji ayetên wî derew hesab dike, zalimtir kî heye? Rastî ev e ku, ew ên zilimkar nagihîjin hîdayetê." (6/En'am, 21)

"Dîsa bibêje: "Ka ji min re bibêjin; ezabê Xwedê ji nişka ve yan jî eşkere ji we re were, ma qey wê ji civata zalim pê ve hinên din bêne helaqkirin?" (6/En'am, 47)

"...Ma ji wî kesê ku ayetên Xwedê derewîn hesab dike û rû jê dizivirîne zalimtir kî heye? Ew ên ji ayetên me rû zivirandine, ji ber rûzivirandina wan, emê wan bi ezabekî zor û asê bidin ezabkirin". (6/En'am, 157)

"Gelî yên bawerî anîne! Eger bav û birayên we, ji baweriyê pirtir ji kufrê hez bikin; bav û birayê xwe ji xwe re nekin dost. Ji we kî wan ji xwe re bike dost, ha zalim ew bi xwe ne." (9/Tewbe, 23)

"Ma ji wî kesê ku derew (û buxtan)an li Xwedê dike zalimtir kî heye? Wê ev ji rebbê



wan re bêne pêşkêşkirin û wê şahid ji bibêjin: “Ewên ku li hemberî rebbê xwe derew li hev dianîn a ev in.” Baş bizanibin ku laneta Xwedê li ser zaliman e. Yên ji rêya Xwedê men dikirin û di wê de li çewtiyê digeriyan ev in. Ew bi axretê jî bawerî naynin.” (11/Hud, 18-19)

“Meylî zilimkaran nekin. Ya na wê agir bi we bigre. Ji Xwedê pê ve alîkarê we tune û hûn alîkariyê jî nabînin..” (11/Hud, 113)

“Bêguman Xwedê edaletê, qenciye û arîkariya ji bo eqrebayan, emir dike. Ji fihûşê, xirabiyê û zordariyê jî, menî’ dike. Ji bo ku hûn şîretan bigirin, şîretan li we dike.” (16/Nehl, 90)

“Dema em bixwazin welatekî helak bikin, em emrê mezin û rûsîpiyê wan dikin. Ew li wir îtaetê nakin û fisqê derdixînin. Êdî ew welat mustehcê helakê dibe û em jî wê derê serûbinî hev dikin.” (17/Îsra, 16)

“Ma ji wî kesê ku bi ayetên Xwedayê xwe hatibe hişyarkirin, paşê berê xwe lê vegerandibe û gunehên ku bi destên xwe kirine jibîr kiribe, zalimtir kî heye? Bi rastî me di ser dilê wan de perde û di guhên wan de jî giranî çêkiriye ku ji fêmkirina wan re dibin mani’. Tu wan gazî rêya rast bikî jî, ew tu carî nayên (lewra çavê xwe ji rastiyê girtine). (18/Kehf,57)

“...Ji zaliman re tu arîkar tuneye.” (22/Hecc, 71)

“- Ji bilî wan (şair)ên bawerî anîne û karên qenc kirine û ewên Xwedê pir zikir dikin û ewên piştî ku zilm li wan tê kirin heyfa xwe distînin. Ewên ku zilmê dikin di pîrr nêzik de wê bibînin bê ka aqûbeteke çawa li benda wan e.” (26/Şu’era, 227)

“Gelo ma ji wî kesê ku ji ber xwe ve derewan çêdike û davêje ser Xwedê yan jî dema heq jê re bê ew biderewîne zalimtir kî heye? Ma cihê kafiran ne cehenem e? (29/Ankebut, 68 û ayetên wek vê ayetê: 39/ Zumer, 32)

“Tu wan bi wê roja ku nêzik dibe bitirsîne û hişyar bike. Wê rojê dil li ber gewriyê ye û dadîqultînin û disekinîn. Ji bo zaliman ne dost û ne jî

şefaetvanekî ku gotina wî bê guhdarkirin heye. Xwedê, bi xayîniya çavan û bi veşartiyên di sîngan de ye dizane.

**(40/Mu'mîn, 18-19)**

“Û dema zilim û neheqî li wan bê kirin; ew alîkariya hev dikin. Cezayê xerabiyê dîsa xerabiyê weke wê ye. Lê kî efû bike û li hev bîne, xelata wî li ser Xwedê ye. Bi rastî ew ji zaliman hez nake. Piştî ku zilim lê hatibe kirin, kesê ku heqê xwe bistîne, êdî di eleyhê wî de rêyek tune. Lê di eleyhê yên zilmê li mirovan dikin û bi neheqî li ser rûyê erdê erîşe dikin, rê heye. Ji vana re ezabekî bijan heye. Lê kî sebir bike û efû bike, bêşik ev ji karên pir hêja ne. Heçî kesê ku Xwedê wî bixerifîne, êdî piştî wî, jê re tu dost û arîkar tune. Xwezî dema ezab dibînin, te ew zalim bidîtana, dibêjin: “Gelo ji vegeêre re rêyek nîne?” Tu wan dibîni ku dema bi rezîlî serê wan di ber wan de ji ezabê agir re tene pêşkêşkirinê, di binê çavan re bi dizîka dinêrin. Yê bawerî anîne jî dibêjin: “Birastî ew ên ziyarî dîtine, roja qiyametê hem ziyarî li xwe dikin û hem li malbata xwe dikin.” Binêrin, zilimkar di nava ezabekî ebedî de ne.

**(42/Şûra, 39-45)**

“...Kî tobe neke, esil zalim

ew bi xwe ye. **(49/Hucurat, 11)**

“Ma ji wî kesê ku dema ji îslamê re tê dawetkirin û ew bi bêbêxtî derewan li Xwedê dike zalimtir kî heye? Xwedê, civata zaliman nagihîne ser rêya rast.” **(61/Seff, 7)**

“...Kî ji tixûbên Xwedê derbas bibe, bi rastî wî zilim li xwe kiriye. Tu nizanî dibe ku Xwedê di pey vêya de tişteki çêbike. **(65/Talaq, 1)**

“Lê heya Xwedê nexwaze, hûn nikarin tişteki bixwazin. Bi rastî Xwedê zana ye, xwedî hikum û hikmet e. Kî bixwaze wî dike rehmeta xwe. Ji zaliman re jî, ezabekî biêş û jan heye.” **(76/Însan, 30-31)**

**Di hedîsên şerîf de îstîlaha zilmê**

Di hedîseke qudsî de wiha tê gotin: Resûlullah dibêje: “Xwedê Teala (c.c) got: ‘Min zilim ji xwe re heram kirîye. Min ew di nava we de jî heram kirîye. Naxwe zilmê li hev nekin!’ **(Mislim, Birr, 15, jimara hedîsê: 2577, 4/1994)**

“Xwedê miheqek moletê dide zalim û gava bi wî digre nahêle çavê xwe veke û nişka ve bi wî digre.” Di piştî vê îfadê Resulullah (s.a.s) ev ayet Xwend: “Xwe ji nifirên mezlûman biparêzin lewra di nava duayê mezlûm û Xwedê de tu perdeyek tune” **(Buxarî, Mezalim 9, jimara hedîsê: 9, Cihad 180; Mislim, iman 7, jimara hedîsê: 19, 1/150; Ebû Dawud, Zekat 5, jimara**

**hedîsê: 1584; Tirmizî, Zekat 4, -625-)**

“Duayên sê kesan red nabin: Gava fitarê dike duayê yê rojî girtî, duayê rêveberê adil û duayê mezlûman. Xwedê duayê mezlûman bi ser esmanan ve bilind dike û ji bo dua deriyên esmanan tê vekirin. Xwedê teala jî wiha dibêje: Bi îzzeta xwe sond dixwim ku bîstekî din be jî, ezê arîkariya te bikim” **(Tirmizî, Deawat 129, jimara hedîsê: 3598, 5/578)**

Misliman ew kes e ku, Mislimanên din ji dest û zimanê wî emîn in. **(Buxarî, Îman 4, 5, Rîqak 26; Mislim, Îman 64, 65; Ebû Dawud, Cihad 3; Tirmizî, Qiyame 53, Îman 13)**

Ji Pêxemberê me hate pirsîn, “Kîjan cihad bifezîlet e?” Got: “Li cem siltanekî zalim axaftina gotina heq.” **(Îbn Mace, Fîten 20, jimara Hedîsê: 4012, 2/1330)**

“Kî bizanibe mirovek zalim e û ji bona ku arîkariya wî bike û bi wî zalimî re re bimeşe, ji Îslamê derdikeve.” **(Îbn Kesîr, bi Hedîsan Tefsîra Qurana Kerîm, c. 5, r. 2089)**

“Kî arîkariyê li zalimekî bike, Xwedê teala wî zalimî muselletî canê wî dike.” **(Deylemî; Îbn Esakîr, Dîrok)**

“Kî bi zanebûn, ji bo mexaseda ku arîkariya wî bike û bi zalim re bimeşe ew kes ji Îslamîyetê derketî ye.” **(Ramuz el-Ehadîs, c. 2, r. 445)**

“Eger însan zalimekî bibîne û ji wî re nebe mani’, wê ji ber vê hemû bêne cezakinin.” **(Tirmizî; Tuhfetu’l Exwezî Şerhû Camiû’t Tirmizî, 8/423)**

“Xwedayê min! Hestên min ên dîtîne û bihîstinê rast bike û wan ji min re bike waris. Li hemberî yên zilmê li min dikin, arîkarîya min bike û heyfa min a ji zaliman tê girtin nîşanê min bide.” **(Bûxarî, Edebu’l-Mufred, 82, jimara hedîsê: 649-650)**

“Kê bi neheqî ji birayê xwe tiştekek stendibe, heya ku biqîmet bibe bila di eynî rojê de îade bike. Eger (îade neke) emelekî wî yê baş hebe, bi qasî ku neheqî kiriye jê tê stendin. Ya na ji gunehên birayê xwe hildigire.” **(Buxarî, Esqelanî, Şerh-î Sahîh-î Bûxarî, c. 5, r. 161)**

“Kesê ku li ser wî ji ber zilmê ve yan ji ber tecawuza malê yekî ve heqê (birayekî wî yê Mislîman) hebe; berî roja (qiyametê) ku nikare dînar û dirhem bibîne bila îro li vê dinyayê ji mezlûm daxwaza efûbûna wî heqqî bike. Eger (mezlûm heqê xwe helal neke) emelên qenc ê zalim hebe bi qasî ku zilm kirîye jê tê stendin (û ji mezlûm re tê dayîn) eger xêrên zalim tunebe; ji gunehên mezlûm tê girtin û li zalim tê barkirin.” **(Buxarî, Mezalîm 10; Tirmizî, Sifatu’l-Qiyame 1, jimara hedîsê: 2534)**

Pêxember (s) pirsî, got: “Hûn dizanin muflis kî ye?” Eshaban got: “Di nava me de muflis mirovê ku bêdirhem û bêşeya ye.” Di ser vê yekê re got: “Bi rastî ji ummeta min muflis ew kes e ku roja qiyametê bi nimêj, rojî û zikatê tê. Lê çêrî wî kiriye, zîna îsnadê wî kiriye, malê wî xwarî ye, xwîna filankesê rijandîye û li yê din xistîye. Ji xêrên wî ji vî re tê dayîn, ji xêrên wî ji vî re têne dayîn. Berî ku doza wî nehatiye dîtin xêrên wî biqedin, ji gunehên wan tê stendin û li wî tê barkirin. Paşê ber bi cehennemê ve tê avêtin.” **(Mislim, Birr Wes-Sila, 59 jimara hedîsê: 2581)**

“Roja qiyametê miheqeq hûnê heqan bidin xwedîyê wan. Hetta, ji bo miya bê qiloç, ji miya biqiloç qîsas tê girtin.” **(Mislim, Birr wes-Sila, 60, jimara hedîsê: 2582; Tirmizî, Sifatu’l-Qiyame 1, jimara hedîsê: 2535)**

“Bêşik zilim roja qiyametê tarîbûn e” **(Buxarî, K. Mezalîm wel-Xesb, 8, jimara hedîsê: 8; Mislim, K. Birr wes-Sila, 57, jimara hedîsê: 2579)**

“Kî ji erdê perçekî bi neheqî zeft bike, (roja qiyametê) wek xelekek heft qatê erdê li stûyê wî tê alandin.” **(Buxarî, K. Mezalîm wel-Xesb, 13-15; Mislim, K. Musaqat, 137, 142 jimara hedîsê: 1610, 1612)**

“Kê bi sonda xwe heqê Misilmanekî ji destê wî bistîne, Xwedê ji wî kesî re cehennem wacib kirîye û cennet jî helal kiriye. Di ser vê peyvê re sehabiyekî got: “Tişteki hindik be jî ya Resûlullah?” Resûlullah (s) got: “Ji dara sîwakê darek be jî (dîsa wisa ye).” **(Mislim, Îman 61, jimara hedîsê: 218; Nesai, Adabu’l-Kudat, 30 jimara hedîsê: 5384)**

“Zilm bi sê awayî ye. Zilmek heye ku Xwedê wê efû nake. Zilmek heye ku Xwedê wê efu dike. Zilmek jî heye ku miheqeq Xwedê hesabê wê dipirse. Zilma ku Xwedê wê efu nake şirk e. Lêwra Xwedê gotîye: “Şirk zilmeke mezin e.” (Loqman; 13) Zilma ku Xwedê efû dike ew zilm e ku evdan li hemberî nefsa xwe kirîne. Gunehên ku evdan li hemberî Rebbê xwe kirine dikevin vê qategorîyê. Zilma ku wê Xwedê miheqeq hesabê wê bipirse jî, bêheyatîyên ku evd li hemberî hev dikin e. Xwedê hesabê van dipirse û cezayê zaliman dide wan.” **(Îbn Kesîr, Bi Hedîsan Tefsîra Quranê, I/508)**

“Geli bawermendan, li dijî Xwedê asê nebin û xwe biparêzin. Her yekî ji we ji bona sibê çi şandibe, bera lê binêre. Li hember Xwedê asê nebin. Bêguman, hûn çi dikin haya Xwedê ji hemû kirinên we heye.”<sup>1</sup>

Herçiqas vê dinyayê xwe bi tiştên derewîn ve xemilandibe û meşa li ser sînga cîhanê çi qas dijwar û zehmet be jî, hewceyî bi şopên pak û zelal heye. Divê li ser rûyê erdê tiştên xweş werin kirin da ku heyata me bime'ne be.

Ji bavê me Adem û heta îro, di nava dîrokê de gelek tişt hatine veşartin û hewandin. Yên di nava van de balkêştirin kirinên însanan in. Jixwe dîrok li ser piştê kirinên însanan ava bûye û dibe. Em di dîroka mirovahîyê de mînakên wek Habîl û Qabil, Îbrahîm (e) û Nemrûd, Mûsa (e) û Firewn, Mûhemmed (s) û Ebû Cehl dibînin. Şopên ku van kesên ku navên wan hatin jimar-tin li pey xwe hiştine, ji bona mirovahîyê gelekî girîng in.

Her mirov bi kirinên xwe ve tete bibîranîn. Hin kes bi çûyîna xwe ve di jiyana mirovan-mirovahîyê de valahîyên bêhempa çêdikin û tu carî şopên wan nayên jibîrkin. Di virade ya herî muhîm ewe ku yên ku koç kirine an jî hêj dijîn şopên çawa berdane û berdidin.

Însan şahidê xwe û dorhêla xwe ye. Di her cure tēkilîyan de carinan dibe fail, carinan jî dibe berkar. Bi vî hawî rola xwe ya di alemê de dilîze. Xweda însan jî tunebûnê anî hebûnê da ku jê re bendetîyê bikin. Ji bilî bendetîya rêka Xweda tu rêya pak nîne. Li cem Xweda dîn (rê) Îslam e, rêya mirovahîyê ya rast jî ev e.

Mirovahîyê bi piranî di nava mijûlbûna kar û barên xwe de û bi taybetî jî di bendetîya nefsaniyetê de, îstiqameta xwe ya rast şaş kirîye. Li çar aliyên cîhanê her tim şer dibe û kesên ku di van şeran de dimirin, nizanin ji bona çi dimirin, dikujin û mucadele dikin. Piştî van şeran zarok, jin û kesên pîr û nexweş bê xwedî dimînin. Xizanî dibe para mezlûman. De ka mi-

# Şopa pak û

OSMAN ÎZOL

rov dikane di rewşeke wisa de behsa şopeke pak bike yan na? Na..

Wek Elî Şerîetî digot; lê evên ku dewletan îdare dikin dizanin ji bo çi şer dikin. Ev kesên ku ji bo berjewandîya xwe cîhan xistine wekî gola xwînê, çi qas dişibin Nemrûd, Firewn û Ebû Cehîlan. De ka ev şerxwaz û xwînrejên îro dê ji bona mirovahîyê şopeke çawa bihêlin?

Divê însan xwe ji bo jîyaneke derewîn an jî ji bona hinekan neke listokê tu kesî û tu tiştî. Divê bi navê xwe û rastîya xwe ve bijî. Ji bo ku ewê di jîyana ebedî de hew bi kirinên xwe ve rû bi rû bimîne, divê bi eqlê xwe ve bimeşe û bifikire.





Di vê rewşa kambax de yên ku ji bo rastî û dadîyê şer kirin, hew ewana şopên pak û zelal li pey xwe hiştin. Îro em nikarin ji bo Nemrûd, Fîrewn, Ebû Cehîl û nûnerên wan ên îroyîn tiştên xweş bêjin. Lê ji bona yên ku li dijî wan sekinîn û mucadele kirin, têne medihkirin û bi dilxweşi tên biranîn.

Divê em ji bona sibeyên xwe, tiştên xweş û pak amade bikin. Ya herî xweş û şêrîntirîn ew e ku em li hember Xwedayê ezîm bi rûyê pak derkevin hizûra wî. Lê ev yek jî dê bi kirinên me yên li vê dinyayê diyar be.

Berpirsîyarîya ku her demê li ser milê me sekinîye ew e ku em şîretên xweş li hev bikin.

Dera ku zimanê me dikane rast bike, divê em bilez gotinên xwe bi dengê xwebawer û bihêz bêjin. Dera ku divê em bimeşin û bi destê xwe ve rast bikin, divê em paşde nexînin. Çimkî gavên em diavêjin û şopên em li pey xwe dihêlin ew in.

Sond be bi wextê esrê. Bê guman beşerîyet di nav xusranê de ye. Yên ku bawerî anîn, emelên salih kirin û ji hev re şîretên heq û sebrê kirine ne tê de.<sup>2</sup>

1. Heşr, 18

2. Esr, 1, 2, 3

# Peyva bîst û şeşemîn: Rîsaleya qederê -I-\*

REMZÎ PÊŞENG

WERGER: KENANÊ NADO

**Bi navê Xwedayê min ê ku difikirîne û diponijîne**

## Destpêk

Meseleya cuzî îxtiyarî û qederê ji serdemên ewil bigire heya roja îro di nav tarîxa fikiryariyê de problema herî girîng e. Vê meselê filozofan, siyasetmedaran, hiqûqnasan, aliman, derûnnasan, bawermend û Misilmanên ji rêzê û hemû mirovên ji civakê mijûl kiriye û ev mesele bûye mijara nîqaşên gelek mezin. Meseleya cuzî îxtiyarî û qederê, ne tenê civakê, ji destpêka dîrokê pê ve ye ku hemû mirov eleqedar kirine û li ser vê munaqesê û spekulasyonên cuda dane destpêkirin. Ji ber vê yekê meseleya Qederê “problemeke însanî” ye.

Ezê vê gavê li ser vê meselê ranewestim, lê belê emê bi kurtasî li ser nîqaş û gengeşiyên ku di navbera ehlê kitêbê de çêdibin, rawestim.

Qeder meseleyeke wisa balkêş e ku li her dera ku însên lê heye û bi her dera ku insan

eleqedar dike re têkildar e. Ev mesele tenê ne meseleya Misilmanan e. Di beriya Îslamê de jî di dînen semawî de bûye mijara gelek nîqaşan. Meseleya qederê di nav van dînan de bi taybetî jî di navbera Cihûtî û Xaçparêziyê de bûye sedema gelek nîqaşan. Herwiha çand û alema Cihûtî û Xaçparêziyê di meseleya qederê de tesîreke çawa li ser civaka Îslamê kiriye, divê bi taybetî bê nîrxandin.

## Di Cihûtiyê de baweriya qederê

Di Cihûyan de li ser meseleya azadiya îradeya mirovî fikrên cuda derketine holê. Bi taybetî jî cudahiya fikrî ya li ser babeta “Cebr” û “Îxtiyar”ê bûye sedema nîqaşên tund. Hin ji van mezheban “Cebr” hin ji van jî azadiya îradeyê parastine. Di ber wê de hin ji wan jî xwestine ku van her du pêkaran di nuqteyê de weset de bigihînin hev.

Li gor Cihûtiyê heger Xwedayê teala hin ferman li mirovan kiribe û li gorî

bicihanîna van fermanan soza xelat û cezayê jî dabe, bêguman wê çaxê hêz û îradeya ku dê bikaribe wan emelan bike jî daye mirovî.

Di Tewratê de ayeteke wiha heye: “Min jiyan û mirin danî pêşberê te. Ji ber vê yekê ji xwe re jiyanê bibijêre.” Di cihekî din de jî wiha hatiye gotin: “Ev yeka bi destê we bû.”

Allah Qadirê Mûtleq e. Dizane ew îradeya ku daye mirovî dê ji bo wî çawa bi kar bîne. Lewra ‘ilmê Xweda ne li gor encama tevgera mirovî ye. Ew her tiştî jî mêj ve dizane. Mirov tu carî nikare li dij ‘ilmê Xwedê derkeve. Lê ev nayê wê maneyê ku her gavê biryara her hereketa mirovî Xweda dide.

Di cihûtiyê de azadiya îradeyê wek prensîbê hatiye qebûlkirin. Nêrîna giştî ya der barê vê meselê de ew e ku jiyanê ebedî û bextewar an jî ebedî û jankêş tenê bi tevgera mirovî ya baş an jî nebaş ve girêdayî ye. Yanî îradeya mirovî ya ku dikare hem başiyê hem jî nebaşiyê pêk bîne bi temamî

serbest e. Her tişt ji pêşiyê ve hatiye zanîn û di ber de ji azadî hatiye dayîn.

Nêrîna giştî ya melayên Cihûyan a der barê esasên baweriyê de wiha ye: “Em bawer dikin ku haya Xaliqê Hekîm ji hemû fikr û herketên mirovî heye.” Emê fikra çend mezhebên Cihûyan a der barê qederê de bi we re parve bikin.

Em dikarin navê sê mezheban bijmêrin:

Yek: Ferisî

Du: Sadûqî

Sê: Essenî

Ferisî dibêjin ku her tişt ji mêj ve ji hêla Xwedayê teala ve hatiye tayînkirin, lê belê herwiha biryara mirovî ya der barê başî û nebaşiyê de ne derveyî îrada mirovî ye. Bi vê yekê re jî lê zêde dikin û dibêjin ku mîna “şexsekî tenê” qedera civatekê jî ne bi mirovî, bi Xwedê ve girêdayî ye. Bextewarî û bedbextiya gelê Cihû li ser hêz, zanîn û ciwanmêriya mirovî nîne, ev rewş bi qudreta mutleq a Xwedê ve derdikeve holê.

Her tişt li gor îradeya wî ya ezêlî û qudreta wî ya mutleq çêdibe. Mirov çawa wek şexsekî ji herketên xwe berpirsiyar be, bi heman halî berpirsiyariyeke civata ku ji mirovan pêk hatiye jî heye. Zanayên cihûyan vê baweriyê bi kurtî wiha rave dikin: “Her tişt di serî de hatiye dîtin û zanîn lê azadî jî hatiye dayîn. Her tişt bi hêza Xwedayî ve



girêdayî ye. Heger hikm ji jor ve neyê kirin li vê dinyayê de tiliya mirovekî jî neêşe.”

Ferisî: Xwestine fikra tayîn û tespîtkirina serî ya Xwedê û îradeya azad a mirovî binin bal hev. Ji hêlekê ve qedera mirov û civatê bi Xwedê ve girêdidin. Ji hêleke din ve mirov û civata wî dikin berpirsiyar.

Sadûqî: Tu mudaxeleyeke Xwedê ya li ser karên mirovan napejirînin. Serbayêser hemû bûyerên li vê dinyayê bi şans û bext ve eleqedar kirine û dane nîşan ku diyarkeriya îlahî ne pêkan e. Herwiha dîsa wan dahatûya mirovî jî nedaye destê Xwedê û gotine ku qedera mirov di destê mirovî bi xwe de ye. Sadûqî tenê îradeya azad a mirovî û berpirsiyariya mirovî qebûl kirine.

Essenî: Di nav mezhebên Cihûyan de mezhebê ku îradeyê red dike ev e. Êdiayên wan jî wiha ne: “Mirov beriya ku were dinê yan li hêla ronahiyê yan jî li hêla tarîtiyê disekine. Qedera

wan bi awayekî ebedî hatiye tespîtkirin. Ev yek li ser stêrkan jî hatiye nivîsandin. Qeder serê her tiştî ye. Di kitêbên dua yên Esseniyên de, di ber mûtleqiyata qudreta Xwedê de gelek rêzikên ku li ser hîçbûna mirovî hatine nivîsandin jî hene. Qedera mirovî bi tevavî di destê Xwedê de ye.”

Ev nîqaşên di navbera mezhebên Cihûyan de heya destpêka Fîletiyê dewam kirine. Ji van nîqaşan çend mezhebên cuda jî derketine holê.

Ji van mezheban yek “Karaîm” e ku ew jî hevalbendên “nes”ê ne. Ev kesên ku bi dil û çan bi “nas”an ve girêdayî ne. Ev mezheb li ser fikra “cebr”ê ye.

Mezhebekî din jî “Rabbaniyûn” e. Di vî mezhebî de tê gotin ku mirov xwedî îradeyeke azad e.

\* Ev nivîs ji hêla Remzî Pêşeng ve bi nêrîn û perspektîfêke nû, bi nirxandin û şîroveyeke cuda li ser meseleya qederê hatiye nivîsandin. Ya rastî em dikarin bibêjin ku her gotineke vê nivîsê jî kaniya Rîsaleya Nûrê herikiye. Lewra nivîs piştî destpêkeke bi vî şiklî dê li ser peyva bîst û şeşemîn a kitêba “Sözler”ê raweste. Ji ber ku ev mijar wek xebateke kitêbî tê fikirîn gelek dirêj e. Me jî xwest beriya ku ev kitêb çap bibe, em wiha beş bi beş bi we xwendekarên delal re parve bikin. Ji vir şûn de di her “Peyam”ekê de Xwedê hez bike emê jî vê cewhera Rîsaleya Nûrê, ji mucedîdê mezin û tîmsalê rastî û camêriyê Bedîuzzaman Seîdê Kurdî û herwiha ji peyrewê Seîd û nivîskarê hêja Remzî Pêşeng gotinên ku dê di baweriyaya me de bibîne çira ji we re wergerînin zimanê me yê şêrîn. Xwedê me hemûyan bike ji kesên ku bi emeleke Qur’anî tevdirgerin.

# Haqîqeta şerm û heyayê

M. REŞÎDÊ HIRITÎ

عن ابن مسعود رَضِيَ اللهُ عَنْهُ قَالَ: قَالَ رَسُولُ اللهِ: اسْتَحْيُوا  
مَنْ لَمْ يَحِقَّ الْحَيَاءَ. قُلْنَا إِنَّا نَسْتَحِي مَنْ لَمْ يَحِقَّ الْحَيَاءَ يَا رَسُولَ اللهِ  
وَالْحَمْدُ لِلَّهِ. قَالَ: لَيْسَ ذَلِكَ وَلَكِنْ اسْتَحْيَاءَ مَنْ لَمْ يَحِقَّ الْحَيَاءَ  
أَنْ تَحْفَظَ الرَّأْسَ وَمَا

وَعَى، وَالْبَطْنَ وَمَا حَوَى وَتَذَكَّرَ الْمَوْتَ وَالْبَلَى، وَمَنْ أَرَادَ الْآخِرَةَ  
تَرَكَ زِينَةَ الْحَيَاةِ الدُّنْيَا، وَأَثَرَ الْآخِرَةَ عَلَى أُولَى،  
فَمَنْ فَعَلَ ذَلِكَ فَقَدْ اسْتَحْيَا مَنْ لَمْ يَحِقَّ الْحَيَاءَ . أَخْرَجَهُ  
الترمذى .

Îbnî Mesûd ji Pêxemberê Xwedê hedîsekê rîwayet dike ku Pêxemberê Xwedê (s) wiha dibêje: “**Li gor hewceyiya heyayê ji Xwedê şerm û fedî bikin. Sehabiyên ku di sohbeta wî de rûniştî bûn gotin: ‘Hemd be ji Xwedê re, em ji Xwedê fedî dikin.’ Pêxember got: Ne wisa. Çi kesê li gor hewceyiya şermkirinê ji Xwedê şerm û fedî bike; bila serê xwe ji wan tiştên di serê xwe de dihewîne biparêze; bila zikê xwe ji wan tiştên di zikê xwe de dihewîne biparêze û bila mirin û fenabûnê bi bîra xwe bîne. Çi kesê axretê bixwaze divê xeml û zîneta dinyayê biterikîne û axretê ji dinyayê çêtir bibîne. Ki van bike, muheqeq wi li gor hewceyiya heyayê fedî kiriye.**”

Di vê hedîsê de şewqek ji nîra pêxemberiyê û çirûskê ji xweşikahiya baweriyê heye.

Bi vê şewq û çirûska wehyê, Pêxemberê dilovan rê nişanî me dide; da ku em nebin rêkor û şevkor. Da ku em rêya hîdayetê wenda nekin. Wekî din bi bal îzet û şerefê ve bilind bibin.

Dema însan kirasê şerm û heya, qencî û îzetê

ji ser xwe rakir ew însan bêrûmet û bêfêde dimîne. Lewra di pêşketina millet û civatan de exlaqê qenc, xala bingehîn e. Di vê babetê de ji mêj ve şairê Ereb wiha gotiye:

**Dema netirsî ji dawiya şevê**

**Dema nekî şerm û fedî**

**Tu çi dixwazî, bike**

**Ez qesem dikim bi zatê Xwedê**

**Nîne di jîyan û dinê de qencî û îzet,**

**Dema here jê şerm û rûmet.**

**Dema heya û şerm hebe însan diji**

**Heya qalçikê darê spî nebe zindî dimîne**

Qasidê Xwedê di vê hedîsê de bala hevrê û sehabiyên xwe dikişîne ser reng û xûyên bawermendên kamil. Herwiha rastî û heqîqeta şerm û fedîya ku Xwedê jê hez dike ji me re dibêje. Ev şerma ku xwediyê xwe ji şemitîna kufr û delaletê diparêze.

Belê pêxemberê Xwedê bi te’bîra ((استحيوا من 1)) ji me re tarîfa rastiya heya û fedîkirinê dike: Armanc ji şermkirinê ne şerimkirina adetî ye ku însan ji hev du şerm dikin. Mebest ji fedîkirinê ew e ku bawermend heqîqeta weteya fedîkirina ku ji gewhera baweriyê tê nas bike. Şerm û fedîkirina rastîn ew e ku xwediyê xwe bilindê bal kamiliyetê ve dike. Şerm û fedîkirina rastîn ew e ku xwediyê xwe ji heriya gunehan rizgar dike ku gelek însan noqî nav bûne. Li gor bayê nefsa xwe tevdigerin. Herwiha berpirsiyariya xwe ya li hember e’zayê xwe pêk nayinin. Jixwe, Pêxember (s) bala me bi vê te’bîr

من استحي من الله حق الحياء فليحفظ الراس وما وعى وليحفظ

البطن وما حووليذكر الموت والبلوى (2)

dikşîne ser girîngiya me'neya fedîkirinê ya rastîn. Belê şerm û fedîkirina heqîqî ya ku Pêxemberê Îslamê bala me dikşîne serê ew e ku însan çav û guhên xwe, dev û zimanê xwe, dest û lingê xwe biparêze. Yanê bila guhdariya tiştên neqenc neke. Bila bi çavên xerab û heramiyê temaşeyî namûsa xelkê neke. Bila gotinên nelirê nebêje û bila bi zimanê xwe nebe fesad. Bila bi zimanê xwe nebe zirna zaliman. Her wiha bila zikê xwe bi heramiyê tijî neke û bila nebe şehwetperest an bêşeref. Wekê din destdirêjîyê neke, ango bi destê xwe nebe hacetê zilma zaliman û bi lingên xwe neçe nav heriya gunehan.

Di vê babetê de Seydayê Mela Xelîlê Golpîkî çî xweş gotiye

*Te e'zayê heft in Xwedê çêkiri*

*Ku pê sed bikî dergehê agiri*

*Li kespê heram çira der didî*

*Wedî'a Xwudê ne tu dayî didî*

*Heçî layîqê Rebbê wana bike*

*Ku şehde nedin ew e'tabê bikin*

*Heçî ni'meta wî li te daniye*

*Ewî pê bike her ku e'bdîni ye*

*Ji bo çî tu wê le'b lehwê dikî*

*Heçî ku bi nef' e çira dê nekî*

Belê çewa ku ji naveroka hedîsê tê fêmkirin divê bawermend ji Xwede pir şerm bikin û fermanên Xwedê pêk binin. Xwe ji qedexeyên wî vekêşin. Ezîyet, zehmetî, neheqî û te'dê li kesekî nekin pir aşîxwaz bin. Bi dilxwazî edakerê qencî û îbadetê Xwedê bin. Herwiha divê mirovên bawermend ên kamîl û gihîştî fesadker nebin. Ango xwe ji derxistina fesadiyê biparêzin û di emelên salih de pir xebatkar û zîrek bin. Bi zimanê xwe ve rastgo bin û bi pîvan xeberbêj bin. Di heman demê de divê bawermedên fedîker, bitebat û dilgiran bin. *Şîreta ku mirovahiyê ji pêxemberên pêşî vegirtiye ev e:*

*Dema te şerm û fedî nekî, tu çî dixwazî bike.*

# Dayê, Rebenê

Dayê, rebenê!

Ez bêhal o

Her çî mi rî kal o

Çi biwero mi rî cal o

Dayê, rebenê!

Ez bêhal o

Dayê, rebenê!

Qey ma tim bermenî?

Hesrê çimanê ma nêqedîyenî

Roj bi roj zeydîyenî

Dayê, rebenê!

Qey ma tim bermenî?

Dayê, rebenê!

Qehr û qotik ma rî

Kul ma rî, jehr ma rî

No mewt o, nîyo yarî

Dayê, rebenê!

Qehr û qotik ma rî

Dayê, rebenê!

Bermayîş kezebi veşneno

Hesrê çiman sey dijni

Vareno ha vareno

Dayê, rebenê!

Bermayîş kezeb veşneno

**BÎLAL ZÎLAN**

11.05.2007 – Dîyarbekir

ليه القدر

# Bangewaziyên di Quranê de: "Hey evdên min!"

WERGER: MELA SULEYMAN KURŞUN

يَا عِبَادِيَ الَّذِينَ آمَنُوا إِنَّ أَرْضِي وَاسِعَةٌ فَإِيَّايَ فَاعْبُدُونِ {56}  
كُلُّ نَفْسٍ ذَائِقَةُ الْمَوْتِ ثُمَّ إِلَيْنَا تُرْجَعُونَ {57} وَالَّذِينَ آمَنُوا  
وَعَمِلُوا الصَّالِحَاتِ لَنُبَوِّئَنَّهُم مِّنَ الْجَنَّةِ غُرَفًا تَجْرِي مِنْ تَحْتِهَا  
الْأَنْهَارُ خَالِدِينَ فِيهَا نِعْمَ أَجْرُ الْعَامِلِينَ {58} الَّذِينَ صَبَرُوا  
وَعَلَىٰ رَبِّهِمْ يَتَوَكَّلُونَ {59}

56- Hey evdên min yên ku bawerî anîne! Bi rastî zemîna min fire ye. Vêca hûn li kur dibin

bibin, îdî her benîtiya min bikin.

57- Her can tamkerê mirinê ye. Paşê hûnê her veqerine bal me.

58- Ca ewanê ku bawerî anîne û karên hêja kirine, bi sond emê hemin wan bi nemirî bêxine bihiştine ku çem di bin wan re dikişin. Çi rind e padaşa xebatkar.

59- Ewên ku semax kişandine û her xwe dispêrine perwerdegarê xwe.

وَأَرْضُ اللَّهِ وَاسِعَةٌ إِنَّمَا يُوَفَّى الصَّابِرُونَ أَجْرَهُمْ بِغَيْرِ حِسَابٍ  
 آمَنُوا اتَّقُوا رَبَّكُمُ لِلَّذِينَ أَحْسَنُوا فِي هَذِهِ الدُّنْيَا حَسَنَةٌ قُلْ يَا عِبَادِ  
 الَّذِينَ {10}

10- (Hey qasidê min Mûhemmed) bibêje:  
 (Xwedê) dibêje: Hey evdên min yên ku bawerî  
 anîne! Xwe ji sînorên perwerdegarê xwe biparêzin.  
 Ji bo wanên ku di jiyana vê cîhanê de qencîkarî  
 bi kar anîne re rindiyeke mezin heye. Zemîna  
 Xwedê jî fireh e. Bes ji yên semaxdar re padaşa  
 wan bêjimar tête pêkanîn.

ذَلِكَ هُوَ الْخُسْرَانُ الْمُبِينُ {51} لَهُمْ مِنْ قُلِّ إِنَّ الْخَاسِرِينَ  
 الَّذِينَ خَسِرُوا أَنفُسَهُمْ وَأَهْلِيهِمْ يَوْمَ الْقِيَامَةِ أَلَا فَاعْبُدُوا مَا شِئْتُمْ  
 مِنْ دُونِهِ وَمَنْ تَحْتَهُمْ ظُلٌّ ذَلِكَ يُخَوِّفُ اللَّهُ بِهِ عِبَادَهُ يَا عِبَادِ  
 فَاتَّقُوا {61} فَوْفَهُمْ ظُلٌّ مِنَ النَّارِ

15- Vêca ji bil wî, benîtiya yê ku hûn bivên  
 bikin. Bibêje: Birastî roja qiyametê yên ziyandar  
 ewên ku kesîtiyên xwe û malbatên xwe li cîhanê  
 xistine ziyane bi xwe ne. Heyhê! Ha ew, ziyana  
 haşîkar her bi xwe ye..

16- Ji bo wan di ser wan re qatên ji êgir hene û  
 di bin wan re jî qatên (ji êgir) hene. Ha ew Xwedê  
 pê evdên xwe dide tirsandin. Hey evdên min! Vêca  
 xwe ji bêdiliya min biparêzin..

قُلْ يَا عِبَادِيَ الَّذِينَ أَسْرَفُوا عَلَىٰ أَنفُسِهِمْ لَا تَقْنَطُوا مِنْ رَحْمَةِ  
 اللَّهِ إِنَّ اللَّهَ يَغْفِرُ الذُّنُوبَ جَمِيعًا إِنَّهُ هُوَ الْغَفُورُ الرَّحِيمُ {53}  
 وَأَنِيبُوا إِلَىٰ رَبِّكُمْ وَأَسْلَمُوا لَهُ مِنْ قَبْلِ أَنْ يَأْتِيَكُمُ الْعَذَابُ ثُمَّ  
 لَا تُنصَرُونَ {54} وَاتَّبِعُوا أَحْسَنَ مَا أُنزِلَ إِلَيْكُمْ مِنْ رَبِّكُمْ  
 مِنْ قَبْلِ أَنْ يَأْتِيَكُمُ الْعَذَابُ بَغْتَةً وَأَنْتُمْ لَا تَشْعُرُونَ {55}

53- Bibêje, Xwedê dibêje: Hey evdên min  
 yên ku di heqê kesîtiyên xwe de zêdekarî kirine!  
 (pirr guneh bi kar anîne). Ji dilovaniya Xwedê  
 bêhêvî nebin. Birastî Xwedê gunehan hemiyan  
 dibexîşîne. Birastî ew e yê gunehveşêr, yê dilovan  
 her bi xwe ye.

54- Ca di beriya ku azarek bi ser we de bê  
 paşê arîkariya we neyête kirin li perwerdegarê  
 xwe vegezin û xwe jê re berdest bikin.

55- Û di beriya ku azar ji nişka ve, bêyî ku  
 hûn pê bihesin bi ser we de bê, ji wehya ku ji we  
 re hatiye daxistin bidine dû ya herî rind.

الْأَحْلَاءِ يَوْمَئِذٍ بَعْضُهُمْ لِبَعْضٍ عَدُوٌّ إِلَّا الْمُتَّقِينَ {67} يَا عِبَادِ  
 لَا خَوْفٌ عَلَيْكُمُ الْيَوْمَ وَلَا أَنْتُمْ تَحْزَنُونَ {68} الَّذِينَ آمَنُوا  
 بِآيَاتِنَا وَكَانُوا مُسْلِمِينَ {69} ادْخُلُوا الْجَنَّةَ أَنْتُمْ وَأَزْوَاجُكُمْ  
 تُحْبَرُونَ {70} يُطَافُ عَلَيْهِمْ بِصِحَافٍ مِنْ ذَهَبٍ وَأَكْوَابٍ  
 وَفِيهَا مَا تَشْتَهِيهِ الْأَنْفُسُ وَتَلَذُّ الْأَعْيُنُ وَأَنْتُمْ فِيهَا خَالِدُونَ  
 {71} وَتِلْكَ الْجَنَّةُ الَّتِي أُورِثْتُمُوهَا بِمَا كُنْتُمْ تَعْمَلُونَ {72}  
 لَكُمْ فِيهَا فَاكِهَةٌ كَثِيرَةٌ مِنْهَا تَأْكُلُونَ {73}

67- Ji yên xweparêz pêştir dost wê rojê ji hev  
 re dijmin in.

68- (Xwedê ji wan xweparêzan re dibêje):  
 Hey evdên min! Îro tirsek li ser we nîne, ne jî  
 hûn mirûz dibin.

69- Ewanê ku bawerî anîne û (ji Xwedê re)  
 berdest bûne.

70- (Ji wan re tête gotin:) Hûn û jinên xwe  
 bi şehnazî bikevine bihiştê.

71- Tepsiyên ji zêr û şerbik li ber wan tene  
 gerandin û di wê (bihiştê) de ya ku dilê mirovan  
 bibijê û çav jê xweşhal bibin heye. Hûn bi xwe jî  
 di wan de nemir in.

72- Ca ew bihiştê ha ye, ya ku bi sedema  
 rindiya we pêk tanî, hûn pê hatine xelatkirin.

73- Di wê (bihiştê) de ji bo we mêwekî pir  
 heye. Hûn her jê dixwin.

Enkebût: 56-59

Zumer: 10

Zumer: 15-16

Zumer: 53-55

Zuxruf: 67-73



# Dîn û exlaq

TAHIR SÎDAR

Eger mirov pêşî li van he rdu peyvan binêre, mirov dê bibêje qey her du peyv tèn eynî me'neyê, yan jî me'neya wan gelek nêzî hev e.

Belê di heqîqeta xwe de ne wisa ye. Dîn, ji teref Xwedê ve bi wasîteya pêxemberan ve ji civakan re hatine. Hinek ji wan pêxemberan

kitêbên wan ên muqeddes hene (mîna Quran, Încîl, Tewrat, Zebûr) ku ji wan re dibêjin "resûl" û hinek jî kitêbên wan ên dînî tunene. Ji wan pêxemberan re jî dibêjin "nebî".

Ên ku kitêbên wan ên dînî hene, li gorî qaîde û destûra wan kitêbên muqeddes civak hişyar



kirine; rê û rêbazên dînî nişanî wan dane. Qencî û xerabî li ser rêbazên wî dînî ji civakê re şîrove kirine. Civak daxwazî rêya rast kirine.

### **Di navbera dîn û exlaq de têkiliyek çawa heye**

Elaqeyên ubûdiyetê yanî wezîfeyên insan li hember Xwedê çi ne, çi nînin; ji civaka xwe re dane şîrovekirin. Her pêxember ji civaka xwe re wextê behsa peywiran dike, di 'eynî wextî de, qala mukafatan jî dike. Bi gelemperî ew mukafat jî, hema bêje di hemû dînên semawî de navê wê "cennet" e. Yanî wateya vê ev e; insan dê karekî bike, ji Xwedê re îbadetê bike; di bedêla vê îbadeta wî de, Xweda jî dê mukafatê bide wî. Bi awakî din eger em vê şîrove bikin, ev tê me'neya "dan û standinê". Bi me'neya ku mexlûq erka xwe anî cîh, Xweda jî mukafata wî dayê.

Ev şîroveyên me li jor kirin ne menfî ne (negatîf), berevajî vê erênî ne. Xweşî û hizûrê dide insanî, umîd û xeyalên wî geş dike. Qesda me jî ew e ku em dîn û exlaq bi awayekî cuda şîrove bikin.

Vêca em bînin ser meseleya exlaq. Bêguman têkiliyên nêzik di navbera dîn û exlaq de hene.

Ji ber vî qasî, her axaftina ku dabaşa dînî tê de hebe, dabaşa exlaqî jî tê de heye. Ma ne ji ber hindê ye, di dibistanên fermî de navê pirtûka xwe jî danîne "Çanda Dîn û Zanîna Exlaqî" (Dînî Kulturû ve Ahlak Bilgîsî)

### **Bingeha exlaqî ji derûniya insanî tê**

Belê, wextê mirov kûr lê binêre, dê ferqeke mezin di navbera wan de bibîne. Bingeha exlaqî, ji derûniya insanî tê, ji wijdana şexsiyeta wî tê û ji çanda ku mirov tê de dijî tê. Lewra li cîhên ku dînên semawî lê tunene jî exlaq heye, an jî beriya ku dînên semawî ji xelkê welatekî werin jî lê wê derê exlaq tişteki esasî bû. Çimkî eger exlaq tunebûya, civak dê jî nebûya; xîmên çêbûna civakê li ser qaîdeyên exlaqî têt avakirin. Bingehê felsefeya exlaqî li ser "qencî û neqenciyê" ye, li ser "başî û xerabiyê" ye. Ne li ser "dan û standinê" ye,

ne jî li ser "kar û zerarê" ye. Di felsefeya exlaq de kar û zerar tune ye. Mirov ne ji ber ku kara wî ya maddî tê de heye exlaqê xwe xweş dike. Lê ji ber ku dibêje ez insan im, ez mirov im, erkeke min heye, wijdanek min heye, li gorî vê wijdanê, li gorî vê erkê ezê hereket bikim. Min çi ji xwe re bivê, ezê wê ji hevalê xwe re jî bixwazim.

Ev heqîqetek e ku di nav civakê de hatiye qebûl kirin. Însanê ku exlaqê wî saxlem be, tiştê ku ji xwe re dixwaze muheqeq dê ji hevalê xwe re jî bixwaze. Ew xêr û xweşiya ji xwe re divê, lazim e ji civakê re jî bivê. Heta carinan di hinek karan de menfîetên şexsî nebin jî, ji ber xatirê xêr û xweşiya civakê mirov divê wî karî bike.

### **Dîndarî û exlaq du tiştên cihê ne**

Me li jorê jî gotibû, dîndarî û exlaq du tiştên cihê ne. Pir mirovên dîndar hene, wezîfeyên xwe yê dînî di wextê xwe de tînin cih. Îbadetên xwe her demê bêkêmasî tînin cih, lê belê cira wan di serî de bi jin û zarokên wan re ne xweş e. Qîmetê nadin cîranên xwe. Daîma menfîetên xwe yê şexsî datînin ber çavê xwe. Xêr û xweşiya civakê ji xwe re nakin meraq. De vêca em bifikirin ka mirovên hizr û mitala civakê nekin, bes ji menfîetên xwe re xizmetê bikin, hema çi qas dîndar bin bila bibin, civak dê çi sûtê ji wan wergire?

Li milê din, em dinêrin hinek mirov hene, an jî binî ve bawerî bi tu dînî neanîne, yan jî bawerî pê anîne, bes sist in, bêxîret in yan jî bêmera qin. Îbadeta xwe di wextê xwe de naînin cih. Lê belê exlaqê wan xweş e, bi mirovên xwe re, bi cîranên xwe re wextê xwe baş diborînin; xêr û xweşiya ji xwe re divên ji yê dîn re jî divên, civak ji wan hez dike. Cihêki musbet di nava civakê de ji xwe re girtine.

Deka em van jî bînin ber çavê xwe û em muqayese bikin. Emê kîjan ji van herdu qismê insanan bicibînin? Emê hevaltî û dostaniyê bi kîjan qismî re bikin? Emê bîr û baweriya xwe bi kîjan qismî bînin?



# Bavê li dû qîzên xwe

M. XALID SADÎNÎ

**L**i welatê me mirovekî jixwehez, xanedan û bi mal û e'yal hebûye. Vî camêrî 6-7 kur û sê keç jî hebûne. Kurên wî karker û xebatkar bûne, mirovên camêr û xwenas bûne. Lê mirov nedikarî heman xasyetên kuran jî bo keçan jî bêje. Lewra dema kêça mêrik mezin bû, hê xwe negirtî ku camêrek bêtin bixwaze da ku babê wê, wê bi emrê Xwedê û bi qewlê

pêxember bide mêr, keçikê xwe daye revandin.

Piştî keçikê xwe daye revandin babê wê jî xwe şerm kiriye, êdî serê wî di nav mirovên wî de ranebûye, jî ber hindê mala xwe bar kiriye çûye gundekî dûrî gundê xwe. Dema çûye gundê xwe yê nû, disa mal û halê xwe berhev kiriye. Bo xwe milk peyda kiriye û hem jî giramiya xwe peyda kiriye. Lewra mezinên me Kurdan jî

gotine: "Mala zêran xerab e, mala mêran ava ye" yan "mal mala mêran e." Gelek kurên vî camêrî jî hebûne û dîsa mala xwe ava kirine.

Lê tu were bibîne, mala heft mêran bi xwîdana xwe ava kiriye, keçeke serrizî bi keyfa xwe ya çend seetan xera dike. Nebêje keçika duyê ya vê male jî hê jî nû gihîştîye demê zewacê, xwe li gel zirkurekî daye revandin. Dê were

piremêro, feqîro dîsa mala xwe daye pişta xwe, ji wî gundî jî çûye gundekî din.

Dîsa kurên wî dest pê kirine bo xwe xanîyek ava kirine, hal û kar û barê xwe durist kirine û dest bi jiyana xwe kirine. Sal boriye, zivistan qediyaye şînatîya biharê hatiye. Kuran gotine babe xwe:

“Babo em daran biçînin baş e. Lê ka tu çi dibêjî em çi daran, li ku biçînin?”

Babê wan:

“Ne lawên min, ez nizanîm hûn dê çi daran li ku biçînin. Herin bêjine xwişka xwe ka em daran biçînin yan ne?”

Xwişka wan ji wê ve serê xwe rakirîye û wiha gotiye:

“Estexfirullah... babo tu çi dibêjî. Ma ez çi dizanim ka hûn dê çi daran biçînin. Tu û birayên min dizanin.”

Babê wê gotiye keçikê:

“Ne keçika min, ne ez ne birayên te nizanin, tu dizanî. Ka bêje em daran biçînin yan ne?”

Keçikê gotiye:

“Babo, ez rebana Xwedê çi dizanim. Tu dizanî.”

Babê wê wiha bersiv daye:

“Ne bi Xwedê, em nizanin û tu ji me hemiyar çêtir dizanî. Lewra heke tu ji dê wekî xwişkên xwe yên mezin xwe bidî revandin ji xwe hewca neke ku em dara biçînin. Ji ber ku em dê xwe li hêviya te bigirin, mezin bibe, pênc

– şêş sal din tu jê dê bê dema zewacê. Heke tu jî dê xwe bidî revandin, oxira te ya xerê be, here. Em jî dê biçin gundekî din û li wir mala xwe ji nû de ava bikin. Ne heke tu xwe nadi revandin, jixwe em dê darên xwe biçînin û dema tu jî mezin bûyî, emê bi emrê Xwedê te jî bidine camêrekî.”

### **Korê Çav Berdaye Malê Xelkê**

*Dibêjin, li gundekî*

*Kurdistanê jin û mêrek hebûne. Carekê sed zêr ketine destê wan. Wan jî xwestiye ku herin bajêr û ji xwe re danûstendineke baş bikin da ku li xwe zêde bikin.*

*Kerekî wan jî hebûye, li kerê xwe siwar bûne “ya Ellah, ya Xwedê” gotine û dane rêya bajêr. Di rê de li ser mirovekî teşqilî ne, piştî “oxir be û oxir baş be” “xweş û bêşê” ditîne ku ew mirov kor e. Ji mirovê kor pirsîne ka bi ku de diçe, kor jî bersiv daye ku ew jî diçe bajêr û rêya wan yek e. Mêrê jinê xwestiye ku yê kor bihêle û xatirê xwe jê bixwaze, bi ser rêya xwe de here. Lê jinikê gotiyê:*

*–Evdê Xwedê, ev camêr kor e, guneh e. Axirî em jî diçin bajêr, bila li kerê me siwar bibe, emê jî bikevine pêşiyê heta bajêr bi hev re herin. Li wir emê herin karê xwe ew jî dê here bi oxira xwe de.*

*Herçiqas mêrê jinikê gotiye:*

*–Keçê evda Xwedê, merivê kor bela ne. Ev mêrikê kor dê belayekê bine serê me. Me ji wi çi ye?*

*Lê jina xwe qanîh nekiriye. Mecbûr ê kor li kerê siwar kiriye û dane rê ji bo bajêr.*

*Piştî qederekê bi rê ve çûne sobbet dest pê kiriye û peyv li pey peyvê hatiye, gotin li dû gotinê webûye û mijar gihîştîye ser zêran. Sed zêrên mêr û jinê hebûn û diçûne bajêr da ku danûstendinê bikin. Ê kor pir xînez bûye û xwestiye ku zêran bi dest bixe, wiha gotiye:*

*–Xwezî min giraniya sed zêran zanîba... xwezî min giraniya sed zêran zanîba...*

*Û serê du sê deqîqeyan ev gotina xwe dubare kiriye heta ku jinikê wiha gotiye mêrê xwe:*

*–Evdê Xwedê ka zêran bidê, bila hinekî hilgire da ku giraniya sed zêran bizane. Xêr tê de heye. Belku deh zêr jî li cem hev neditibin rebenê Xwedê.*

*Herçiqas ku mêrik dîsa gotiye:*

*–Keçê evda Xwedê, em zêrên xwe nedin wî korê heram. Kor bela ne, dê belayekê bine serê zêrên me.*

*Lê nikariye jina xwe qanîh bike. Mecbûr maye kîskê zêran daye destê yê kor.*

*Dema korê me kîsikê zêran girtiye destê xwe bi kêfxweşî gotiye:*

*–Giraniya sed zêrî çiqas xweş e, giraniya sed zêrî çiqas şîrîn e... giraniya sed zêrî çiqas bêneveker e.*

*Heta ku nêzîkî bajêr bûne. Jin û mêr, herdu jî dilsaf in, çu*

guman nekirine heta ku hatine nav bajêr li nav bazarê sekinîne.

Dema hersê heval hatine nav bajêr, li cem bazarekê sekinîne ku êdî ji hev veqetin ê kor dengê mirovan bibîstiyê û fêm kiriye ku êdî xelk li dora wan hene, di dilê xwe yê reş de hîle û hewali derbas kirine. Mêrê jinikê jî gotiye yê kor:

-De kerem ke were xwarê. Vaye bajêr, her yekî ji me dê here rêya xwe. Yê kor gotiye:

-Baş e bira oxira te ya xêrê be. Tu bi ku ve dixwazi bi wê ve here.

Mêrik gotiye:

-Ê de were xwarê jî kerê min da ku ez bi ser rêya xwe de herim.

Lê dema yê kor ev gotin bibîstine wiha gotiye:

-Kuro bavê min, ker kerê min e, te serê wî girtiye heta ez anîme vê derê. Ma tê kerê min ji min bistîni? Ezîzê min here bi rêya xwe de.

Dema mêrik ev gotin bibîstine, zaniye ku kar tevlihev bûye, gotiye:

-Baş e bavê min. Tu miroveki bêçav î, bila ker ji te re be. Lê ka sed zêrên min bide min, ezê bi rêya xwe de herim.

Vê carê disa yê kor kiriye qêrîn:

-Hey lo, ma kes nîne li van deran! Ev xurte min dişêlîne, pêşî kerê min zeft kir niha jî zêrên min dixwaze. Ji bo xatirê Xwedê min ji destê vî talankerê rizgar bikin.

Xelk û alema li dora wan ev gotinên kor bibîstine û hatine cem wan. Bi mêrikî de xeyidîne û gotinê:

-Ma tu şerm nakî tu vî korê hafîzê Xwedê dişêlîni?

Mêrik nêriye ku hal nexweş bû gotiye jina xwe:

-Keçê were em herin, min gotibû te kor bela ne. Te bi gotina min nekîr. Tu mayî di destê min de, were em ji vir herin."

Vê carê disa yê kor kiriye hawar û qêrîn:

-Hey hewar ji bo Xwedê! Ma kes nîne bi hawara min de bê. Ez kor im, jina min min dihêle bi vî xortî re direve.

Xelkê jî mêrik girtiye û ji ber ku qelebalix hatiye ser hev polêsan jî ew ditine û hatine cem wan bi kê çî ye. Dema meselê hîn dibin, jinikê û mêrê wê digel ê kor birine mehkemê cem qazî.

Qazî îfadên pêşiyê wergirtine. Mêrê jinikê hal û hewalê xwe ji serî ve, ka çawa derketine rê, çawa ew kor ditine, çawa nexwestiyê hevaltiya wî bikin, lê jina wî çawa îsrar kiriye hemî jî qazî re gotine. Jinikê jî gotina wî tesdîq kiriye.

Lê yê kor bi tevayî dijî wan gotiye, li jinê, sed zêran û kerî xwedî derketiye. Serê qazî tevlihev bûye. Ferman daye ku hersêyan hebis bikin, lê her yekê bixine odayekê û li ber deriyê her yekê jî nohedarek hebe û li gotinên wan guhdari bike. Paşî jî bên û gotinên wan ji wî re bêjin.

Nobedarê ber deriyê jinikê dema ku hatiye wiha gotiye qazî:

-Ezbenî, dema ku me jinik dakir, jinikê qederekê li xwe da, giriya û paşê jî wiha got: "Ax ax ev hemî heqê min e, ma kê gotibû min rehmê bi vî mel'ûnê kor bike! Mêrê min gote min, kor bela ne, em xwe tev wan nekîn. Lê min barwer nekîr. Aha çî hate serê min... di zêran û kerî de xwe li min jî dike xwedî... ya rebbi tu arikarê me be..."

Nobedarê ber deriyê mêrê jinikê jî wiha agahî daye:

-Ezbenî dema me mêrik xiste hucrê, qederekê çû û hat, pêşiyê "tehem, tehem" a wî bû, paşê min bibîst ku wisa dibêje: "Aha keça kerê, xwezî tu ne jina min bayî, jina korekî mel'ûn bayî! Min gote te em kor li kerî siwar nekîn. Te got guneh e. Min got em zêrên xwe nedin destê wî, te got xêr tê de heye. De here bila te jî ji xwe re bibe... da ku baş bêna te derkeve keça...!"

Nobedarê yê kor jî wiha got:

-Ezbenî kor pir kêfxweş e. Min bibîst ku ji xwe re dibêje: "Heke ker gihîştê min baş e, heke ker û zêr gihîştine min fit e, heke ker û zêr û jin gihîştine min welle fitan û fit e." her ev gotin ji xwe re digotin û fitelita wî bo xwe diavêt.

Qazî gazî girtiyan kir. Jina mêrikî, kerê wî û zêrên wî danê û gotê here oxira te ya xêrê be. Kor jî ceza kir.

# Ji folklora Kurdî gurg û hêstir\*



**D**ibêjin carekê gurgî got, “ezê tobe bikim, êdî ev dirindî û eşandina xelkê bes e. Ezê rêka hecê bigirim û paşê hecê jî li koşeyekê bo xwo rûnim, dest bi peristina (ta’eta) Xwedê bikim, heta ku emanetê xwe ji min werdigire.”

Gurgî lêda hêdî hêdî li ser xwo bi rê ket û çû. Birsê ew roj bo rojê bêhêz kir, heta ku welê kir ku kulefa bû, ji birsan lakelaka wî bû. Rojekê ji dûr ve çavê wî bi hêstireke azakirî ket. Ji xwe re got, “Xwedê di sixintî û tengaviyê de heram helal kiriye, va ye ezê ji birsa bimirim, bila min tobe jî kiribit û biçime hecê jî, ji bo min helal e ku ez vê hêstirê bixwim. Ji ber ku heke nexwim dê bimirim û dê ji hêz û vejen ve kevim.

Îbadeta Xwedê  
jî bi min ve  
nahêt ez



bikim.” Ber bi hêstirê ve çû û diranên xwe tûj kirin. Tam bi devê wî ket. Hêstirê gotê, “gurgo wexera xêrê bit, tu û di vê deştê de, wesa hêdî hêdî li ser xwe diçî û ber bi min ve têyî?!”

Gurgî gotê, “wexera me xêr bit, min divêt biçime hecê, belê ez kulefa me ji birsan. Bi şer’î ji min re helal e ku ez te bixwim. Ez hatim te bixwim û paşî biçim.” Hêstirê gotê, “wey tu gelek bi xêr hatî. Xwedê heca te qebûl ket. Bi rastî ez jî ji vê jînê têr û wers bûme û min divêt jê qurtal bibim. Belê mamê gurg, gurgê mino tu bi xwo jî dizanî gelek ayet û hedîs li ser vê pendê hene, ew jî ev e: Heke candarek hate serjêkirin divêt bi awayekî wisa serê wî bête jêkirin ku zû canê wî ji ruhê wî derkevit.

Niha bizane ez di dema xwo de ku hatime nalkirin, bizmarek di dema nalkirinê de bo çî di goştê piyê min re neçe. Ew min gelekî diêşîne, çu hedan ji ber wî nakeve canê min. Tu ji dest bi xwarina

min bikî di gel jan û êşa min, ev kar berovajî tirsaxwedê û rêya ku te berê xwe dayiyê. Heke tu bi zehmet nezanî ji rê ve wî bizmarê çûye di min re bîne der û paşî bi dilê xwe min bixwe. Tu dê xêran bibînî.”

Gurgî gotê, “tu rast dibêjî, ka bizmarê ku di piyê te re çûye?” Hêstirê piyê xwe bilind kir û şanî gurgî da. Gurgê me li ser xwo limbûsa, xwe dirêj kir da ku bizmar ji piyê wê bîne derê.

Her di wê gavê de hêstirê panîyek li dev û limbûsa gurgî da, hemî didanêt wî ji devê wî xistin xwarê û gurg li wê derê bêhişt xist û lêda çû. Paşî gurg hate ser hiş û birêt xwe, li xwe nêrî dît ku ketiye ji halî de, dilê wî bi wî şewitî û got, “Xwedê girtiyo gurgo! Babê te nalbend bû! Bapîrê te nalbend bû? Tu li ku û nalbendî li ku? De bixwe, bila ev derdê te bit.

\* Ziman û Edebê Kurdî, bo Polî Sêyemî Nawendî, Çapê Şeşem 1980, berper 150-152.

# Çend letîfeyên letîf

HAŞIM ÖZDAŞ

## Ew Bi Dîrhemekê ye

Ebdurrehman kurê Mexled got: Pîrekekê nanek da zilamekî ku li ser goran Qurana dixwend û jê re got ku li ser gora kurê min jî bixwîne. Zilam jî ayeta 48an ji sûreyê Qemer “wê rojê, gava li ser ruyê xwe di êgir de tîn xijiqandin, ji wan re tê gotin: de heydê agirê cebnemê tam bikin.” xwend.

Pîrekê ji zilam pirsî, ma li ser goran wiha tê xwendin?! Zilam berisva wê da: Ma tu bi nanekî çi ji min dixwazî? Eger tu ayeta 54an ji sûreyê Rehman “Xelkê cennetê li ser doşekan paldayî ne ku betanê wan ji hevrişimê stûr e. Mêweyê her du cennetan nêzik in.” dixwazî, ew bi dîrhemekê ye.

## Mezinê Fuqehayan

Humeyd et-Tûsî dere huzûra xelîfe Memûn û li ba

wî jî Bişr el-Merisî heye. Xelîfe ji Humeyd dipirse: Tu dizanî ev kî ye? Humeyd dibêje: Nexêr ez nizanim kî ye. Xelîfe dibêje: Ev Bişr el-Merisî ye. Humeyd dibêje: Ey emîrê muminan ev mezinê fuqehayan e. Wî ‘ezabê qebrê, mesela munker û nekîr, mêzin û pira siratê rakir. Ka binêre, bê nikare mirinê jî ji holê rake? Wê deme bi rastî jî wê bibe mezinê fuqehayan!

## Ne li Hêsirên Çavên Wî Lê Belê li Karê Destê Wî Binêre

Nêçîrvanek, di rojêke bi bager de diçe nêçîra çivîkan. Ji ber toz û terpela ku bi sedemê bagerê radibe û dikeve çavên wî, hêsir jê dibarin. Nêçîrvan her çivîka ku bi dest dixê bazikên wê dişkênê û dixê tûrikê xwe. Çivîkek jî hevalê xwe re wiha dibêje: Tu dibînî bê ev nêçîrvan çi qasî diltenik

û dilbirehm e, ma tu hêsirên çavên wî jî nabînî? Hevala wê wiha bersivê dide: Tu li hêsirên çavên wî nenêre, belbî li karê destî wî binêre.

## Ji Kesekî re Nebêje ku Min Tu Xelas Kiriya

Heccacê Zalim, li Kenda Fars serê xwe dişo û hindik dimîne ku di avê de bifetise. Lê belê bi arîkariya Misilmanekî xelas dibe. Gava digihêjin bejahiyê Heccac jê re dibêje: Tu çi ji min daxwaz biki ezê bi cih bînim. Zilam dibêje tu kî yî, heta ku tu bikaribî daxwaza min bîni cih? Dibêje, ez Heccacê es-Seqefî me. Zilam dibêje: Daxwaza min ji te ew e ku tu bi xatirê Xwedê kî ji kesekî re nebêje ku min tu xelas kiriya.

# Fiêleke baş bedelê şêstûşes fendên belaş e

M. XALID SADÎNÎ

Carekê ji caran rehmî li dê û bavê xwendevanan. Ji xeynî cendîrme û tehsildaran.

Dibêjin ku carekê qurebeşek li nav dehl û daristanekê ji xwe re li nêçîrekê digeriya. Heta nêzî nîvrojê ji xwe re li xwarinekê geriyaye, lê hê ji tiştekî layiqî devê xwe nedîtiye. Tam di wê navberê de rêya wê bi ser roviyekî ketiye. Pir kêfa qurebeşê hatiye ku rovi dîtiye. Lewra li gor qurebeşê rovi qurnaz û bînefs bûye. Heke rovi ji bike şîrikê nêçîrê dê her du bi hev re nêçîrên baş bikin. Bi van hizr û bîran ji rovi re gotiye:

-Oo mamê rovi merheba ji te re. Kerem ke were, ev çend roj in ez li te digirim xêr e tu li ku bûyi?

Rovi ne jidil, bi serê lêvan wiha bersiv dayiye:

-Merheba, merheba... te xêr

e tu li min digeri? Ya ez pê dizanim, tu dostaniya me nîne.

-Waa, aha dê mamê rovi tu çawa wisa dibêji? Em milletê qurebeşê her demê dostê roviyan in. Ma me hindik nêçîr bi hev re kirine û me xweşi û şahî bi hev re borandine.

-Temam, tamam. Bêje ka te çi divê?

-Ezbenî ma ezê çi bivêm, ji xeynî xêra te û serfiraziya te pê ve? Lê ez dibînim ku tu bi tenê digeri, ez hizir dikim ku heke tu min layiqî hevaltiya xwe bibînî û em bi hev re ji bo xwe nêçîrê bikin, belku Xwedayê mezin rizqê me çêtir û zêdetir bide.

Çawa rovi ev teklîfa qurebeşê bibîstiye, di dilê xwe de pir aciz bûye, bi awayekî biçûkxistî lê nêriye û gotiye:

-De here wê ve lê, molka

pîs! Ez û hevaltiya te. Ez rovi me. Roviye serbaz im, xwediyê şêst û şeş fendan im. Tu nikarî hevaltiya min bikî. De ka bêje tu çend fend û fêlan dizani?



Qurebeşa feqîr ji wê bersivê aciz bûye, lê bi xwe neaniye der, di binî re girtiye, li ber dilê rovi

geriyaye û bi zimanekî pir nerm gotiye:

-Mamê rovi, ez dizanim tu serbaz î, xweyiyê şêst û şeş fendan î, aqildarê daristanê yî, zanyarê hemî heywanan î... jixwe ji ber hindê ez dixwazim hevaltiya cenabê te bikim. Hindi ku ez im, ez feqîreke jar im, xwedan eyal û zarok im. Ez tenê fendekê dizanim, lê heke tu bibêlî ez bibim hevala te belku carekê ez jî mifayekê bigihînim te.

Rovî bi van gotinan piçekî nerm bûye û gotiye:

-Wele hûn qurebeşe nezan û cabil in, lê madem bapîrên me yek in û niha em eşîrên bira ne, bila be, were cem min. Êdî emê bi hev re bin, lê bi şertê ku tu ji gotina min dernekevi...

Qurebeşê gotina rovi qebûl kiriye û bi wî hawî destê biratiyê dane hev û ji xwe re li nêçîrê geriyane. Dema şens û talihê yekî derbas bû kes nikare bigire. Ji ber hindê jî her du dost dema gihîştine nav rezekî her sê alî girtî û revexên peldar, dîtine ku hirçeke birçî, laqelaq ji birçîna jê tê û bêhna zikê wê yê birçî diçe ber hewa. Tam di nava rêya

wan de ketiye ser çarlepken xwe û li hêviya xwarinekê ye. Rovi û qurebeşe bi hev re hirç dîtine, lê hirçê ew dîtibûne îdî. Her duyan jî dilê revê hebe ji zanîne ku di wî delîwê teng re nikarin ji lepê hirçê xelas bibin. Ji ber hindê, qet xwe nelivandine, hirç jî ji cihê xwe ranebûye. Lê serê xwe hejandiye, miremir kiriye û di dilê xwe de gotiye:

-Xwedê, Xwedê tu çi qas mezin î! Ez ji sibehê beta niha li xwarinekê digeriyam, hema roviyek, qurebeşek, kiroşkek, qe nebe mişkeki mezin ji bi dest min ketiba ji bo min bes bû. Lê min tiştek peyda nekiribû. Ez ji birçîna bêhêvî hatim ketime vir, êdî min xîret nedikir ji cihê xwe rabim. Lê te ev her du anîne ber devê min. Şikir ji bo te Xwedê...

Dema hirçê ev axaftina dirêj di dilê xwe de digel razîqê xwe dikiriye, qurebeşê jî maye li benda rovi ku fiêl û fendekê xwe bixebitîne da ku wan ji destê hirçê xelas bike. Lê qurebeşê ditiye ku rovi rengzer bûye û diricife, nizaniye ka dê çi bêje ji tirsê hirçê. Mecbûrî qurincokê li ranê rovi daye û gotiye:

-De mamê rovi, xwedanê şêst û şeş fendan, fiêleke xwe bide xebitandinê û me ji destê wê hirçê derxe. Yan na emê bibin taştiya wê.

Lê rovi ji tirsan her gotinên qurebeşê nebihîstiye, hema ricifiye, leriziye û ji tirs û xofan bilerz gotiye qurebeşê:

-Mala min xerab be heke tiştek bi tenê were bira min, qet û qet tiştek nayê hizrê min. Min ilmê xwe hemî jibir ve kir.

Qurebeşê ji reng û rewşa rovi baş ewle bûye ku tu xêr ji şêst û şeş fenden rovi nayên. Mecbûr penceke xwe avêtiye dûvê wî û kêşaye pişt xwe û bi ber rovi ketiye çûye cem hirçê û bi dengekî nerm wiha gotiye:

-Silava Xwedê li te be ey şahê daristanan. Ey padişahê wî dehlî û hemû dehlan. Em dizanin ku şêr li ber te çu nîne. Mezin û axayê me tu yî. Vaye ez û rovi ji bo taştiya te hatine. Heçî tiştê tu bixwazî, dikari biki.

Dilê qurebeşê hebûye ku dirêjtir bike pesindana xwe, lê hirçê firset nedayiyê. 'Orînek berdaye û gotiye:

-Bes e, bes... dev ji van gotinên pûç û belaş berde. Tu dizanî ku ezê niha we bixwim. Vêca ew lewçeyiyên te çi ne ku tu dikî? Ka bêje hûn ji ku ve tînen?

Çawa ku qurebeşê ditiye hirçê xwe rasterast neavêtiyê û di ser de jî pîrsek jê kiriye kêfa wê hatiye cih. Ji bo ku ronahiyeke xelasbûnê ditiye bi şadî gotiye:

-Ezbenî, her çi gava tu bivê tu dikarî me bixwî, jixwe em taştê û firavîna te ne. Em pîr dilxweş in ku bigihên nav hinavên qralê xwe. Lê berî ku tu me bixwî derdekî me heye. Heke tu destûrê bidî ez bêjim, paşê tu çawa dixwazî bila wisa be.



-Bêje ka derdê we çi ye?

-Ezbenî, ez û roví wê bihara borî di kunekê de zayîn, me her duyan pênc tîjîkên dinyayê. Paşê jî me bi hev re mezin kirin. Niha mezin bûne. Sê heb ên min in, du jî yên roví. Lê roví qebûl nake, dibêj, nexêr sê yên min in du jî yên te ne, ji ber wê yekê jî em li hev nakin. Em hatine ku tu şerîeta me bibirî. Paşê jî tu çawa dixwazî wisa li me û eyalê me bike.

Dema hirçê ev gotin û behsa pênc tîjîkên mezinbûyî ji qurebeşê bibistine kêfek hatiye û av ji devê wê hatiye xwarê. Bi kêf û qêrîn gotiyê:

-Ka eyalê we li ku ye? Binin vir.

-Ezbenî, kuna me ne dîr e, aha li ber wî girîkî ye. Kerem ke em bi hev re herine wir.

Qurebeşe bi pêşiyê ketiye hirçê daye dû wê, roví jî ketiye dawîya tevan ku delîva revê bibîne, lê nekariye.

Qurebeşê daye nav rizdeberê, li ciyekê teng geriyaye ku ew û roví bikarin tê re derbas bibin lê hirç nekaribe. Vir ve, wê ve, dawiyê kuneke wisa ditiye û gotiye:

-Aha di vir de ne, bi destûra te be ez herim binim.

Hirç jî pir westiyabûye, bi zorê xwe girtiye ku lepekê li serê roví nede û wê nexwe. Bi hêrs gotiye qurebeşê:

-Zû bike, dereng e. Ez lê binêrim û şerîeta we bibirim,

paşê ez dizanim ezê çi bikim. Zû here bine.

Qurebeşê xwe hêdika veze-landiye kunê û êdî derneketiye. Bes di wê navberê de roví pir gêj û mişawîş bûye, çermê serê wî rabûyî bûye, serê wî gij bûye. Nizaniye ka dê çi bike û dê çawa ji destê hirçê xelas bibe. Digel van hemî zikêşiyên nizaniye ka qurebeşê çi dike. Qurebeşê jî çendak e ketiye kunê û hêj derneketiye. Bêhna hirçê jî teng bûye û gotiye qurebeşê:

-Keçê qurebeşê, ka tu li ku mayî, ji bo çi nayê? De tîjîkan bine û were.

Qurebeşe ji jor ve bi dengê nerm wiha bersiv dayiye:

-Mîre min, ez nikarim tevan bigirim, roví jî bişîne arikariya min.

Hirç pir aciz bûye û pibênek li qûna roví daye û gotiyê:

-De here arikariyê bike seg-bav, tu çi dikî li wê derê tîjîkê heram! De here û zû binin.

Rovî jî ketiye kunê çi bibîne, qurebeşê li cihê xweş bêhn vedaye û dikene. Roviye nezan, nizaniye ka çi dibe û ji ber hindê pirsîye ji qurebeşê:

-Keçê ew tu çi dikî li wir, kanê tîjîk?

-De were rûnê ehmeqê xwelîliser, tîjîkên çi, halê çi! Bi zor em ji lepê hirçê xelas bûn, ma êdî tu çi divê?

Roviya feqîr nû tîgîhîştîye ku mesele çi ye û çi diqewime...

Bi tîgîhîştîna meselê ji eqilê qurebeşê teqdîr kiriye, lê hê jî ji hirçê ditirsiyaye. Li aliyê din, hirç li derve pir aciz bûye, jixwe ji sibeha Xwedê heta wê demê li pey nêçîrekê bûye. Pir birçî bûye. Çawa ditiye ku qurebeş hê jî der-nakeve bi qêrîn gotiyê:

-Ev hûn ji bo çi dernakevin? De zû werin, tîjîkên xwe binin da ku ez şerîeta we bibirim.

Qurebeşê bi awayekî rehet û kêfxweş bersiv dayiye. Lewra dizaniye ku hirç, çi ji bike êdî nikare wan bigire. Ji ber hindê wiha gotiyê:

-Ezbenî kêmasiya me bibexşîne û li qusûra me nenêre. Me şerîeta xwe di nav xwe de birrî. Tîjîkên dûvdîrêj ên roví ne, yên dûvkurt ên min in. Vêca tu jî heta wir westiyayî mixabin, zehmet bo te ma. Êdî here, bi xêr û selamet herî...

Hirç pê hesiyaye ku qurebeşê ew xapandiye, bes zaniye ku êdî nikare tiştê bike. Çendaki li wir maye û piştî nesekiniye û ji wir çûye.

Êdî baş hatiye zanîn ku fiêleke baş bedelê şêstûşê fendên belaş e.

# Ewan bi navê Xwedê

Seîd Miksî

*"We men esbehe la yebtemul muslimîne fe leyse minhum"*  
*Kesê xwe li derdê Misilmanan neketin xweyî, ew jî*  
*Misilmanan ninin (Hedîsa Şerîf)*

Kar bi biratiyê gerandin  
Wek roviyan em xapandin  
Şev û rojan her xerandin.  
Ewan bi navê Xwedê.

Vî rengî hezar salan.  
Girtin û lêdan û talan.  
Em xapandin her alan.  
Ewan bi navê Xwedê.

Mah û sal em bezandin  
Welat ser welat gerandin.  
Em bi kuştinê qelandin.  
Ewan bi navê Xwedê.

Ummet, ummet digotin.  
Cegera me disotin.  
Paşê wan em firotin.  
Ewan bi navê Xwedê.

Kê navê "şehdê" anî.  
Me ew dost bira zanî.  
Em firotin bi erzanî.  
Ewan bi navê Xwedê.

Ala dîne Mûhemmet.  
Wekhevî bu edalet.  
Rakir zilm û cehalet.  
Ewan bi navê Xwedê.

Car rakirin hin car danîn.  
Hin car ken û hin car girîn.  
Wan em kirne her dilbirîn.  
Ewan bi navê Xwedê.











Nema îro ev holê.  
Ne bajaran ne çolê.  
Zerer dane vê olê.  
Ewan bi navê Xwedê.

Îro heta Emewiyan  
Kesê negot exewiyan.  
Em man ber ling û piyan .  
Ewan bi navê Xwedê.

Me navê ev cîrantî.  
Me navê ev biratî.  
Me divê rêka rastî.  
Ewan bi navê Xwedê.

Roja kete hesabê.  
Em bûn kurê jinbabê.  
Em dane ber ezabê,  
Ewan bi navê Xwedê.

# Diwana kitêbên Kurdî...



Weşanên Diwan

Zeyrek Mah. İtfaiye Cad. No: 17/3 Fatih İstanbul | Tel: 0212 534 48 30 | e-mail: diwankitab@gmail.com



### Pîrozbahî

"Bi tu awayî ne goştê qurbanan ne ji xwîna wan digihêje Xwedê. Lê belê teqwadariya we digihêje wî. Herwisa Xwedê ew ji we re amade kirine da ku hûn Xwedê teala mezin bidêrin û yên qencîkar mizgîndar bikin." (Hec, 37)

Xwedê eyd û erefatên we pîroz û bimbarek bike. Bi hêviya ku îbadetên we û heca we meqbûl be, em eyda we ya Qurbanê/Heciyan, pîroz dikin.

Peyam